

SAL 1  
HEJMAR 1  
ADAR 1995

# CIRA

KOVARA  
KULTURÎ

kovara komeleya nivîskarên kurd li swêdê



---

# NAVEROK

---

Hejmar 1 • Sal 1 • Adar 1995

---

## DESTNÎVISA NAMEYA ŞÊX SE'ÎD (1925)

M. Malmîsanij, 5

### MÎN ŞÊX SE'ÎD DÎT

M. Malmîsanij, 10

### ŞÊXO

Naci Kutlay, 23

### LE YADÎ 50 SALEY KOÇI DÎWAYÎ SEYFU'L-QUZAT

Kerîmî Husamî, 27

### HELBEST

Kemal Burkay, 31-32

### SEFERA YAŞAR KEMAL

Rohat Alakom, 33

### HECÎ MIHEMED QELŞO

Rojen Barnas, 39

### CIVATA AZADIYA KURD

Zinar Soran, 54

### ÎBOYÊ DÎNAMÊT

Nedim Dağdeviren, 65

### EZ BI XWE

Mayakovskî (Wergêr: M. Aydoğan)

### YA DA Û EZ

Ahmet Cantekin, 74

### HELBEST

J. Espar, 77-80

### GAP Û MÎRATA KULTURÎ

Osman Aytar, 81

### Ji SÎFÎRÊ

Paşa Uzun, 87

### "NO KÎ MA RA WO"

Mûnzûr Çem, 89

### DIMILKÎ DI NERÎ Û MAKÎ

Haydar Diljen, 95

### BÎRARO


Kawe Se'îd, 107

### JÎ KOMELÊ



---

# Weşanên APEC

PETRA SZABO



PETRA SZABO



## Ji bo zarokan pirtûkên nû !

Navnîşana xwestinê:

**Apec-Förlag**  
Box 3318  
S-163 03 Spånga/Sverige

Tel: 08-761 81 18  
Fax: 08-761 24 90

Hejmar I  
Sal I  
Adar 1995

**XWEDÎ Û BERPIRSIYARÊ GIŞTÎ**

Mehemed Malmîsanij

**REDAKSIYON**

Osman Aytar  
Nedim Dağdeviren  
Nacî Kutlay  
Mahmûd Lewendî  
Hesenê Metê  
Zinar Soran

**ŞERTÊN ABONETIYÊ**

Salek: 200 SEK  
Nîvsal: 100 SEK  
Hejmarek: 50 SEK  
Ji bo welatên din mesrefa postê lê zêde  
dibe.

**ÎLAN**

Rûpelek 1000 SEK  
Nîv rûpel 500 SEK  
Çarîk rûpel 200 SEK

**PERGALA BERGÊ  
Û RÛPELAN:**

Nedim Dağdeviren

**ADRESS • ADRES • NAVNÎŞAN**

c/o Tayfun, Hyppingeplan 21, 2 tr., 163 32 Spånga • SWEDEN  
**TELEFON 08-760 69 38 TELEFAX 08-711 08 36**

# Ji xwendevanan re

## Xwendevanên hêja,

Va ye kovareke nû, Çira digihîje destê we. Ew jî dide ser rîya karwanê kovarên Kurdî.

Çi baş çî nebaş, xusûsiyetên her kovarê hene. Yek ji xusûsiyetên Çirayê ev e ku ew kovareke kulturî ye û ji alî *Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê* tê derxistin. Komeleya Nivîskaran, di 22.1.1995'an de bi qerara bîst nivîskarên Kurd ên penaber hatibû damezirandin û îro ji çar perçeyên welêt sî û sê endamên wê hene. Hêvî ev e ku ev hejmar zêdetir be.

Komele û kovareke wisa, fersendekê dide ku em hevûdin baştir nas bikin û hem ji hev hem jî ji xwendevanan fêrî tiştina bibin.

Herwekî diyar e, Çira bi sê lehçeyên Kurdî; bi Kurmanciya Bakur, Kurmanciya Başûr û Kirdkî (Kirmanckî, Zazakî) ye; ev yek kovarê dewlemendtir dike. Ji xusûsiyetên Çirayê yek jî ev e.

Em kêfxweş in ku ji nifşên cihê-cihê endam, di komeleyekê de bi hev re kar dikin û kovarekê derdixin. Endamên Komelê bi temenê xwe, lehçeyên xwe, babeta nivîsên xwe û bi fikrên xwe cihê-cihê ne. Loma nivîsên Çirayê jî cihêreng in\*.

Rûpelên Çirayê ji xwendevanan re vekirî ne. Heta ji destê me bê em de cî bidin nivîsên cihêreng.

Xwendevanên delal,

Em li benda alikariya we ne. Heke bi dilê we be kovarê belav bikin û bibin aboneyên wê. Bi nivîsên xwe, bi rexne û pêşniyazên xwe me haydar bikin da ku em kêmaniyên xwe bizanibin, da ku Çira me û we ronîtir bibe.

22. 2. 1995

**ÇIRA**

\* Berpirsiyariya her nivîsê, ya nivîskarê/nivîskara wê ye.

# Wendoxan rê

## Wendoxê erjayey,

Ha wo kovarêka newa, Çira re-sena şima dest. Ya zî dana raya karwanê kovaranê Kurdkî ser.

Çi baş çi nebaş, xusûsiyetê her kovare estî. Xusûsiyetanê Çira ra yew no yo ki ya kovarêka kulturî ya û ebi destê *Komeleya Nuştoxanê Kurdan-Îsweç* divejiyêna. Komeleya Nuştoxan, 22. 1. 1995 di ebi qerarê vîst nuştoxanê Kurdan ê penaberan (multeciyan) awan bibî û ewro çar parçeyanê welatî ra hîris û hîrê endamê yay estî. Hêvî aw a ki na hûmari hîna zêde bo.

Komele û kovarêka winasî, fîrsetê dana ki ma yewbînan hîna baş nas bikî û hem yewbînan ra hem zî wendoxan ra tayê çiyar bimusî.

Hezeki aseno, Çira ebi hîrê lehçeyanê Kurdkî; ebi Kurmanckiya Bakur, Kurmanckiya Başûr û Kirdkî (Kirmanckî, Zazakî) ya; no rewş zî kovare hîna pêt (zengîn) keno. Xusûsiyetanê Çira ra yew zî no yo.

Ma kêfweş î ki neslanê ciya-ciyayan ra endamî, komeleyêk di piya kar kenî û kovarêk vejenî. Endamê Komele ebi serranê xwi, lehçeyanê xwi, babeta nuşteyanê xwi û ebi fikranê xwi ciya-ciya yî. Cuwera nuşteyê Çira zî tewir-tewir î\*.

Riperrê Çira wendoxan rê akerde yî. Heta destê ma ra bêro ma do ca bidî nuşteyanê ciya-ciyayan.

## Wendoxê delalî,

Ma pabeyê yardimê şima yî. Eke ebi zer ba şima ba kovare vila bikên û bibên aboneyê ya. Ebi nuşteyanê xwi, ebi krîtîk û pêşniyazanê xwi ma haydar bikên ki ma kemaneyanê xwi bizanî, ki Çira ma û şima hîna roşn biba.

22. 2. 1995

## ÇIRA

\* Berpirsiyariya her nuştî, ya nuştoxê/nuştoxa yê ya.

برادر من شیخ عبد الرحمن و عزیز من شیخ حسن  
 که در کربلا حضور یافته اند و بعد از کربلا در شهر کوفه  
 در منزل شخصی که در کربلا بوده برادران روزی با نادر  
 و با سایر کاتبان با او آمدند و از او پرسیدند  
 که چه خبر است تا ما را در این روزها خبر دادی  
 که در کربلا بودی و ما را خبر ندادی  
 و تو را که خبر از کربلا می دادند و ما را خبر ندادی  
 چقدر که نزد من حاضر گردید و ما را خبر ندادی

طریقه سفارت و تبار اموال و اغنا در کربلا و فغانه بنمرد  
 لکنه دفته ایچونه سن او لکنه مکتوبه با نام کربلا و در  
 یولورایه برابنده و محاسب آدم الله با دفتر سفارت  
 از زاده و بر سواری حکمن استاد است یا عینا و ائمه تبویه بار  
 سیر حادده بگره و بیخ حادده و اکتلی امرالدین و در فغانه انعام  
 محمد شادان و شوق انصاف و جیده انعام و تمام مجاهدیه ایسلیم سلم و در امام  
 و عملیه شریفیه محمد ده خردم اینجا کلینیه و صیبه و نصیحه ایسلیم  
 بشیر روز جهان کلان انعام هر سکنه کلمه عجیب طوفان و با جودت باش  
 نیاید ایده که الله طافه او در طاشی محمد اندک محمدی محمد سنایت کیدی  
 که در آن طرفه آصفیرم و قلین انعام و شجاعت در شیخ ایله نلو ایده  
 و از طرفه ایسه هدا بی قول اینده بقدری دکل عمه کریمه در کربلا  
 ایله و سپهر شریفه را میله ایله اگر محکمه یا ستوره و الا فغانه علی بار  
 ده ترک عسکررینه که ایله صوت و طاصد بن یا صفتیه و بریدر و آل فکر  
 ایسه تاخیری صوابه و عسکررین سیرک بولی محاسبه ایسه  
 خادم المجاوردی  
 محمد صید  
 روم همه سید سلطان  
 سنه ۱۰۱۹  
 سندی شیخ با عدل عظیم کردید بر زانیه آدم و  
 عینا طوفان به بالا سید سید الحار  
 کلان امواله سیرک طرفه جوده  
 محمد صید

Namya Şe'x Se'id



# DESTNÎVÎSA NAMEYA ŞÊX SE'ÎD (1925)

**N**ameya ku hûn dê li jêrê bixwînin, nameyêke Serekê Serîhildana Pîranê ya 1925'an Şêx Se'îd e. Ev name, di dema serîhildanê de bi destê Şêx Se'îd hatiye nivîsîn û ji Şêx 'Evdirehîm û Îsmâil Efendî re hatiye şandin. Herwekî ji fotokopîya wê jî dîyar e, 'eslê nameyê bi Tirkî ye. Nameya Şêx Se'îd, piştî 1925'an, yanî piştî 69 salan, cara pêşîn digihîje nifşê nû.

Ev name di dema serîhildanê de ketiye destê eskerê Tirk û kopya wê di rojnameya Vakîta wê deme de hatiye çapkirin<sup>1</sup>. Li gor vê rojnameyê, lekeyên ku li ser nameyê xuya dikin, lekeyên xwînê ne. Kaxiza nameyê, ji daîreyêke cendirmeyên Tirkan -ku ketiye destê Kurdan- hatiye girtin. Ji xwe cihê ku destnivîsa şêxê şehîd diqede ev peyvên "Tirkî" xûya dikin:

Jandarma ... Kumandanlığı

Aded (?)

Cevab

Tarih

Numrosu

Ev peyvên Tirkî, di 'eslê kaxizê de hene (metbû' in).

Navê çend kesên navdar di vê nameya Şêx Se'îd de derbaz dibe. Wek Şêx Eyub (Sêwreg), Şêx Sîrac (Pîran), Salih Beg (Hêne) û Mehmed Emîn Odabaşî (Sêwreg). Me derheqê van kesan de di beşê notan de hin agahdariyên kurt dan. Ji van kesan Salih Begê Hêneyî bi şî'rên xwe jî navdar e. Me çend nimûne ji şî'rên wî nivîsandin.

## Wergera Nameyê:

*Bi alîkariya Xwedê te'ala*

*Ji birayê min Şêx 'Evdirehîm û<sup>2</sup> 'ezîzê min Îsmâil Efendî re<sup>3</sup>*

*Min nameya we ya bi tarîxa 19 Şa'ban 1343'yan [Adar 1925], roja îne, se'et di çaran de girt. Nameya Şêx Mehemed Reşîd Efendî jî pê re bû. We derheqê hatina Bozan Axa<sup>4</sup> û Şêx Eyub Efendî<sup>5</sup> bo Qerebexçeyê<sup>6</sup> de nivîsandiye û [we nivîsandiye ku] ew li benda hevdu dîtina me ne. Ser seran û ser çavan ez dê bihatama zîyareta wan. Lê min nuh do Reşîd Axa tevî sed peyayî şand Cepha Rojhelatê, [gundê] Simaqî<sup>7</sup> û îro jî înzallah 'eşîra Têrkan<sup>8</sup> tê, ez wan jî bişînim cepheyê. Min Şêx Tahir û Şêx Sîrac<sup>9</sup> jî bo civandina eskeran şandin, hîn nehatine. Min Şêx Munîr şand Zoxbirîm<sup>10</sup> û Mehemedyan<sup>11</sup> û alî rojhelatê, hîn nehatine. Min Salih Beg<sup>12</sup> û Mehdî Efendî<sup>13</sup> şandin Licê, hîn nehatine. Îşev li Licê ne. Înzallah heke ew hatin, piştî bi rêkûpêkkirina vî alîyê ez bi alî we de tîm û Bozan Axa û Şêx Eyubî dibînim. Şîreta min li hemî eskerên me, bila bi sebr û sebat bin û bi şerî'eta pak 'emel bikin. Nebe ku eskerên me mal û pezê Misilman û efendiyan bi zorê ji wan bigrin, talan bikin. Lê ji bo zexîreyê min ji we re di nameya berê de jî nivîsand, heke pir pêwîstî hebe bila ji 'embarekê bi destê merivekî emîn û muhasib, bi defter [belge] erzaq derxin bidin. Paşê heke Xwedê te'ala nesîb bike, em dê 'eynî tiştî yan jî buhayê wî li wan vegeînin. Ez jî Mîrê Sadîk Begî<sup>14</sup> re, jî Mîrê Hamîd Begî<sup>15</sup> û jî mîrên Gêlê<sup>16</sup> re, jî birayê Zulfiqar Axa Mehemed Reşîd Efendî re, jî Şewqî Efendî û Mecîd Axa re, jî hemî mucahidên Îslâmiyê re silav û du'a dikim; wesîyet û şîretan li hemîyan dikim ku ji şerî'eta Mehemedî dernekevin. Li gor ku em dibihîzin axayên ku bi hev re hatine, jî Çermûgê hatine. Gelo rast e yan nerast e? Bi me bidin zanîn. Xwedê te'ala hîlekariya Mehmed Emînê<sup>17</sup> Mehmûd Efendî Odabaşî bike...<sup>18</sup> wî û dilê wî bi îman û mêrxasiya dînî tije bike. Û heke di îradeya ezeli ya wî de qebûlkirina riya rast ne qedera wî ye, [Xwedê te'ala] di cî de wî qehr û perîşan bike; Îslamê jî xirabiya wî emîn bike. Heke mimkûn e bi şêwr û tifaqê, bi şev, li 'Elîbardaqê<sup>19</sup> bê deng û beng bavêjin ser eskerên Tirkan. Heke nemimkûn e, texîrkirina wê hîn bi xêr e. Û bila eskerên me dora riya Sêwregê bigrin.*

*Roja îne, se'et 5*

*19 Şa'ban 343 [1925]*

*Xadîmu'l-mucahidîn<sup>20</sup>*

*Mehemed Sê'îdu'l-Neqşîbendî*

*Niha min ji 'Evdil'ezîz Begê Şahabanî<sup>21</sup> nameyek girt. Hêzek, ber bi Sêwregê, bi hawara Diyarbekirê de tê. Gelo rast e, derew e? Zû xeber bidin me. Mehemed Se'îd*

## Yê ku ji Tirkî wergerandiye: M. Malmîsanîj

<sup>1</sup> Vakit, 27 Nisan 1341, s. 1-2

<sup>2</sup> **Şêx 'Evdirehîm:** Birayê Şêx Se'îd e.

<sup>3</sup> **Îsmail Efendî:** Serekê hêzên Şêx Şe'îd bû ku ber bi Sêwregê çûbûn.

<sup>4</sup> **Bozan Axa:** Serekê 'eşîra Îzolî bû. Demekê li gundê Poro -gundekî Bozovayê- dima.

<sup>5</sup> **Şêx Eyub Efendî:** Şêx Mehemed Eyub, kurrê Şêx Xalid e. Bi gunehkarkirina alîkarbûna serîhildana Şêx Se'îd, di 1925'dan de dema ku 41 salî bû bi qerara Mehkema Îstiqlalê (Şark Îstiklâl Mahkemesi) li Diyarbekirê hat bidardekirin. Şêx Mehemed Eyub şêxê hêla Qerebexçeyê (nêzî Sêwregê) bû û li Sêwregê şûbeya Terakkîperver Cumhuriyet Fırkası vekiribû, demekê serekê vê şûbeyê bû.

Li gor ku rojnama Vakit dinivîse, Serekê Belediyeya Sêwregê Mehmed Emîn Odabaşî, Şêx Mehemed Eyub îxbar kiriye û derheqê wî de agahdarî daye dewletê (Vakit, 24 Nisan 1925).

<sup>6</sup> **Qerebexçe:** Gundekî Sêwregê ye.

<sup>7</sup> **Simaqî:** Gundekî Diyarbekirê ye (dewletê navê wî kiriye Erimli).

<sup>8</sup> **'Eşîra Têrkan:** 'Eşîreke Kurdan e ku li Bakurê Diyarbekirê dijî.

<sup>9</sup> **Şêx Sîrac:** Ji Şêxmalanê (gundekî Pîranê) ye. Paşnavê malbata wî Ensarioğlu ye. Meb'ûsê DYP Mehmet Salim Ensarioğlu, biraziyê Şêx Sîrac e.

<sup>10</sup> **Zoxbirîm:** Gundekî Hezroyê ye (dewletê navê wî kiriye Kırmataş).

<sup>11</sup> **Mehemedyan:** Gundekî Diyarbekirê ye (dewletê navê wî kiriye Arkbaşı).

<sup>12</sup> **Salih Beg:** Mebest jê Salih Begê Hêneyî ye. Jibo agahdarî binêre nivîsa kurt a ku me li jêrê derheqê wî de nivîsiye.

<sup>13</sup> **Mehdî Efendî:** Birayê Şêx Se'îd e.

<sup>14</sup> **Mîrê Sadiq Beg** (Mîreyê Sadiq Beg): Mîre, kurrê Sadiq Beg e û ji Gêlê ye.

<sup>15</sup> **Mîrê Hamid Beg** (Mîreyê Hamid Beg): Mîre, kurrê Hamid Beg e û ji Gêlê ye.

<sup>16</sup> **Gêl:** Qezayeke Diyarbekirê ye. Eşil.

<sup>17</sup> **Mehmed Emîn** [Odabaşî]: Serekê Belediyeya Sêwregê, Qumandarê Hêzên Millî (Kuva-yı Milliye Kumandanı) û di dema serîhildana Şêx Se'îd de alîkarê Tirkî bûye. Li gor ku rojnama Vakit dinivîse, wî Şêx Mehemed Eyub îxbar kiriye û derheqê wî de agahdarî daye dewletê (Vakit, 24 Nisan 1925).

<sup>18</sup> Li vir kelîmeyek nehat xwendin.

<sup>19</sup> **'Elîbardaq:** Gundekî Diyarbekirê ye.

<sup>20</sup> **xadîmu'l-mucahidîn:** xizmetkarê mucahidan

<sup>21</sup> **Şahaban:** Gundekî Diyarbekirê ye (dewletê navê wî kiriye Sivritepe).

# SALIH BEGÊ HÊNEYÎ

Salih Beg, Kurdekî ji Kurdên Kird (Zaza) û ji qeza Hênê (qezayeke Diyarbekirê) ye. Loma bi navê Salih Begê Hênî yan Salih Begê Hêneyî tê naskirin. Wî demekê muftîtiya Ma'denê kiriye.

Salih Beg, di dema serîhildana Şêx Se'îd de Serekê Yekemîn ê Mucahidan (Mücahidin Reis-i Evveli), yanî serekê yekemîn ê hêzên eskerî yên Kurdan bû. Ew bi mêrxasiya xwe jî navdar e. Li gor ku hin rojnameyên Tirkan ên wê demê dinivîsin, di dema dardebûyinê de Salih Begê Hêneyî şîret li hevalên xwe kiriye da ku merd bin, netirsin.

Wî digel Kurmancî û Kirdkî çend zimanên biyanî jî zanibûye. Li gor îfadeya xwe ya ku di mehkemeyê de daye, wî 'Erebî, Tirkî, Farisî, piçek jî Frensî zanibûye û li cem mamosteyekî Ermenî, Îngilizî jî xwendiyê lê nikaribûye bipeyive.

Salih Begê Hêneyî şî'r jî nivîsiye. Şî'reke Salih Begê Hêneyî weha ye:

"Eger çêkî jî bo ceşê kerê ra  
Ji zêr afir, li nêv eywanê kesra<sup>1</sup>

Mu'ellîm be ji bona wî Felatûn<sup>2</sup>  
Bibe saqî ji bo wî Îbnû Sîna

Tu wî av dî ji yenbû'a heyatê<sup>3</sup>  
Di şûna êm bidî wî lewz<sup>4</sup> û xurma

Meke bawer ku dê sahibhuner<sup>5</sup> be  
Ewê dîsa wekî bavê xwe ker be

Dema tu wî ji eywanê derînê  
Huner nayê ji wî xeynê zirrînê"<sup>6</sup>

Di beyteke xwe de jî weha dibêje:

"Bi çavê 'îbretê mêze ke hîvê  
Ku daîm piştê bedrê ew hîlal e."<sup>7</sup>

Tê gotin ku di dema dardabûyînê de Salih Begê Hêneyî, bi Tirkî ev beyta jêrîn gotiye:

”Gerçi enzar-ı ehıbbadan dahi dûr olmuşuz  
Rahmet-i Rahman’a yaklaşmakla mesrur olmuşuz”<sup>8</sup>

Lê di çavkaniyeke din de ev beyt bi awayekî din e:

”Rahmet-i mevlaya yaklaşmakla mesrur olmuşuz  
Hak yolunda müflis-i hane harap olduksa da  
Bu harabiyetle biz manada mamur olmuşuz.  
Kul bize zulm[l]e mücâzât etse perva etmeyiz  
Çünkü teyid-i ilahiyeye mazhar olmuşuz.”<sup>9</sup>

---

<sup>1</sup> **kesra:** padîşayê Îranê

<sup>2</sup> **Felatûn:** Platon, Eflatun

<sup>3</sup> **yenbû’a heyatê:** serkaniya ava jînê

<sup>4</sup> **lewz:** behîv

<sup>5</sup> **sahibhuner:** xwedîhuner

<sup>6</sup> Min ev şî’r ji Mahmûd Lewendî girtiye.

<sup>7</sup> Ev beyta Salih Begê Hêneyî, min di semînerekê de ji M. Emîn Bozarslan bihîstibû.

<sup>8</sup> Binêre nota 7.

<sup>9</sup> Uğur Mumcu, Kürt-İslâm Ayaklanması 1919-1925, Tekin Yayınevi, İstanbul, 1991, r. 231

# MÎN ŞÊX SE'ÎD DÎT

**T**ê zanîn, bi hezaran gundiyên Kurd beşdarî serîhildana Kurdan a 1925'an bûne. Ji ber ku serîhildanê li Pîranê dest pê kiribû, berî herkesî gundiyên dorûbera Pîranê tevî wê serîhildanê bûbûn. Bavê min yek ji wan gundiyan bû. Wek pîraniya Pîraniyan wî jî tevî ap û xalê min ji roja pêşîn hember leşkerên Tirk, di nav refên Kurdan de ciye xwe girtibû. Wek hevalên xwe yên wê demê, wî jî gelek caran ji me re behsa "Herba Şêx" dikir.

Çi heyf ku ji "bîrhatinên" nifşê Şêx Se'îd zêde tişt nehatiye nivîsîn. Heke hatibin nivîsîn jî min nedîtine. Bêguman heke bîrhatinên beşdarên serîhildanên Kurdan ên berê û ên nû bîn binivîsin, tevgera welatperweriya Kurdî baştir tê naskirin. Bi vê baweriyê, min beşek ji "bîrhatinên" wê demê yên bavê xwe wek axaftina wî, bi lehçeya Kirdkî (Zazakî) nivîsandibû û di 1992'yan de di rojnameya Armancê de weşandibû. Gotinên wî yên jêrîn, ji wê nivîsê hatin wergerandin.

M. Malmîsanij

**M. Malmîsanij**  
(1952 - Pîran)  
Kitêba wî ya dawîn:  
**Cızira Botanî**  
**Bedirhaniler ve**  
**Bedirhani Ailesi**  
**Derneği'nin**  
**Tutanakları**

### **Min çawa Şêx Se'îd dît?**

Şêx Se'îd Efendî bi xwe li Xunusê bû. Pir dewlemend bû, çar-pênc keriyên pezê wî hebûn. Wî, berê li her bajarî merivin dîtibûn, gotibû "Herkes li ciyê xwe dest deynin ser 'hukûmeta xwe'. Em vê qanûnê qebûl nakin." Şêx dev ji hemû mal û milkên xwe berda, rabû berê xwe da memleketê me, hat. Em pê hesiyan gotin "Va ye Şêx Se'îd li wê hêla Pirdê Dimlê<sup>1</sup> ye, tê!" Sê sed-çar sed kes ji xelkê hêla me, ji vir heta Dimlê ketin rê, çûn pêşiya wî.

Em çûn wê hêla Vêrdanê<sup>2</sup>, wê hêla Pirdê Dimlê pêşiya Şêx. Şêx û hevalên xwe hatin Dêreyê<sup>3</sup>. Wê şevê Dêrey tije bû. Şêx Se'îd li Dêreyê çû mala Xal Huseynê Avlay.

Ji Licê<sup>4</sup> bigre heta Hênê<sup>5</sup> cihê ku ew jê derbas bûye, xelk ghiştiye wî, bi hev re hatin. Ji hêla Kirdan zaf xelk pê re bûn (mebest ji "Kirdan" Zaza ne-Malmîsanij). Mîr û beg siwar, ên din peya bûn<sup>6</sup>.

Ez hingê zewicî bûm. Min nuh mala xwe ji Qojigê<sup>7</sup> anîbû. Tevî ku mala min wek kokikekê bû, hejdeh kes mêvanên min bûn.

Wê şevê Şêx got "Ez diçim tewafa Pîr Mesûrî"<sup>8</sup>. Em nêzî deh kesan bi wî re bûn. Ez bi xwe jî pê re bûm. Wî bi Kirdkî [Zazakî] qise dikir. Li wir got "Hûn li vir bisekinin, ez diçim hundir". Çû hundirê ziyareta Pîr Mesûrî, hinek ma, vegeriya hat, got "Karê me naçe serî".

### **Şerê Şêx Se'îdî Dest Pê Dike**

Roja din em pê re çûn Pîranê<sup>9</sup>. Wê demê Pîran nahîye bû, lê wekî gundekî bû. Tê bîra min, hîn nû hukûmetê qereqoleke piçûçik li Mehla Cellanê<sup>10</sup> danîbû. Îsmâil Efendî mudirê Pîranê bû, Hesen Huznî jî qumandarê qereqolê bû. Îsmâil Efendî ji Ma'denê<sup>11</sup> bû.

Gava ku Şêx Se'îd hat, çend mehkûm jî tevî me bûn, ew jî hatin Pîranê. Mesela Welî Hediki, Hesenê Bêzi, Şewêşê Mehmedî, Hesikê 'Elikî, zarên Îsikî, yanî Mehemê Îsikî û Îsmelê Îsikî. Ji van Welî Hediki û Hesenê Bêzi Qelbînî [ji gundê Qelbînê]<sup>12</sup> bûn, Mehemê Îsikî, Îsmelê Îsikî û Hesikê 'Elikî Dêreyî [ji gundê Dêreyê] bûn. Hinekan xeber gihandibûn qereqolê. Hinek dibêjin "Ji Qelbînê Îbremê Haj 'Elî wê demê cendirmeyê bejik<sup>13</sup> bûye, ew çûye xeber daye qereqolê, gotiye 'mehkûm bi Şêx Se'îd re ne', loma cendirman avêtiye ser wê malê û ji wir meselê patlax daye." Lêbelê ez bi xwe nizanîm kê xeber gihandiye qereqolê.

Gava ku xeber giha qereqolê, zeftîyek hat ba Şêx Se'îd, got "Em emir-qulî ne, bila ev mehkûm li vir nemînin".

Şêx got: – Bila nemînin, çima dimînin?

Mehkûm pê hesiyan, avêtin ser qereqola Pîranê; tifing berdanê, Hesên Huznî û Îsmail Efendî girtin. Hawê ku dibêjin, ji birayên Şêx Se'îdî, Şêx 'Evdirehîm bi wan mehkûman şewiriye û pişt daye mehkûman, bi hev re avêtine ser qereqolê.

Em li Pîranê bûn. Şêx Se'îd û axeler-maxeler, -ku yek jê re digotin Nebî Axa<sup>14</sup>, ew jî pê re bû- qasî bîst kesî çûbûn hundirê camiyê, em jî li derve sekinîbûn. Dîtina ku min dît, li ber deriyê qereqolê teq, teq, teq dengê tifingên wan hat. Şêx Se'îdî got "Weha nabe, weha mekin!" Lê êdî tiştê ku bûbû, bûbû.

Heta muxrubê em sekinîn. Xal 'Elî Temirê Dêreyî ji min re got:

– Hadê em biçin malê.

Min got: – Çima?

Got: – Mesele xira bû.

Em vegeriyan hatin, dengê tifingan dom dikir.

Wê şevê Şêx Se'îd û merivên ku pê re bûn, ji Pîranê derketin, vegeriyan çûn.

### **Me Avêt Ser Ma'denê**

Xelkê van ciyên me tev muttefiq bûn. Qeza me Ma'den bû. Me pêşî avêt ser Ma'denê, me Ma'den girt. Piştî ku me Ma'den girt, em du sê rojan li wir man. Me nêzî deh niqir (beroşên mezin) danîn, tê de dan keland; me eskerên Şêx hedik xistin çentên xwe. Me ew dixwarin.

Serekên me, giregirên me bûn. Mîrên Gêlê<sup>15</sup> bûn, axayên Pîranê bûn. Li her cî, mezinên wê derê serek bûn.

Berî çuyina me, hukûmeta Tirkî nêzî pênc sed kes ji xelkê hêla Adîyemanê anîbûn Ma'denê, da ku nehêlin em Ma'denê bigrin. Piştî çûna me, ew li pişt deriyan man. Xwediyên gelek malên ku em lê diman, digotin "Yên ku ji bo kuştina we, berî we hatibûn, anika li pişt deriyan in". Ew xistibûn pişt deriyan, nediwêriyan wan berdîn. Ew hemî teslîm bûn.

### **Li Erqeniyê**

Piştî Ma'denê me avêt ser Erqeniyê, me Erqenî jî girt. Li Erqeniyê, mezinên me gotin "Xelk qirêj û birçî ye. Belav bibin, herin malên xwe. Sê rojan bimînin, çekên xwe hazir bikin, paşê werin em davêjin ser Diyarbekirê".

Xeber dan Reşî Axayê Têrkan<sup>16</sup>, Reşî Axayê Gewran, xelkê Mistan<sup>17</sup> û xelkê Jorê<sup>18</sup>, gotin "Piştî sê rojan werin, em êriş dibin ser Diyarbekirê".

Gava ku me Pîran, Ma'den û Erqenî girtin, li wan deran axeler-maxalerên



me hukûmet xistin destê xwe. Mesela li hêla Pîranê Zilfî Axayê Pîranê, Huseynê Hejikê; di nav Kirdasiyan de Zifqar [Zulfiqar] Axayê Tulxumê, Reşî Axayê Têrkan û axayên wek wan, her yek bû sermiyanê mintiqaxwe (mebest ji "Kirdasiyan" Kurmanc in-Malmîsanij).

### **Li Diyarbekirê**

Roja ku gotibûn "werin", wê rojê em donzdeh-sêzdeh kesên Dêreyî çûn Simaqqiyê<sup>19</sup>. Em bi peyatî çûbûn. Xelqê Simaqqiyê ji gund derketibûn, em li odeyên wan man.

Wê şevê em çûn me çarmedorê Diyarbekirê girt. Zifqar Axayê Gewran ji wê hêlê hat, hin ji jêr hatin, em xelkê Pîranê ji jor çûn û hin jî ji hêla din hatin; me dorûbera wê girt.

Zora hukûmetê çûye, top kişandine ser bedenê, di dorûbera xwe de davêjin, bera me didin. Em jî qaşo bi rîfingan bera wan didin. De top bi rîfing disekine? Ji topan re çare tunebû. Tiştekek davêtin jor, ronî dikir, em yek bi yek dihatin xuyakirin.

Li wir, ji hêla me çend kes hatin kuştin. Mesela ji Metînan<sup>20</sup> Hesenê Metînan, ji Zeydanê<sup>21</sup> du kes û yek jî ji Dêreyê hatin kuştin.

Şeveke tarî ye. Çav çavan nabîne. Nêzî Diyarbekirê Aqinî [dibe ku min ev nav şaş nivîsandibe-Malmîsanij] heye, ez û 'Eliyê birê min û çend kesên din ji xelkê hêla me, em li wir bûn, guleyek topê li nêzî me ket. Meha Adarê ye<sup>22</sup>, baran dibare, dinya herî ye. 'Elî got:

– Aha, li min ket!

Ku 'Elî weha got, min pirs kir:

– Li kudera te ket?

Got: – Li serê min ket.

Min destê xwe li ser serê wî gerrand û seha serê wî kir; min fêhm kir ku bi xwîn e lê wekî din tiştekek tune. Min got:

– 'Elî, destê min pîrr bi xwîn e feqet qul-mul tune, tiştekekî muhîm tune.

Got: – Lê çima ewqas diêşe?

Min got: – Wele xwîn zaf e, ez dibêjim şîlekî kevir e.

Bi rastî jî şîlê kevirêkî bû.

### **Piştî demekê, hevalan got "Paş de vegerin!"**

Qesfeyek ji xelkê Bot[iy]an<sup>23</sup> di Deriyê Mêrdînê<sup>24</sup> re ketibûn hundir. Wan û eskeran gelek ji hevdu kuştibûn. Me neşiya em têkevin hundirê bajêr. Dawiyê em reviyên.

## Hêla Sêwregê

Carekê me û terefdarên hukûmetê me hevdû ber bi Sêwregê ve bir, heta Qerebexçeyê<sup>25</sup>.

Hinek 'eşîret hebûn, pişta hukûmeta Tirkan digirtin. Mesela li hêla Qerejdaxê wan deran Ehmed Axayê 'Ewêna hebû, wî piştgiriya hukûmetê dikir. Me bi merivên wî re şer kir. 'Eşîra Ehmed Axayê 'Ewêna pirr bû.

Vê dawiyê li hin derên din jî hin şêx û axa derketin, şaşî kirin gihîştin hukûmetê, bi hukûmetê re xweş kirin. Kî bibûya terefdarê hukûmetê, hukûmetê jî alikariya wî dikir.

## Em ji Diyarbekirê Direvin

Gava li ber Diyarbekirê zora me çû, me da dû hev û me bazda. Herrî û teqin e, çarox di piyên me de bûn. Ha babam, de babam, şefeqê lêxist em hatin gundekî Kirdasiyan [Kurmancan], jinên gund her yekê şivek girt û ber bi me ve hatin, gotin:

– Gû di gorra bavê we kiriyo! We mala me jî xira kir! Hûn direvin, lê emê çi bikin?

Gava ku em dihatin, ji Şêxmalan<sup>26</sup> Şêx Sîrac<sup>27</sup> jî bi me re bû. Em hatin Herbujinê, got:

– Zarno! Esker! Piyên xwe sivik bikin! Hukûmet li ber avê, li Tepê pêşiya me digre, me hemiyan hêsîr digre! (Li vir mebest ji "av"ê çem e.– Malmîsaniy)

Şêx Sîrac siwar bû. Hespa xwe bezand. Şêx-mêx siwar bûn, em peya bûn. Em hatin ku li Tepê tişteke tune.

Em sê sed-çar sed kes ji hêla me [ji hêla Pîranê] bûn. Em derbas bûn, hatin girê Hîra Qeri, me dît ku va ye siwarek ji jor de tê, nêzî deh peyan jî pê re ne. Me meraq kir, me got "ew çi kes e?"

Hat ku Reşît Axayê Têrkan e. Reşît Axayê Têrkan berê digot "Ev mesele [serîhildan] nabe, mekin! Em neşên zora hukûmeta Tirkan bibin". Dema ku me avêt ser Diyarbekirê ew jî êdî hat. Newêre li cihê xwe bisekine. Di dilê xwe de dibêje "ev çûn, ku zora Tirkan bibin û vegezin min dikujin". Reşît Axa ji jor hat ku va ye em paş de direvin, bi Kirdasî [Kurmancî] got:

– Hun ku da derin, hun ku da direvin? ... hespê xwe di dê û jina we ...! Wexta ku min digo "Nabe, nabe!", we digo "Reşît Axa teres e". de vegezin em herin, de vegezin! Hun ku da direvin?<sup>28</sup>

Welhasil em hatin malê. Dûre êdî em bi çiyayê ketin. Me lêxist em çûn Koyê 'Erseki [Çiyayê 'Ersekê]<sup>29</sup>. Me di vê navê de gelek eziyet dît.

## Piştî Şêx Se'îd Çi Bû?

Me û eskerên Tirkan me hevdu gelek bir û anî. Ez dibêjim qey ji Pîranê û ji gundên wê, nêzî du sed kesî hatin kuştin. Ji eskerên Tirkan jî nêzî du sed heb hatin kuştin.

Rojekê li ber Roy Vêrdanî [Çemê Vêrdanê] me û eskeran me gelek bera hevûdin dan. Ji wan zaf hatin kuştin û bi avê de çûn. Ew ji Hênê dihatin ku derbasî vê hêlê bibin, me jî dixwest ku em nehêlin bên vê hêlê.

Herçî me teksîr nekir, lê dawiyê zaf esker hatin, hukûmetê zor da me. Ev derana hemî tijî esker bûn. Çi kes li Pîranê nemabû, xelk hemî reviyabûn.

Eskeran çadir vegirtin. Meha Adarê bû. Ba û baran bû, serma bû, meriv li derve diqerîst. Em xelkê van gundan tev bi çiyayê ketin. Tu kes li malê nema. Me mal û halê xwe di cî de hişt.

Gava em direviyan car-car xelkê digot "Va ye esker tê!", jinan mastê xwe, tiştên xwe yê giran dirijandin. Qelbîniyan tiştê xwe davêtin sarincan.

Ez çûm Koy 'Erseki [Çiyayê 'Ersekê]. Me hin heywanên xwe bi xwe re birin.

Wexta ku em li Koy 'Erseki bûn, Xal Mihikê Yemoy jî li gel me bû. Xal Mihik pîr bû. Tê bîra min carekê ban kir, got:

– Zarno! Diyarbekir teslîm bûye. Kemal Paşa<sup>30</sup> tenê maye, sê-çar heb zefî mane, werin em herin!

Em dihatin, me dît ku hukûmetê ev der girtine, çadir vegirtine. Hin çadir li Tewrînê<sup>31</sup>, hin jî li Keyanê Koçan<sup>32</sup> vegirtibûn. Ev dorûber tijî esker bûbûn. Em wan sê-çar mehan li derve bûn, em li van deran perîşan bûn. Hukûmet êdî dizirriya, nedisekinî, çunkî zora me biribû. Êdî dilê wî bi kesî nedîşewitî. Em di wê ba û baranê, di wê sir û sermayê de timî li çiyayê bûn. Gelek caran em birçî bûn.

Eskeran ne beroş dihiştin, ne dîzik û ne jî nivîn. Çi tişteke li malên me nehiştibûn. Heft heb dîzikên me hebûn, me dims dixistinê, eskeran şikandibûn. Çi tiştê ku di nav malê de bû, eskeran rahiştibû biribû. Dewar û bizinên me girtibûn biribûn. Em jî li çolê belingaz mabûn. Însan wenî perîşan bûn. Bere bere hukûmet sist bû. Paşê zemanek hat, gotin " 'Efu derketiye, werin malên xwe". Em hatin ku çî bên! Me nihêrt ku tişteke li malê tune.

Eskerên Tirkan paşê jî xelk kuştin. Mesela ji Qelbînê Huseyn hebû, me jê re digot Huseyno Çurro, eskeran ew kuştin. 'Elî Hediki kuştin. Ji Dêreyê Bekirê Îmişi (Bekirê Huseynê Îboy) di Şerê Pirdî de hatibû kuştin.

Çend heb mehkûm hebûn, ew jî hatin kuştin. Mesela Ehmedê Huseyn Axay<sup>33</sup> li pişt Kufarbê<sup>34</sup>, di şikeftê de dîtibûn; eskeran bi şev avêtin ser, girtin, serê wî jê kirin, xistin cuherekî<sup>35</sup>, jî qumandar re anîn.

### **Delu Fikrî**

Piştî ku Şêx Se'îd û hevalên wî bi dar de kirin, piştî ku şer qediya û demek di nav re çû, hukûmetê merivên xwe şandin, got "Lê bigerrin ka kê ev kar kirine".

Ji qumandaran Receb Begî çadira xwe li Pîranê vegirt. Delu Fikrî [Fikriyê Dîn]<sup>36</sup> jî hat çadira xwe ya sipî li rasta Dêreyê vegirt.

Esker rojekê çûbûn Qelbînê, hemî mêrên Qelbînê xistibûn mizgefta Qelbînê; ji nav wan bi qasî bîst mêrên çak û bikêrhatî bijartibûn. Bi kefiyên kolozên wan, milên wan bi hev ve girêdabûn. Îcar hingê kolozên me jî zaf mezin bûn. Yê min bi xwe jî zaf mezin bû.

Em li Dêreyê bûn, me dît ew Qelbînî anîn Dêreyê, ba qumandar. Ji gundên din jî, ji Dilbê<sup>37</sup>, ji Herêdanê<sup>38</sup> hin kes girtibûn.

Bi şefeqê re alayiya eskerî jî Dêreyê bar kir çû, ew camêrên ku girtibûn jî bi xwe re birin. Roja din em pê hesiyan ku birine wê hêla Pîranê, li nêzî Xizikê<sup>39</sup> kuştine. Ji wan, bi tenê çend kes xelas bûne.

Çend Qelbîniyên ku bi vê qeflê re bûn, ev bûn: Ehmedê 'Evdî, Mehemê Misfay Remzanî, Ehmedî Zeyni, Mehmedê Mehmedî, Misfay Mihoy. Husê Werda Eftî, Husê Meyri û 'Emerê Mihikî jî li gel vê qefleyê bûn. 'Emerê Mihikî di bin termên wan de mabû, bi birîndarî filitibû.

Mehemê Misfay Remzanî yê ku ji wir filitibû, paşê digot "Eskeran milên me bi hev ve girêdan, bi şev ketin nav me, qesetûra li me xistin. Ê min 'ebayek li min bû, gava ku qesetûra li 'ebayê ket, 'eba qul kir lê negihîşt laşê min, min xwe avêt 'erdê".

Mehemê Misfay Remzanî bi wî awayî xwe li mirinê danîbû û xelas bûbû.

Ji Qelbîniyan wê şevê Ehmedê 'Evdî, Mehemê Misfay Remzanî, Ehmedî Zeyni, Mehmedê Mehmedî, Misfay Mihoy xelas bûn. Qesetûra li guhê Misfay Mihoy ketibû, guhê wî birrîbû lêbelê nemiribû. Yên ku xurt bûn, bihêz bûn, kefiyên xwe qetandibûn, bazdabûn. Yên din li wir kuştibûn.

Roja din em pê hesiyan, jin çûn wir, dîtin ku eskeran kevir û ax û herî avêtine ser meytên wan. Li wir jinan meytên wan camêran dîtibûn, bi zorê naskiribûn.

Ji yê kuştî mesela ev du kes Qelbînî bûn: Mehmedê Bawkal Şêx 'Elî (berê mala Bawkal Şêx 'Elî li Qelbînê bû, paşê anî Dêreyê) û Mehemê Mehmedê Eli.

Xuşka Mehemê Misfay Remzanî, Elikî jî ji bo birê xwe bi qefleya jinên Qelbînî re çûbû ser van kuştian. Çûbû ku seh bike ka birê wê li wir e yan na. Elikê digot "Çenteyê Mehemê Mehmedê Eli [ku hatibû kuştin] hîn jî di navbera şalwar û derpiyê wî de girêdayî bû û du perçeyên nanê hişk tê de bûn".

Ji bilî van, Mehmedê Wisoy ê Basrafi jî hat kuştin.

Delu Fikrî mîralay, yanî qumandarê alayiyê bû. Hawê ku ez pê hesi-yame, hukûmetê ew û alayiyeye eskerî ji Bozantya<sup>40</sup> şandibûn vir. Zaf zulim dikir, meriv dikuştin. Bînbaşîyek jî pê re bû, wek 'Erebekî reş bû.

Hukûmetê Delu Fikrî şandibû, gotibû "Biçe bibîne ka ev çi mesele ye" û emir dabûyê, gotibû "Bikuje!"

'Elî Xal Huseynî di mesela Şêx Se'îd de reviyabû hatibû malê. Dema ku dinya aram bûbû, dîsa çûbû ciyê xwe (alayiya xwe). Min nedizanî ku çuye. Danê sibeyekê ez ji malê derketim çûm mala 'Elî Xal Huseynî, min ji jina wî pirsî:

– 'Eysê, 'Elî Efendî li malê ye?

Got: – Na.

Min got: – Li ku ye?

Got: – Gavek berê li hespa xwe siwar bû, çû. Ji zû de li vir bû, îzinlî bû. Îro dîsa çû alayiya xwe.

Ez paş de vegeyiyam. Ez hatim ber deriyê Wisê Zerîfi, ku va ye mufrezeyek bi qasî deh eskerî di kuçeyê de tê.

Nebêje ku hatine li Bazbindê<sup>41</sup> çend kes kuştine, li wê hêla Bazbindê li Akragê<sup>42</sup> jî neh kes kuştine.

Ji min re gotin: – Were vir!

Ez çûm, gotin: – Gazî muxtar bike!

Muxtar hat, eskerekî got: – Ji me re savar, nan û ard lazim in, divê hûn kom bikin!

Ji malan bi zorê, sê bar tişt kom kirin.

Em hatin bin Tuyera Sefî<sup>43</sup>, eskerekî bi Tirkî ji min re got:

– Tawux yoxtir, tawux? (Mirîşk tune, mirîşk?)

Min baş Tirkî nedizanî. Min got: – Yoxtir. (Tune.)

Ji wan eskerekî got: – War, war. (Hene, hene.)

Nebêje ku gava ku hatine, li rexê gund, li mala 'Elî Xal Mihikî mirîşk

qixiyaye.

Min got: – Nêrde war? (Li ku heye?)

Got: – Îşte şu ewde war. (Va ye li wê malê heye.)

[Paşê] Got: Haydê.

Em çûn ber deriyê 'Elî Mihikî. Xejika 'Elî Xal Hemoyî, jina 'Elî Mihikî li wir bû.

Min got: – Xejê!

Got: – Ha.

Min got: – Ev mirîşkan dixwazin, tu bêje "tune".

Tu nebêjî ku ji 'eskeran yek Kirdkî dizane, got:

– Sen benim anamî awradimî ...! Senin bir se'etin qalmîş, seni oldiracaxam.

Ben qesabem, qesab! Îtoxlî ît! Xayîn, sen nîye qariya dîyor "Soyle tawux yoxtir"? (Tu di dê û jina m...! Se'etek te maye. Ez dê te bikujim. Ez qesab im, qesab! Seg kurê seg! Xayîn, tu çima ji jinikê re dibêjî "Bêje mirîşk tune"?)

Em çûn ba qumandar. Qumandar got gundiyan hemiyan bicivînin!

Eskeran mêrên gund hemî civandin. Li gund tu kes nehiştin. Heftê û şeş kes civandin, em bi hev ve girêdan. Pêşî milên me girêdan, paşê vekirin, gotin "rûnin". Çûn gurzek çoyên ter anîn, gotin "Em dê bi tifingan bera we nedin, em dê li we xin, van çoyan em dê bi lêdanê li ser laşê we bişkênin, bi lêdanê em dê we bikujin. Tifingên xwe, çekên xwe bînin teslîm bikin".

Mihê Huseynê Avlay muxtar bû, got:

– Çek tunene, me çekên xwe dane.

Got: – We dane kê?

Mihê got: – Me dane Receb Beg.

Bi rastî jî Dêreyiyan çil heb tifing dabûn Receb Begî. Receb Beg jî qumandarê alayiyê bû, li Pîranê bû. Alayiyek li Dêreyê bû, alayiyek jî li Pîranê.

Got: – Heke we dane, elbet li ser kaxizê nivîsandî ye. Bila yek ji we here Pîranê, ji Receb Begî wesîqe bigre bîne!

Herkes newêre here. Ev der ji eskeran dagirtî ye. Xal Mihikê Yemoy hebû, êdî ketibû, pîr bûbû, lêbelê zaf cesûr bû, got:

– Ez diçim.

Xal Mihik û du esker çûn Pîranê, ba Receb Beg. Piştî çend se'etan vegeriyan. Ji Receb Beg kaxiz girtibûn, anîbûn.

Ku kaxiz anîn, em berdan.

Hîn Xal Mihik ji Pîranê venegeriyabû, eskeran navê mehkûman xwendin,

gotin "Vana bînin".

Gotin: – Îsmail oxlî Mehem [Mehemê Îsikî]!

Me got: – Hukûmetê ew bir Xarpêtê, li wir bi dar de kir.

Gotin: – Elî Efendî [‘Elî Huseynê Avlay]?

Me got: – Çuye eskeriya xwe dike.

Gotin: – Îsmelê Îsikî?

Her wê gavê, Îsmelê Îsikî [ku xwe veşartibû], ji mala Ema Deqoy derketibû, diçû mala Mistê Zilfî. Çawa ku çû, Xal Husê Hemoy got:

– Binêre Îsmelê Îsikî va ye li wir e!

Xal Husê Hemoy ku wenî got, esker çûn Îsmel girtin. Dûre navên Hesikê ‘Elikî û çend kesên din xwendin.

Li wê derê li Îsmelê Îsikî xistin, xistin; roja din birin, li ser rê, li Akragê bera wî dan, kuştin.

Îsmelê Îsikî, Mehemê Îsikî, Welî Hediki, Şewêşê Mehmedî û Hesikê ‘Elikî berî şerê Şêx Se’îd jî mehkûm bûn. Tişt-miştên xelkê dixwarin.

### **Hesenê Bêzi û Eybê Huseynê Fetikî**

Hesenê Bêzi û Eybê Huseynê Fetikî rojekê çûn Koy Qelbînê [Çiyayê Qelbînê], goma ‘Elikê Neçarî, jê pere xwestin. ‘Elik dewlemend bû lê pere neda wan, wan jî tifing bera wî dan, ‘Elik kuştin. Ji wir lêxistin çûn Wiriyê<sup>44</sup>.

Hesenê Bêzi û Eybê Huseynê Fetikî mehkûm bûn, mêrkuj bûn, meriv kuştibûn. (Hesenê Bêzi ji Qelbînê bû, Eybê Huseynê Fetikî jî ji Şêxmalanê bû.)

Mistê Zilfî yê Dêreyî jî hingê li Wirî, li mala xuşka xwe, yanî li mala Mehmedê Avlay mêvan bû. Mist, camêrekî zaf li ser xwe bû. Gundê Wirî piçûke, qasî bîst mal e. Hesenê Bêzi û Eybê Huseynê diçin wir, dibêjin "Peran bidin me". Wiriyê jî diçin ji Mist re dibêjin:

– Kekê Mist, du kes hatine vir, ji me xûgî dixwazin.

Mistê Zilfî dibêje: – Kî ne?

Dibêjin: – Hesenê Bêzi û Eybê Huseynê Fetikî ne.

Mist dibêje: – Hûn ji wan re bibêjin "Herin ji mala Mehmedê Avlay bixwazin, mezinê gund li wir e".

Jineke Mistî heye, wek şêrekê ye. Mist ji jina xwe re jî dibêje:

– Li min binihêre, ku ew hatin vir, gava ku tifingên xwe deynin, tu û mêrê xwe jî xwe qayîm bigrin.

Wiriyekî din î xurt heye, jê re dibêjin ‘Elî Hefsî. Mist xeber dişîne, dibêje "Ji ‘Elî re bêje, gava tu hatî hundir, li ber derî, li ser piyan bisekine".

Hesen û Eyb tên. Mist jî li wir e. Dibêjin:

– Silamû 'eleykum.

Mist dibêje: – 'Eleykum silaaam, werin, werin, werin rûnin.

Ji hêlekê jî vedigere ser jina xwe, dibêje:

– Çima tu wek keran wisa sekinî yî! Van tifingan bigre, bi dîwêr ve hilawîsîne!

Jina wî tifingan digre, hildiwesîne. Hesen û Eyb rûdinin. Fikra Mistî li bêbextiyê ye.

Mist dibêje: – We xêr e?

Hesen dibêje: – Bila Wiriyî ji me re hinek peran peyda bikin, fîşek-mîşekên me tunene.

'Elî Hefsî hatiye, li wir li ser piyan sekiniye. Zavê Mistî, Mehmedê Avlay jî li wir e.

Mist dibêje: – Wey, bila peyda bikin. Peyda dikin û wek keran peyda dikin.

Mist wenî dibêje û ji nişkê ve xwe davêje Hesenî digre. 'Elî Hefsî û Mehmedê Avlay jî xwe çeng dikin ser Eybî, wî digrin. Dibêjin "Werîs bînin, werîs, werîs". Werîs tînin, milên Hesen û Eyb ji paş ve girêdidin û xeber didin qereqola Pîranê. Jixwe hukûmet berê jî gelek li dû wan gerriyaye, neşiyaye wan bigre. Ji Pîranê mufrezeyek cendirmeyan tê, wan dibe Pîranê. Dibêjin "Wan bibin li wan jêran bikujin". Dibin, li binê Pîranê, li ser girekî piçûk her duyan dikujin.

### **Si'îdê Mela Misfay**

Li vî memleketê me, li Pîranê xelkê giştî alîkariya Şêx Se'îd kir; Si'îdê Mela Misfay û Zilfî Ca'îrî tenê alîkariya wî nekirin. Lewra jî hukûmetê ji wan hez dikir. Dibêjin Kemal Paşa, Si'îdê Mela Misfay kiribû xefiyeyê vî memleketî. Gotina wî ji ya walî zêdetir pere dikir.

Si'îdê Mela Misfay demekê hukim kir lêbelê merivên wî û Key Axay [Mala Axa]<sup>45</sup> hevdu kuştin. Du biraziyên wî jî hatin kuştin.

Rojekê mezinên Key Axay ji merivên xwe du xortan dişînin Diyarbekirê da ku wî bikujin. Dibêjin Si'îdê Mela Misfay, walî û qumandarê qolordiyê, li Diyarbekirê, li ser kursiyên rûniştî bûne. Ew du xort diçin, di nava xelkê de bi debançeyan bera wî didin, Si'îdê Mela Misfay dikujin.

**Yên ku ji Kirdkî (Zazakî) wergerandiye:  
S. Rêving û M. Malmîsanij**



<sup>1</sup> **Dimli** (Dibni): Gundekî Pîranê ye.

<sup>2</sup> **Vêrdan**: Mezrayeke gundê Salurî, bi ser qeza Pîranê ve ye.

<sup>3</sup> **Dêrey** (Dêran): Gundekî Pîranê ye.

<sup>4</sup> **Licê**: Qezayeke Diyarbekirê ye.

<sup>5</sup> **Hêni** (Hêne): Qezayeke Diyarbekirê ye.

<sup>6</sup> Bi hawayê ku Gêlî dibêjin, di dema serîhildana Şêx Se'îd de rojekê Zino Begê Gêlî ji Kirdekî re dibêje "Here mehîna min bîne".

Kird naçe û çêrê wî dike, dibêje:

– Ez di ... diya te ...! Îro herb e, çima ez herim mehîna te bînim. Tu here mehîna xwe bîne.

<sup>7</sup> **Qojigî** (Qocîgî): Gundekî Pîranê ye.

<sup>8</sup> **Pîr Mesûr** (Pîr Mensûr, Pîmsur): Li gor gotinan ewliyayek e. Ji Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî tê fêmkirin ku nêzî hezar sal berê jiyaye. Gorra wî nûke jî li gundê Dêreyê ye û ziyaretgah e.

<sup>9</sup> Ji çavkaniyên Tirkan tê fêmkirin ku Şêx Se'îd û hevalên xwe di 11'yê Sibata 1925'an de çûne Pîranê.

<sup>10</sup> **Mehla Cellan**: Taxeke Pîranê ye.

<sup>11</sup> **Ma'den**: Qezayeke Xarpêtê (El'ezîzê) ye.

<sup>12</sup> **Qelbîn**: Gundekî Pîranê ye.

<sup>13</sup> **cendirmeyê bejik** (zefîyê bejik): Cûreyekî milîs e.

<sup>14</sup> **Nebî Axa**: Bi qasî ku tê fêmkirin Neboyê Keleş e.

<sup>15</sup> **Gêl**: Qezayeke Diyarbekirê ye.

<sup>16</sup> **Reşît Axay Têrkan**: Axayê Têrkan bû û ji gundê Îbikanê bû. Li gor ku di nav xelkê de tê gotin, "di dema Împeratoriya Osmanî de ji dewletê jê re kurk dihatin".

<sup>17</sup> **Mistan** (Miston): Gundekî Dara Hênî ye.

<sup>18</sup> **Xelkê Jorê**: [Di vê tekstê de] Xelkê herêma bakurê Pîranê ye.

<sup>19</sup> **Simaqî**: Gundekî Diyarbekirê ye.

<sup>20</sup> **Metînan**: Gundekî Pîranê ye.

<sup>21</sup> **Zeydan**: Gundekî Pîranê ye.

<sup>22</sup> Kurdan di 7'ê Adara 1925'an de êriş biribûn ser Diyarbekirê.

<sup>23</sup> **Botiyan** (Botiyon, Buetiyon): Gundekî Dara Hênî ye.

<sup>24</sup> **Deriyê Mêrdînê**: Ji deriyên keleha Diyarbekirê yek e, li hêla başûrê ye.

<sup>25</sup> **Qerebexçe**: Gundekî Sêwregê ye.

<sup>26</sup> **Şêxmalan**: Gundekî Pîranê ye.

<sup>27</sup> **Şêx Sîrac**: Ji gundê Şêxmalanê û apê Mehmet Salim Ensarioğlu ye.

(Mehmet Salim Ensarioğlu îro meb'ûsê "Doğru Yol Partisi" ye.)

<sup>28</sup> Ev paragraf di 'eslê nivîsê de bi Kurmancî bû.

<sup>29</sup> **Erseki**: Gundekî Pîranê ye.

<sup>30</sup> **Kemal Paşa**: Mustafa Kemal Atatürk

<sup>31</sup> **Tewrîn** (Towrîn): Nêzî gundê Dêreyê ciyek e.

<sup>32</sup> **Key Koçan**: Taxeke gundê Dêreyê ye.

<sup>33</sup> **Ehmedê Huseyn Axay**: Bavê diya Mehmet Salim Ensarioğlu ye.

(Mehmet Salim Ensarioğlu îro meb'ûsê "Doğru Yol Partisi" ye.)

<sup>34</sup> **Kufarbi** (Kuferbi): Gundekî Pîranê ye.

<sup>35</sup> **cuhêr**: tûrikê ku ka û ceh dixinê û bi hustuyê hespê de dîkin, hesp jê dixwe; cuhûr

<sup>36</sup> Xelkê dorûbera Pîranê hîn jî zarokên xwe bi navê Delu fikrî ditirsînin, dibêjin "Delu Fikrî tê ha!"

<sup>37</sup> **Dilbi**: Mezrayeke gundê Herêdanê, bi ser qeza Pîranê ve ye.

<sup>38</sup> **Herêdan** (Herîdon): Gundekî Pîranê ye.

<sup>39</sup> **Xizik**: Şaxekî çemê Dîcleyê ye.

<sup>40</sup> **Bozantya** (Pozantı): Qezayeke Edenê ye.

<sup>41</sup> **Bazbindi** (Bazbendi): Gundekî Pîranê ye.

<sup>42</sup> **Akragi**: Gundekî Pîranê ye.

<sup>43</sup> **Tuyera Sefî**: Li gundê Dêreyê navê dareke tuyê ye.

<sup>44</sup> **Wirî**: Mezrayeke gundê Kufarbê, bi ser qeza Pîranê ve ye.

<sup>45</sup> **Key Axay** [Mala Axa]: Li Pîranê babikek e.

# ŞÊXO

## Naci Kutlay

Şêxo pîrr westîya bû. Nikaribû li ser lingên xwe bisekine. Ji ber birçîbûn û westandinê çevên wî reşe ve dihatin. Sê roj bûn kû çevên xwe negirtibûn. "Lê gere ez ana van nefikirim" digot di dilê xwe de. Tîrsa mirinê pê girtibû.

Kêmasî 12-13 roj bûn kû Şêxo rûyê xwe kurnekiribû. Sê meh berê, hela hê berf nebarîbû, li serê çîyan, hevalê wî, 'Berber Miho' porê wî dabû ber meqesê. Lê porê wî niha wek gincîyan bûn. Ewê li serê van çîyan bicemide û bimire. Ev qazaxê kû xwîşka wî Meyrê jê re çêkiribû nebûya, çakêtê wî li ber vê sermayê tu çareserî nedikir. Gelo xwîşka wî Meyrê ya çevxezal, bîra wî dike? Xwazila niha li gundê xwe yî li Mazîdaxê, li mala wan a germ de, di nav malbata xwe de têra xwe nan bixwara. Li çîyayên Erûhê, di vê zemherîyê de, ev du rojin kû parîyek xwarin ji qirika wî ve neçûbû xwarê. Di hundirê potînên eskerîyê yên kevn û şil de lingên wî dicemidîn.

Hat bîra wî kû du roj berê esker kiribûn telê. Şêxo û hevalên wî heft kes bûn. Her yekî wan ji derekê bûn. Heft kesên çîyayî... Ber ve nîvro bû, li hemberê çîyê, qasî bîst eskeran, bi rêz li pey hev diçûn. Serbazek û du serbazalîkar jî bi wan re bûn. Sê kesên kû kincên

**Naci Kutlay**  
(1931 - Tendurek)  
Kîtêba wî ya dawîn:  
**49'lar Olayı**

gundîyan lê û bi çek bûn, li pêşîyê û bêtirs rê ve diçûn.

Li ber pala çîyê, berpîrsîyarê hevalên xwe, Remo, eskerên kû diçûn rind didît... Xwest kû wan bigre navbera gullebaran a du alî... Silho li cem wî bû. Go, "dev jê berde. Ew ne tenê ne. Li pey wan eskerên din hene, ewê jî bèn. Bi van gundên der doran jî bawerî nabe." Remo, demekî kurt bêdeng ma. Yê dev jê berda... Lê paşê li alê Şêxo ve zivirî:

- De zû bikin. Tu û Xello, ji pa re herrin. Pêşîya newalê bigrin. Emê jî jor ve gullebaran bikin. Bi rûmeta Xwedê, emê qira wan bînin, ji holê rakin, got.

Herdu heval ji paş ve, bi hilke hilka bîhñçikyayî, heta çokan ketin berfê û gîhîştin serê newalê. Xwe veşartin. Bi tirs û heyecan li benda eskeran man kû bira bèn têkevin li ber menzîla gullan. Paşê bi kalanşînkofan dest bi gullereşandinê kirin. Hevalên din jî pê re pê re dest pê kiribûn.

Çawa bû, çilo xeber standin? Di navbera seetekê de balafir û helîkopteran newal dan ber top û gullan... Li newalê, te digot qîyamet rabûye... Kî mir û kî ma?... Şêxo jî nizanibû. Ew bi xwe jî teneğîhîst kû çawa ji mirinê filitîbû. Di tariya şevê de, li cîkî dûr, li şikevtekê di nav xwîn û xwîyê de hişê wî hat serê wî. Nîvê şevê, her diçû serma zêde dibû... Şêxo dicemidî. Di bêdengîya şevê de, ji newalê deng dihatin... Şêxo, "li her deran digerin" got, bi xwe xwe re. "Nikarin bèn van deran, qumandar, eger ji mirinê xelazbin jî, ber jêr çûn ew..." Ev `bênamûs` û `qehpe` jî yê me ne got di dilê xwe de û `qoricî` hanîn pêş çevên xwe.

Di tûrikê wî de piçek nan mabû. Bo kû lingên wî necemidin, zû bi zû ew dilipitandin. Tirsê cemidandin û mirinê... Lê birçîbûn û westandin!... Hevalên wî û Xello çi bûn gelo?

Şêxo ev herema baş nasnedikir. Carekê-duda, ew jî bi hevalên kû ev der baş nasdikirin re derbas bûbû. Mîna kû di bîreka vik û vala de bû ana... Xwe wer hîs dikir. Eger kû xwe bi ji xwe şerm nekiriba, yê dest bi girî bikira... Gotinên hevalên wî hatin bîrê... Fikirî, gere ez ber bi başûr herim. Lê belê zanibû kû her der tijî esker û `qoricî` ne.

Rojtira din jî helîkopteran der û dor berçev û bombebaran kirin. Roja sisya, êdî Şêxo bêhal bû. Lingên wî ditevizîn. Guhên xwe yên cemidî bi keşîya xwe ve nixamt, lê her tişt bêfeyde bûn. Ji birçîbûnê hişê wî diçû. Şêxo rabû ser xwe û ji wir derket, bi tirs dest bi rê ve çûnê kir. Xwe diteland. "Lê wekî ez bi lingên xwe ve herim têkevim nav dijmin?" hat bîra wî.

Demek hat kû Şêxo diricifî. Teqe teqa çengên wî bûn û nedisekinîn... Lingên wî wek daran bûbûn. Şêxo, bi hereketê tilyên lingê xwe nedihesîya.

Bêhîs bûn. Hê jî tirsîya... Rûnişt û solên xwe derxistin. Bi destên xwe yên sor-hêşîn ve lingên xwe mizdan. Bêruh bûn. Demek berê pêçîyên lingên wî yên tevîzî û bi jan, ana wek darekî bêruh bûbûn. Bi zehmet solên xwe kirin lingên xwe. Bi tirsî mirin û cemidandinê hewil da xwe.

Roj çû ava, her der reşe ve hat. Tiştên kû Şêxo jê ditirsîya dihatin serê wî. Hanî bîra xwe kû, ewê li serê vî çîyayî bicemide. Nikaribû rê ve here.

Hêvîya xwe ya jîyanê wî wî wî nekiribû Şêxo. Dest ji hewildanê berneda. Bi zehmet û bîhnçîkayî hat derket ser wî girê pêş xwe. Ji dûr ve çîrûskên îşîqê dîtîn. Bi dîtîna van çîrûskan ve, wisa şa bû, te digot ji nû ve hatîye dinê... Hemû tehlîke û asteng hanîn ber çevên xwe, lê dîsa jî berê xwe da çîrûskan û çû... Hêvîyeka mezin ket dilê wî kû ewê bijî. Di vê dema kurt de tiştên xweş û bi ûmûd difikirî.

Lê çîp û lingên wî pê re nedihatîn. Çend caran li erdê ket û hate xarê. Eger kalanşînkof û tûrê wî nebûyan, dibê kû hê hêsantir bi rê ve biçûya. Carnan erdê ket û rabû, lê bi hewildan gihîşte wê mala kû li serê gund bû û çîrûskên îşîqê jê dihatîn. Seyên malê diewtîyan. Paşê derê malê vebû, zilamekî qerase û bi çek xuya bû. Tivinga xwe ber bi Şêxo kir.

- Tu kî yî?

Zimanê Şêxo venedigerîya û bi zehmetî:

- Ez... Ez... Ez im, got.

Lê bû bi erdê keve, lê hewil da xwe, gavek din pêş de havît... Xayê malê:

- Pêş de neyê, got.

- Ez cemidîm. Min hilde malê, got Şêxo.

Seydo, di gund de, 'qoricî'kî bi nav û deng bû, ewlîn bi wî bawer nekir. Lê paşê, gunê wî bi vî kesê kû nîvê vê şevê, nikare xwe li ser lingan bigre û bêhal ketîye, hat. Fikirî ku tu sebeb tune, meriv ji vî belengazî bitirse... Lê dîsa jî Seydo bêtivdîrî nekir û ket milê wî yî kû bi çek bû. Ew bir malê. Zerê ya jî Seydo jî alî wan kir. Zarok di xewê de bûn.

Alî Şêxo kirin kû ew potînên xwe ji lingên xwe derxe. Hinek darên din jî kirin sobê. Nehîştin kû Şêxo pîrr nêzikî sobê rûne. Pêçîyên lingên wî nû ve dest bi êş û janê kirin... Çiqasî jî germ bûbûn, lê dîsa jî rengê tiliyên lingên wî yên piçûk nehatin guhartinê û nîvhêşîn bûn.

Zerê çay keland. Seydo jî ana bi dudilî bû. Gelo tivinga wî jê bigre û wî bibe teslîmî qereqolê bike? Qereqol ne dûr bû. An jî wî bikuje û meytê wî nîşanî qumandar bide û xelata pera bigre? Kêmasî wê çend mîlyon lîre bidana wî...

Şêxo têdigihîşt kû ew mêvanî maleka dost nebûye. Lê, xayê malê tivinga wî jê negirtibû û dest nedabû ser. Bêçare bû Şêxo... Eger xwe negîhandiba vê malê, wê di nav çend seetan de bicemidîya û bimira. "De çi dibe bira bibe" got, bi xwe xwe re.

Zerê, li hemberî vî xortê bi çek kû xelqê ji wan re 'gerîla' digot, di dilê xwe de hîsseka nîvgerm ferq kir. Nedixwest kû bifikire ev xort merivekî neçê ye û nebaş e... Zanibû kû di gundê wan de jî, pîrr kes ji van xortan hezdikin. Eger ez ne jina Seydoyê qoricî bûma, kî çi zane, minê di derheqê van xortan de çiqas tiştên din bibîhîsta... Rûyê wî jî çiqasî germ û dost e!...

Seydo jî îşev bêdeng û bêhereket bû. Ew halê wî yên tûj û bêînsaf pê re nîn bûn. "Kî çi zane berxê kîjan dayikê ye? Vî feqîrî bibim teslîmî qumandar bikim, wê çi têkeve destê min? Wê li qereqolê bi daran li wî xîn û wî bikujin. Dibe kû qet qurîşek pere jî nedin min... De bira ev jî di rîya xwe ve here. Bira bela xwe ji destê min nebîne" digot di dilê xwe de. Him jî fikirî, "dibe kû rojekê xêra vî gerîlayî jî bigihêje min... Meriv nizane kû rewşa dinê wê çawa bibe..." Paşê di van seetên dawîyê û derengîya vê şevê de, di vê oda germ de, rewşeka nîvdostane di nav wan hersêkan de serî da. Bi dilovanî li hev dinhêrîn û xeberdîdan.

Şêxo êdî femdikir kû tu xerabî bi wî nakin. Zikê wî têtê kirin. Ox!... Bi nû ve hat rûyê dinê. Hat ser hişê xwe. Zerê kincên wî zuha kirin. Goreyên nû dan wî. Xewa Şêxo dihat. Lê li vê malê razan ji bo herdûyan jî nebaş bû.

Berî berbanga sibê, xwarin kirin tûrikê wî, bo kû wî rê ve kin, Seydo û Şêxo ji mal derketin. Li ser girê pêş gund, Seydo:

- Şêxo bavê min... Hevalên we li piştê çîyayê han in... Hêvîdar im tê bi silametî bigihêjî wan. Lê binhêre, di vê newala piştî gund de jî, qereqola eskeran heye... Xwedê neke kû tu têkevî destê wan... Ne te ez dîtîm û ne jî min tu...

Bi vî tehrî ji hev qetîyan... Şêxo ber bi jêr ve diçû û bûyerên wê şevê difikirî... □

# LE YADÎ 50 SALEY KOÇÎ DÎWAYÎ SEYFU'L-QUZAT

**Kerîmî Husamî**

**W**ek dezanîn hukûmeta dîktatota Îran çî car le rojhelatî Kurdistanê rêgay nedaye ku gelê Kurd ziman û edeb û kulturê xo be kar bihênê û pêş ve biba.

Legel ewe ş gelêk nûser û zimanzan û şa'îrî mezin û welatparêz helkewtûn, be nûsîn şî'r û edebî Kurdîyan le fewtan parastûwe û pêş ve birdûwe.


Êk lew zana û şa'îremezine, Ebu-l-Hesenî Seyfî Qazî nasraw be Seyfu'l-Quzat e û le rojhelatî Kurdistan, be "mamostay şa'îranî Mukriyan" nasrawe. Lê mixabin ev zana û şa'îremezine, le Kurdistanî Bakur nenasrawe û şitêk le ser ew nazanin.

## **Seyfu'l-Quzat kî bûwe?**

Nawî wî Hesen kurrî Mîrza Qasimî Qazî, salî 1886 le bajêrî Mehabad le dayk bûwe. Zanistî ayînî 'Erebî, ta piley melayetî le cem baş melay Kurdistan tewaw kirdûwe. Piştî tewaw kirdinî xwêndin, le gundî Gwêgcelî daniştûwe. Seyfu'l-Quzat le nawçey Mukriyan be Seyfî Qazî nasrawe. Seyfî Qazî be zimanî Farişî û 'Erebî û Turkî û Kurdî tewaw şareza bûwe. Nawbiraw, le serdemî şoriş û raperrînî milletî Kurd le hemû beşekanî Kurdistan da jiyawe. Le serdemî şorişî Şêx Se'îd û Şêx 'Ebduselam Barzanî û Şêx Mehmûdî Berzincî û Simkoy Şikak û Seyîd Rizay

**Kerîmî Husamî**  
(1920 - Mehabad)  
Kitêba wî ya dawîn:  
**Le bîrewerîye-**  
**kanim Cîld: 9**

Dêrsim û Mela Mistefa Barzanî û Komeley J. K.'da jiyawe. Zulum û zorî hukûmeteşofênî û dîktatorên dagirkerên Kurdistan be çawî xo dîwe û bindestî û hejarî û derd û zamî gelî Kurdî hest pê kirdûwe, be nûsîn û şî'î nîştimanî û şorişgêrî komelanî xelkî wirya kirdotewe û jibo xebat û têkoşan hanî dawin.



Seyfu'l Quzat

Seyfî Qazî le serdemî deselatî Reza şa da le parçêşî' rêkî şorişgêrî da be nawî "Kurdîne", gazî gelî Kurd deka û debêjî:

Kurdîne, ta key ême le kêwan mîsalî dêw  
 Beyn û biçîn û bo me nebê qet xudan û xêw?  
 Xelkî hemû le bax û le şaran a kêfxoş  
 Ême ş bilaw û bêserê mawîn le deşt û kêw.

Seyfî Qazî debêjî gelo ta kengî Kurd le kêw û çiya bêxudan, wêl û aware bin? Çima xelkî din le şar û le baxan kêfxoş bin û Kurd îş le deşt û kêw bêserok wêl û sergerdan bin?

Pîştî wê, şa'îr jiyânî gelî Kurd legel jiyânî dagirkerên Kurdistanê muqayese deka û delê:



Reşmal e mal û keşk û penîr e meta'î me  
Qesr û serayî xelkî dî ye pir le zêr û zêw  
Bo wan e her çî ciwan e, le cê, dê, le jin le mal  
Her şax û dax e bo me, kurrî reş, kiçî dizêw

Seyfî Qazî, perêşanî w bêdeselatî Kurd beyan deka û delê:

Jêrdestî û îta'etî bêgane ta be key?  
Şerm e le bo me, hênde bijîn bênîşan û nêw  
Fikrê be halî xo ken û bigrîn be halî xo  
Her bêserî û 'edawetî xotan a dête rêw

Şa'êr rû dekate Kurdan û debêjê: Bes e xîretû hebê, jiyani awa bo çî debê?  
Werne meydanî têkoşan û bila le rêya azadî da em hemû bimrin.

Gurdanî Kurdekan, be Xuda rojî hîmmet e  
Dest deyne xenceran û piyawane bêyne nêw  
Bo çiman e mal û ser, ke le ser serwerî nebê?  
Kurr nabê qet bitirsê le zîndan û dar û çêw  
Em jîne, bem zelaletê bo çît e çawekem?  
Bimrîn le rêy necatî weten, ba be nêr û mêw.

Seyfî Qazî, amaje bo fidakarî Kurdekanî Bakurî Kurdistan deka û  
şehîdbûnî Şêx Se'îd û Seyîd Riza dênêtewe bîr û şanazî be wan deka û delê:

Serçûnî text royînî ser darî pê dewê  
Xoşîm e lew şehadetî şêxane nêw be nêw  
Kwa n şêrekurdekan ke le tirsyan delerzî erz?  
Kê bû le Şamê şa bû, le Misrê bibû xidêw?

Seyfî Qazî, derwanête gelanî cîhanê ke her mîllet serbexo û azad mafî xoy  
we dest hênawe. Tenê kurd bêbeş û bindest û bêdeselat e. Debêjî:

Her mîlletê le la we heqî xoy be destewe  
Kurdê ke ser helênê, delên bote ser bizêw  
Azadî, serbexoyî, mîrî û gewreyî  
Dawa biken be zar û ziman û didan û lêw  
Her kes ke pîrr tewawî heqî babî xoy newê  
Ew bêbeş e le Kurdî, derî ken, neyate nêw  
Seyfî Qazî, bo pêşbirdinî ziman û edebiyatî Kurdî gelêk têkoşawe, xelkî

bo xwêndin û fêrbûn handawe. Le parçêşî' rêkî dîke da delê:

Heyf e mîlletêk şeş hezar sal bê  
Nokerî malan rût û recal bê  
Ta key le derkan kiz û bilaw bîn?  
Bê mezin û gewre ser bêkilaw bîn?

Paşan şa'îr le mîlletî Kurd dewxazê ku bixwênin, sebebî diwakewtûyî  
Kurd nexwêndin e û debêjî:

Ew bedbextiye le Kurd rûy dabû  
Le ber nexwêndin kozyan sawa bû  
Wacib e xwêndin bo dinya û dînî  
Pêxember fermûy bo çûnî Çînî

Seyfî Qazî, be pêçewaney zana û şa'îrekanî pêş xoy, le bekarhênanî wişey  
'Erebî xoy parastûwe. Bo derbirrînî hest û bîrî şa'îrane, zimanî parawî Kurdî  
be kar hênawe.

Seyfî Qazî, şî'rekanî be cil û bergî ciwanî Kurdî razandotewe, zimanî  
Kirmancî gundî nawçey Bokan û Çomî Mecîdxanî be kar hênawe. Her bo  
ye ş le şî' rêkî xoy da gutûye:

Qisey xom dekem kurt û Kirmancî  
Hesen Kirmanc e, çî le dîlmancî?

Seyfu'l-Quzat, le serdemêka ku rojhelatî Kurdistan le jêrdestî hukûmetî  
Faris azad bibû, Komeley J. K. têkoşanî xoy pere pê deda û dehat ke awatî  
ew bête cê, le rojî heftî mangî Şubatî 1945 da malawayî le şî'r û edebî Kurdî  
kird û bo hemîşe Kurdistanî be cê hêst û serî nayewe. Rewanî şad û yadî be  
xêr. □

# ROJÊN ÇILE

**Kemal Burkay**

Li Serê Reş  
Şilopê dest pê kir  
Berfeke tenik li Çîyayê Sefîn  
Zevî şîn û reş in  
Li her du alî rê  
Erda hinekirî  
Bi darên berûyê  
Bi mêwên tirî  
Tazî û sêwî  
Şeqlawaya û Hîran  
Ji dûr va Nazenîn  
Ewran dagirtîye  
Çem û robar geş in  
Dinya bédeng e  
Tenê li ser rê  
Lorîya erebê

**Kemal Burkay**  
(1934 - Dersîm)  
Kitêba wî ya dawîn:  
**Kürtler**  
ve Kürdistan

*Çileyê Paşîn, 1994*



# SİBE

## Kemal Burkay

Rojhilat bi rengê zêr û zîv e  
Kosret li ser mijê ye, sifarî ye

Duh ji berfê sîstir bû mij  
Îro xweliya êgir e, risasî ye

Çile ye, lê wek demek ji biharê  
Erd nerm e, hewa nerm e, sibehêke aşitî ye

Dîk bang dike, dû bi ser kulekan ket  
Li jêr xule-xula avê, çavkanî ye

Çivîk dixwînin, lê gol bêdeng e  
Hîn di xewnên şevê da ye, zîvînî ye

Rojê lê da, pelên şevnemî diçirisin  
Zevî şîn bûne, keskezer û çîmanî ye

Bayekî sivik dilîze bi pelên dara biyê  
Dem çû, êdî zerşîn û şerabî ye

Duguhure dem bi dem, deqqe bi deqqe  
Wek rojên payîzê ne, heryêk yêke dî ye

Binêr nuha jî dûmaneke tozpembe  
Lê ew jî çû, çiya reng bi reng in û ezman binewşî ye

*Çileyê Pêşîn, 1994*

# LI DIJÎ "SEFERA VIR-DEREWAN" SEFERA YAŞAR KEMAL

## Rohat Alakom

**P**iştî ku nivîseke Yaşar Kemal ya ku li ser Kurdan di kovara Almanî ya navdar Der Spiegel (9.1.1995)) de der çû, Tirkîye ji nûh ve hejtya, Tirkîye û medya wê bû beşan. Nivîseke ji çar-pênc rûpelan pêkhatî, bi taybetî li Tirkîyê hêzên êrîşkar, aşîtnexwaz û şoven rakire ser pîyan. Lê belê medya cîhanî li hemberî van êrîşan bêdeng nema, rûpelên xwe ji nûh ve Yaşar Kemal re vekirin, gelek rojnamyên navdar, ev nivîsa Yaşar Kemal ya bi navê "Sefera Vir-Derewan" (Feltzug der Lügen) bi temamî wek protestoyê ji nûh ve weşandin. Yaşar Kemal di vê nivîsa xwe de li ser zordestîya ku li Tirkîyê li gelê Kurd dibe û derewên ku tên kirin, disekine. Piştî weşîna vê nivîsê, ev çend hefte ye medya cîhanî Yaşar Kemal ji xwe re kirîye babeteke bingeşîn. Heta niha bi hezaran nûçe, bîr û bawerî, lêkolîn, hevpeyvîn, protesto û nivîsên bîyografîk li ser Yaşar Kemal li welatên cuda-cuda hatin weşandin. Li gelek welatan, bi zimanên cuda-cuda ji aliyê nivîskarên cîhanî de bi sedan nivîsên piştgirtiyê û dilgermîyê der çûn. Tişteki balkêş jî ew e ku di van hemû materîyalan de peyva Kurd û navê Yaşar Kemal gazî hev dikin, li tenîştê hev cîh girtine û ketine zikê hev. Êdî mirov nikare peyva îfadeyên "Kurd" û "Yaşar Kemal" ji

**Rohat Alakom**  
(1955 - Qers)  
Kitêba wî ya dawîn:  
**Di Folklorê Kurdi**  
**de Serdestîyeke**  
**Jinan**

hev biqetîne, cuda bike. Bi vî tehrî doza Kurdan, gazî û hawara Kurdan bi saya Yaşar Kemal careke din - lê belê bi dengêkî xurt -li hemû cîhanê û medya wê de bi firehî belav bû. Hêzên êrîşkar li Tirkîyê bi êrîşên devkî û nivîskî neman, vê carê jî Yaşar Kemal dane dadigehê, dixwazin vî nivîskarê 70 salî û navdar têxin zindanên tarî. Lê belê van hêzên kevneperest û êrîşkar pê li "damara Yaşar Kemal ya Kurd" kirine, çawa tê xuyan Yaşar Kemal rîya stûxarkirinê û bédengîyê hilnebijartîye, heta wê "Sefera Vir-Derewan" pûç bike, bêtesîr bike, nivîskarê navdar soz daye ber xwe bide û li dijî van seferan bisekine, her tiştî êşkere bike. Mirov dikare bêje îro sefereke nûh ji aliyê Yaşar Kemal de tê bi dar xistin, li dijî zordestî, ezîyet, şer û neheqîyê. Vê seferê berê xwe daye Sedsala Bîst û Yekan, sefereke armanckivş û vekirî. Hejmara hevalbend, dost, hogir û mirovên aşîtxwaz ku dixwazin tevî vê seferê bibin, çi Kurd çi Tirk çawa em ji medyayê fêr dibin roj bi roj zêtir dibin. Mirov dikare vê seferê bi "Sefera Yaşar Kemal ya sala 1995" jî bi nav bike an jî dîrokê rojekê vê seferê bi vî navî bîr bîne.

Yaşar Kemal îro li hemû cîhanê wek nivîskarekî navdar û bijarte tê hesibîn. Berhemên wî yên edebî heta niha bi sî zimanî hatine weşandin. Bi dehan nîşan û xelatên neteweyî û navneteweyî wergirtine. Yaşar Kemal, bi xwe di sala 1923'an de hatîye dinê, di sala 1993'an de 70 salîya xwe tijî kir. Navê dîya wî Nîgar Xanim e, ew ji eşîra Kizikan e, navê bavê wî Sadiq e, ew ji eşîra Luvan tê, milekî koma Zilan tê hesibîn. Malbata wî di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de ji Kurdistanê bar dike, tê bajarê Edenê. Malbata wî, berî ku bê Edenê li gundekî Wanê, Ernîsê dima. Jîyîna Yaşar jî qasî berhemên wî Kemal gelek balkêj e. Romana wî ya pêşîn bi navê Memedok (Ince Memed) di sala 1945'an de hatîye weşandin. Ev çil sal e Yaşar Kemal bênavbirî dinivîse.

Bi munasebeta tijîkirina 70 salîya Yaşar Kemal, di sala 1992'an lêkolîneke me, bi navê Di Berhemên Yaşar Kemal'de Realîta Kurdî li Îstenbolê bi zimanê Tirkî der çû. Bi taybetî di romanên wî de motif û temaya Kurdî çawa cîh girtîye, ev yeka hatîye analîz kirin, sûret, nîgar û mêrxasên Kurd yek yek hatine nasandin. Dema mirov romanên Yaşar Kemal dixwîne, mirov xwe li Kurdistanê dihesibîne. Tema Kurdî di berhemên Yaşar Kemal de temake here bingehîn e. Di berhemên wê de bajarê Wanê û Araratê du navçên navdar in. Bi taybetî trîlogîya wî ya dawîn (Çivîka Baranê, Deriyê Kelê, Dengê Xûnê) bi serê xwe şahberhemek e. Yaşar Kemal dema ev romana ji sê cildan pêkhatî nivîsîye, gelek di bin bandûra serpehatîya malbata xwe de maye. Lê belê dema mirov qala Yaşar Kemal dike, béguman romana wî ya bi navê

Memedok (Ince Memed) tê bîra mirovan.

Yaşar Kemal, ew tekoşîna ku mêrxasê romana wî ya pêşîn Memedok di nîvî de hiştibû, niha ew bi xwe bi metodên gelek cuda ve dixwaze berdewam bike, rûyê belengazan û bindestan bikenîne. Memedok kincên nûh xwe kirine û bûye Yaşar Kemal... Nivîskarê navdar tam berî çil salî romana xwe ya pêşîn nivîsî (1955), çar cild nivîsî, li cîhanê wusan hate nas kirin ku di dawîyê de bû abîdeke edebî. Ew eşqîyayê navdar çawa tê zanîn, timê adalet û wekhevî belav kirîye, timê xweşî, qencî barandîye û hêvîyên mezin hêrandîye. Mirov dikare bêje ku ne tenê Kurd û Tirk, Yaşar Kemal bi romana xwe ve li cîhanê bindest rakirine ser pîyan, bi mîlyonan mirov hînî serhildanê kirîye, ew perwerde kirine; bûye mamosteyê serhildana mirovan. Eger mirov vî alîyê Yaşar Kemal bifikire, mirov dikare bêje ku tenê nivîsîna vê romanê bi serê xwe bûyerek e. Çawa Memedok rûmeta xwe erdê nexistîye, timê li ser çîyan bi serbilindî, hewa paqij ya çîyan kişandîye hundurê xwe, Yaşar Kemal jî wusan bi vê kelecane mezin bûye û bûye heyranê mêrxasê vê romana xwe, peyketîyê wî. Memedok, vî mêrxasê edebî û mîtolojîk li dijî neheqî, zorbetî, ezîyet û îşkencê timê serî hildaye, di dawîya her cildekî romanê de yekî zalim di kuje û îza xwe wunda dike. Kuda çû Memedok? Wusan tê xuyan çar cild roman têra tekoşîna an jî jîyîna vî mêrxasê serê çîyan nekirîye. Dema mirov Memedok û Yaşar Kemal dide ber hev, mirov dikare bêje ku wek bavê Memedok, ango Yaşar Kemal îro naxwaze stûyê xwe li hemberî van hêzên zordest xar bike.

Di van salên dawîn de çend nivîsên Yaşar Kemal derheqa problema Kurdan û çareserkirina wê de li weşanên cuda hatin weşandin. Ji der romanên wî, ji der berhemên wî yê edebî, ev nivîs wek çend dokumentên dîrokî dikarên bên hesabîn. Di van nivîsan de çend têzên Yaşar Kemal jî hene ku wek çend materîyalên referansê me gelekî ronî dikin û Yaşar Kemal di her nivîseke xwe de mecbûr maye, ev tezanan careke din dubare kirîye.

Di sala 1991'an de Yaşar Kemal ji alîyê hêzên resmî de wek "Hunermendê Dewletê" hat hilbijartin, lê belê Yaşar Kemal ev nişan û xelata hilneda, red kit, nexwast xwe erzan bifroşe. Ew dewleta ku bi salan bi destê leşkeran hatîye gerandin, xûn difinê bi hezaran însan re anîye, bi taybetî li ser gelê Kurd zordestîke bêhempa pêk anîye, angorî Yaşar Kemal ew dewleta nikaribû bibe dostê hunermandan û nivîskaran.

Teza Yaşar Kemal ya bingeşîn bêguman teza "Baxçekî ji hezar kulîlkan pêkhatî" ye. Hebûna gelê Kurd yek ji van kulîlkan hesabandîye. Di sala 1992'an Unîversîta Behrasipî (Akdeniz Unîversîtesî) ji ber xebat û berhemên

Yaşar Kemal xelateke bi navê "Doktorîya Fahrî" da Yaşar Kemal. Ji ber dayîna vê xelatê Yaşar Kemal axaftinek kir. Yaşar Kemal di vê axaftina xwe de li ser babeteke gelek giring sekinîye. Ev axaftina paşê di rojnama Cumhuriyet de wek çend beşan hate weşandin, navê nivîsê "Ji Herêmiyê Berbi Unîversaliyê" bû. Yaşar Kemal di vê nivîsa xwe de bi zimanekî edebî besa hebûna çandên (kultur) Anadolîyê dikir. Nivîskar, her çandek, wek kulîlkekê dîtîye, her çandek renek e, rîmek e, bîhneke û dewlemendîk e. Paşê wî teza "baxçekî ji hezar kulîlkan pêkhatî" formule kirîye. Jêkirina her kulîlkekê - zordestîya li ser her çandekê - wek nîşana kavilkirin û xizankirina çanda cîhanê dîtîye. Yaşar Kemal, bi van gotinên rênîşandar xwastîye bala guhdaran û xwendevanan bixşîne ser mozayîka Anadolîyê, li ser vê axê ne tenê Tirk, wusan jî Ermenî, Kurd, Yunan, Çerkez û Ereb jîyane, çanda mirovatîyê dewlemend kirine. Bi peyvên mayîn, Yaşar Kemal xwastîye li dijî ceriyanên şoven, nijadperêz û dîtînen nasiyonalîstên Tirk derkeve, lê belê bi zimanekî gelek şirîn, edebî û dîplomatîk.

Yaşar Kemal, di van nivîsên xwe de li ser pirseke mayîn disekine, angû babeta biratîyê. Angorî Yaşar Kemal, Kurd û Tirk bi salan li erdekî bi biratî jîyane, lê belê biratîya wan qet baş nebûye. Birayê Tirk timê xwastîye birayê mayîn - birayê xwe yê Kurd - bédeng bihêle, bifetîsîne, zimanê wî biqetîne û qedexe bike. Timê bi çavekî nîv-bira Kurdan mêze kirîye. Bira biratîya xwe piştî salên 1923'an ji yekten ortê rakirîye, hebûna birayê xwe yê Kurd înkâr kirîye, gotîye dest ji Kurdîyê berde, were bibe Tirk. Birayê Kurd ecêba qasî vê ecêbê nedîtîye, serî hildaye. Vê carê bi salan şerê birakujîyê berdewam kirîye. Yaşar Kemal bi zimanekî gelek zelal dide dîyar kirin ku biratî waha nameşe, biratîke wusan li cîhanê tune ye. Ji ber vê yekê jî îfadeya "biratî" yê di mercên Tirkîyê de angorî Yaşar Kemal îfadeke pûç û derew e. Peymana navbera biran ji alîyê hêzên resmî û leşkerî de timê hatîye pêpes kirin û bedkar kirin. Dîsa angorî Yaşar Kemal pêwîst e mirov têkeve navbera van herdu biran, vî şerê qilêr, qirêj bide sekinandin.

Derheqa çareserkirina vî şerî de, bi dîtina Yaşar Kemal, Tirkîyê pêwîst e maf û azadîyên birayên xwe yên Kurd bidin. Çawa? Bi çi rê ve? Bersîva vê pirsê Yaşar Kemal, di nivîseke xwe de eşkere kirîye, bi Kurdan re, nûnerên wan re pêwîst e bê rûniştin, bi aşîti ev serêşîya sedsale dikare ji ortê rabe, ev nivîsa xwe li ser kuştina dostê xwe, nivîskarê Kurd, Musa Anter nivîsiye.

Angorî Yaşar Kemal di navbera pênc salan de pêwîst e mafên Kurdan bê dayîn ku mirov bi serbilindî têkeve sedsala bîst û yekan, teqvimê êdî divê kiviş be. Yaşar Kemal bi teza xwe ya sedsala bîst û yekan ve bi rastî dixwaze bêje



ku bindestîya Kurdan êdî bira sedsaleke mayîn de jî nejo, ev yeka bi navê mirovatîyê şermeke mezin e.

Yaşar Kemal vê derengmayînê wek nîşaneke rojên reş jî dibîne. Eger maf û azadîyên Kurdan neyên dayîn, ihtîmaleke mezin e, ev birîn êdî neyê pêçandin, ji ber ku birîn hene qenckirina wan mimkun nîne. Yaşar Kemal di rojname Frensî ya bi nav û deng de Le Mond mecbûr maye çîroka Biratîya Gundî û Mar dubare kirîye, di vê çîrokê de gundî û marekî ku zirara wan gelek gîhiştîye hev, dîsa jî dixwazin bibin destbirak, lê mêxabin tecrûbe û serpêhatîyên wan ji biratîke nûh re dest nade, êdî dereng e...

Yaşar Kemal, çareserkirina problema Kurdan wek faktorekî bingehîn yê demokrasîyê dibîne. Eger problema Kurdan neyê çareserkirin, li temamîya Tirkîyê mercên pêkhatina demokrasîke rastîn tune ne. Di vê babetê de Yaşar Kemal gazî xêrxwazên Tirk dike. Bi kurtî ev nivîsên Yaşar Kemal yên teorîk wek çend dokumentên dîrokî dikarên bên hesabîn, mirov dikare gelek behre û feydê jê bigire.

Ji alîyê din bandûra vê rabûn û îsyana Yaşar Kemal tiştêkî din jî fêrî me dike û çareserkirina problema Kurdan de faktorekî bingehîn jî eşkere dike, di vî şerî de muxalefeta komên (tebeqeyên) navîn çiqas girîng e, vê yekê baş eşkere dike. Sê navên mezin, sê nivîskarên Tirkîyê yên here navdar wek Yaşar Kemal, Azîz Nesîn û Orhan Pamuk îro hawar û gazîya Kuran li dinê belav dikin. Piçekî jî ew dikarin vê meşa bûyeran ya kilîtîkirî biguhirînin. Hêzên dewletê naxwazên nêzikî hêzên Kurdan yên leşkerî bin, bi wan re rûnên, hezên dewletê çend caran gazîyên PKK'yê yên sekinandina şer bêbersîv hîştin, dewlet dixwaze sîyaseta xwe, li ser bingehên mîlîtarîzmê ava bike. Herdu alî vê gavê ketine qirika hev, kê zora kê bibe, vê yekê dîrok ê nîşan bide. Lê belê tiştêk eşkere ye, kîjan alî van komên navîn bi dest bixe, wek Yaşar Kemal, wek medya, wek hêzên demokratîk û dengên mezin, bigihîne xwe û bi wan re bibe yek, bêguman ev alîyê sedî-sed bi serkeve. Ji ber ku ev koman kapasîteke mezin pêk tînin, hêzên xurt in, dikarin ênînivîsa vî şerî tayîn bikin û biguhirînin. Yaşar Kemal mirovek e, dengvedana nivîseke wî ya çar rûpel dikare raya cîhanê seferber bike û têxe bin kontrola xwe. Ji ber vê realîta Yaşar Kemal, Kurd êdî pêwîst e mekanîzmayên raya giştî ya cîhanê û medyayê baş bi kar bînin, ji xwe re dostên nûh bi dest bixin. Di rojnamekê de berî çend salan min dabû kîvşê, niha jî dibêjim Kurd pêwîst in xelata xwe ya mezin, "Nobela" xwe ya neteweyî bidin Yaşar Kemal û kesên wek wî, rûmeta wan bilind bikin, niha dor dora Kurdan e, bi vî tehrî Yaşar Kemal dikare bê pîroz kirin. Dezgehên Kurdan pêwîst in, îsal Xelateke aşîtîyê wek

mîsal bi navê Ahmedê Xanî, bidin Yaşar Kemal, wî ev xelata ji zûda heq kirîye. Heta niha tu kesî qasî Yaşar Kemal rûmeta Ahmedê Xanî negirtîye û ew bi cuda nav nekirîye. Yaşar Kemal, di romana xwe ya bi navê Efsana Çiyayê Araratê de, Ahmedê Xanî wek evliyakî dibîne, ji cihê padîşahan bilintir li ser textekî mayîn wî dide rûniştandinê û Ahmedê Xanî wek "Padîşahê Padîşahan", "Siltanê Siltanan" bi nav dike. Xelata dost û hevalê wî Musa Anter jî, îsal divê ji Yaşar Kemal re bê dayîn. Her kes dizane Yaşar Kemal ne hewceyî xelat û nîşanan e. Lê belê em Kurd hewceyî dostên nûh in, pêwîst e em hurmeta wan jî bizanibin. □

### Çend çavkanîyên kêrhatî:

- Yaşar Kemal, *Yerel Kültürden Evrensel I-III*, Cumhuriyet 21/23.4.1992.
- Yaşar Kemal, *Entretiens avec Alain Bosquet*, Paris, 1992 ( Ev pirtûka ji hevpeyvînan pêkhatî wusan jî, li Tirkîyê der çû: *Yaşar Kemal Kendini Anlatıyor - Alain Bosquet'nin Yaşar Kemal'le Konuşmaları*, İstanbul, 1993).
- Rohat, *Yaşar Kemal'in Yapıtlarında Kürt Gerçeği*, İstanbul, 1992.
- Yaşar Kemal, "Ya Devlet Başa, Ya Kuzgun Leşe" Değil I - Akan Kana Ekmek Doğradılar, Cumhuriyet 26.9.1992. "Ya Devlet Başa, Ya Kuzgun Leşe" Değil II - Kürtler İnsani Haklarını İstiyor, Cumhuriyet 27.9.1992.
- Yaşar Kemal, *40 Bin Yıl Su Altında Cilanan Destan*, Cumhuriyet 4.5.1992.
- Oktay Ekşi, *Yaşar Kemal'e Doktora*, Hüriyet 22.3.1992.
- Yaşar Kemal: "Özünü Yitirenleri, Kendilerini Yadsıyanları Hiç Sevmedim"* (Hevpeyvîn), Gündem 25.8.1992.
- Un Entretien avec Yachar Kemal* (Hevpeyvîn), Le Monde 3.7.1993.
- Hadi Uluengin, *Yaşar Kemal'in Bilgeliği*, Hüriyet 15.7.1993.
- Yaşar Kemal'den Özal'a Kürt Mektubu I-II*, Aydınlık 2/3.6.1993.
- Rohat, *Yaşar Kemal Dikeve 70 Saliya Xwe*, Nûdem No:7/1993.
- Yaşar Kemal: Binmişler Alamete, Gidiyorlar Kıyamete* (Hevpeyvîn), Özgür Ülke 18.12.199 (Ülke'ye Bakış-Özel Ek).
- Yaşar Kemal: "Li Rojhilata Navîn 40 Hezar Kurd Hene"* (Hevpeyvîn), Welat, hejmar:5, 1994.
- Yaşar Kemal, *Feltzug der Lügen*, Der Spiegel, No:2/1995
- Zülfi Livaneli, *Yaşar Kemal'i Korkutan Şey*, Milliyet, 12.1.1995.
- Mehmet Ali Birand, *Avrupa Konseyi'ndeki Toplantı ve Yaşar Kemal*, Sabah 12.1.1995.
- İlhan Selçuk, *Dök Benzini Üstüne, Çak Kıbriti...*, Cumhuriyet 15.1.1995.
- Yavuz Gökmen, *Yaşar Kemal'i Yakalım Mı?*, Hüriyet 11.1.1995.

# BÎRANÎNEKÎ: HECÎ MIHEMED ELIYÊ QELŞO

**Rojen Barnas**

(Radiyellahû teala enhû)

”– Lê çawa, malava! Qey xortê niha jî bera xort in. Ferz e ew wisa dibêjin. Xortanî xortaniya heyamê me bû.

Ez xortekî sivik î hê çardeh salî bûm. Ji efendiyê xwe re bêjim, min hê nû dil girtiye, bengî me, dûman ji nav serê min dikişe. Eysê, de Xwedê jê razî be, keçikeke wisa delal û xweşik e ku winda bibe temamê keç û bûkê vê ebra me di mizgîna wê de dernakevin. Lê qîza kerê rû nade min. Tew li siya min jî nanihêre. Ez tînim har bibim. Çawa ez ku ez bim, Mihemed Eliyo bim û dilê xwe bikimê û vê kafîrbava ha xwar nebe û li siya min nenihêre?! Ev efendiyên ha cahil in pê nizanin, Mêlê min î delal! Lê te ji bavûkalan bihîstiye. Zemanê me, wekî vî zemanî ne berdîberdan bû: Eyb û şerm hebû, fedî hebû, hîcab hebû. Êh! min jî ji kal û rûsîpiya, ji der û cîranan şerm e. Lê di nav dilê xwe de diqaqijim. Çi bikim çi nekim? A ku min nedî, wele rabûm ji bona sosreta giran min porê xwe berda. Porê min dirêj bû, bû kezî. Du kezîyên dirêj, ha bi qasî zendikê min stûr ji paş re dihatin li binê qorika min diketin. Mêr, jin, kal, pîr digotin: 'Mihemed Eliyo lawo ev çi hal e li te qewimiye? Te em hetikandin, bes e, şerm e êdî porê xwe jêke. Tu zilam î, porê xwe wek yê zilaman bike.' Min serê xwe dihejand û di ber xwe de dibîşîrîm, guh nedida wan û diçûm.



”Bihar e! Hê gundî gişt di hundiran de radizên, derneketine ser xaniyan, lê ji kerb û wehcan tebata min nayê; ji bona hema sirfbîhna wê qîza kerê were min derdikevim li serbanê xanî radizêm. Xwedê tu ew Xweda yî lê gavê tu ne ew gav î: Şevêkê, du parê şevê çiyê parek maye; carek bi deng û hewirza gundiyan bi xwe şiyar bûm. Min guhê xwe dayê ku ji newala jêrîn a biniya gund deng û qîjîn û helahela gundiyan tê. Min ji xwe re got: Hela! hela! Xwedê xêr ke, ev hinek avêtin ser gund talan kirin, ev çi bû? Wele hedin bi min neket hema sivik rabûm û min xwe di xaniyê du tebeqî de avêt xwarê û li êlama gundiyan, ber bi aliyê newalê bi bazdan çûm. Hê min riya xwe bi nivî nekiribû, elhemdûlîlah hewar xêr bû, gundî zivirîn, em rastî hev hatin. Lê çi? Kî rastî min dibe kenek pê digire, dikene û dibêje” hela bala xwe bidinê, hela lê binêrin!’ Hingî ez dibêjim ’kuro lawo çi biye, hun çima dikenin?’ Ew bêtir bi min dikenin. Êh! damara hêrsê jî damareke pîs e, Melê min. Wele ez hatim hêrsê, min çavê xwe girt û devê xwe vekir ku tu avahiyek ji wan re nehêlim, rûsipîkî hema destê xwe danî ser devê min û gote min: ’Mihemed Elî, berxikê min, çika li ser milê xwe bizivire û binêre!’ Ez li ser milê xwe paşve zivirîm û min bala xwe dayê; wey la malikê tu xera nebî! bangeranê (lox) qiraseyê giran ê ser xaniyê me, bi herdû keziyên min ve li ser piştê min hişk negirêdayî ye?.. Ez di ber xwe de bişirîm, himmm! Welahînê Xwedê ev, hunerê wê qîza kerê yê Eysê ye. Gundî hatin ku vekin ji ser piştê min deynin, min got: ’Na! Li ber destê Xwedê ehd û wehd be, ev fêhlên wê qîza kerê ne, wê çawa bi wan destê xwe yên nazik hatiye bi keziyên min ve girêdaye, herwisa jî hetanî ku ew neyê dîsa bi wan destê nazik veneke, ewê ev bangeran a wisa li ser piştê min bi van keziyan ve girêdayî bimîne.’

”Lê! Melê min î delal! Di zemanê me de xort hebûn, hikmê xorta hebû. Dûrî ji civatê xortê niha jî ji xwe re dibêjin ’ em xort in û me xortanî dît ’, te got qey bera ew jî xort in.”

Hecî Mihemed Eliyê Qelşo (radiyallahû teala enhû) vê serpehatiya xwe ji me re di civata li dikana Mele Mehmûd de digot.

Rojekî ji rojên Payiza paşîn a 1966 an bû. Piştî ji xwendegehê derketinê, me serîkî li qehwexanê xistibû, di pey de ez û Fikrî Xoce hatibûn aliyê çarşiya jêrîn. Bawer dikim jê re tiştêkî kirînê lazim bû. Lê li ber dikana Mele Sacid -ku Mele Mehmûd li nik dixebitî- Mele Mehmûd em vexwendin: ”Malavano! Ma dilê we di ber çaya me re nayê. Welleh hema ji min tirê keratî be jî ji bûna xatir divê hun min neşikênin.”

Mele Mehmûd hevalekî me yî hem dilovan û hem jî dilzîz bû. Ji bona

neşikandina dilê wî em derbasî hundirê dikanê bûn. Em hê baş bi cih bûbûn-  
nebûbûn Mele Sacid jî hat.

Piştî bi cî kirina me, Mele Mehmûd derketibû ber derî û camêrekî dinê  
jî bi wî zarşîrînî û karoziya xwe anîbû hundir û bi me dabû nasîn. Ew camêr  
-himet û bereket hazir be- ew zat bû: Hecî Mihemed Eliyê Qelşo.

Di pey kêfxweşîdayina hevûdu, Mele Mehmûd; bi awakî taybetî ya xwe,  
gotinê anîbû ser bikêrî an békêriya xortên îroyîn û ji cenabê wî halê xortên  
zemanê xortaniya wî pirsî bû. Li ser xwestina Mele Mehmûd Hecî Mihemed  
Elî dest pê kiribû û vê serbûriya xwe ji me re gotibû.

Piştî ku Hecî serpehatiya xwe qedand, Mele Mehmûd got:

– Maşelah û subhan ji Xwedê re. Ew bangeranê qirase yê giran ku meriv  
pê xanî digêrîne li ser piştî te û bi kezîyên te ve girêdayî, bi wî halî te ji serbanê  
xanî xwe avêt û heta newalê bazdayî çûy, gelo qet pê nehisiyayî ku wayê  
giraniyek li ser piştî te ye, ya jî giraniyek bi serê te ve daleqandî ye? Te qet  
tê dernexist ?

Hecî bişîrî û got:

– Camêr tu merivên berê û yên niha dikî yek? Xortên zemanê me bi şipil  
bûn, jêhatî bûn, bi destekî bangeran radikirin. Yên niha sistopisto ne,  
zilhimokî ne. Serê sibê hetanî evarê di kuçe û poxangê qesebê de wek hevîrê  
tirş bi hev de tirş dibin. Di wextê me de ref û nêçîr hebû, kevirê qewetê hebû,  
topenanê hebû! Ka tebatî bi me diket?

Fikrî xoce bi teqilandin jê pirsî:

– Nêçîrvanekî çawa bûy Hecî?

Hecî pirsî wi li cî nehişt. Bêî dudiliyek bike bersîv da:

– Elî axa - ev Elî axayê me- nêçîrvanekî bêhempa bû, di wextê xwe de. Em  
jî gundiyê wî bûn. Hema wextê ku nêçîr hebiya ewê ji bajêr bihata , tevî  
gundiyê ku bi nêçîrê emel dikirin biçûna nêçîrê. Êh! qoce Elî axa ye! Mêrikê  
mezin e, bi tena serê xwe diçe derekê? Himin ewê pê re ji maqûl û hakiman  
çend kes hebin. Dîsa bi wî awayî carekê hat gund. Bi xwe re jî uzbaşî û çend  
mamûr û efendî anîne. Êvarê li dîwanê gote me: ” Karûbarê me bikin emê  
sibê herin nêçîrê.” Wele serê sibê ji wî serî de ez jî rabûm, min hespê xwe hazir  
kir û çûm ber deriyê koşkê. Elî axa û mêvan jî rabûbûn. Piştî ku xurîniya xwe  
kirin, nêçîrvan bi rê ketin. Êh! nêçîrvan jî bera nêçîrvan bûn; bi tîfingên desta  
herî baş, bi dûrebîn! Xulam tajî berdand û em ketin rê. Ez jî dûredûr li pey  
wan im. Te dî eyb e ku meriv şerefa mezin û maqûlan û nexasim a mêvanên  
wisa bişkêne. Wele ji serê siba Xwedê heta piştî esira dereng Elî axa û mêvan

û qewta nêçîrvanan; ha ew newal li min ha ew gaz li te, ha ev mit li min ha ev mesîl li te bi gera li pey nêçîrê efter bûn, betilîn. Betilînê jî li wê derê bihêle, li ber xwe jî dikevin. Ewçend nêçîrvanên bi navûdeng ku bê nêçîr bizivirin ser kevaniyan, de dûrî ji Axê rûreşî ye, rûreşiya giran e. Êh! çi bikin? Rebena sihêtiya xwe kirin. Wele tam qewlê xwe dan ku bizivirin gund bi siwarî kişiyam pêş û çûm li ber Elî axa sekinim, min patekî dayê û got: "Ez xulam we dora xwe kir, vêca dora min e. Bi Rebê izetê kim herçî bê nêçîr em îşev nezivirîn bi ser kevaniyan de." Elî axa gote min: "Kuro lawo te ne tîfing e, ne çek û sîlahêkî ye, tu yê bi çi nêçîr bikî?" Min gotê: "Ez xulamê haziran im, Mihemed Eliyê delûdîn im. Ev karê min e, îşê we pê neketiye." Û wele min berê serê hespê xwe li ba xist û da xarê. Di destê min de şivekî heye ku serî digihîje erdê. Wele min şiva xwe rakir û geh li rastê geh li çepê, geh li vê rûmikê geh li wê kemê dixim, bi her daweşandina şiva min re ya cotekî kew hema dibêjin pîrr bi hewa dikevin û dikevin erdê ya jî kîroşkekî hildipetike û li ser piştê dikeve. Ku tajî pejnê hilanîn dane dû min û nêçîrvan jî dan pey tajiyan. Wele di nava bîskêkê de êdî xurcên serpiştê hespên siwaran ji nêçîra min a ji kew û kîroşk û rawiran nehat hilanîn. Êdî min got: "Axa! ji min ew qas, êdî îro ew çend bes e." Wele em zivirîn gund, zariyan ew şev kêfa gurê pîr kirin ."

Çima ya jî çawa bû nizanim, Mele Hadî hat ber dikanê selavê li me kir, me pirsra hevûdu kir. Di pey de ji me re got:

– Çi ye we guhê xwe daye vî Qelşo î kûra vira, ji we re çi virê dike?

Min ji Mele Hadî hez dikir, lê bi rastî ez ji vê gotina wî aciz bûm û min gotê:

– Haşa ew çi behs e? Em ji xwe re suhbet dikin.

Mele Hadî zivirî çû dikana xwe. Hecî Mihemed Elî di ber xwe de got: "Ji periya welî, ji weliya xwelî. Heyf e ku ji yekî mîna Seydayê Mele Huseyn bê îqadekî wekî viya ma."

Wekî ku masî bi serê nîka masîvanî girtibe, herwisa firseta gotinê ket destê Mele Mehmûd, li me çav kir û jê re got:

– Bi Xwedê kî apê Hecî Mihemed Elî, te dî te û rehmetiyê Seydayê Mele Huseyn we bi hev re hevaltî kiriye. Heta dibêjin ku we bi hev re li şerê Qorayê dîtine.

Serî di ber de, Hecî Mihemed Elî li Mele Mehmûd vegerand:

– Ji xwe wayê pê dizanî, êdî ez çi bêjim. Wayê bisilman pê dizanin, Mele!

– Çi şik? Xwedê jê razî. Lê ev efendiyên ha - Mele Mehmûd min, Ethem

û Fikrî xoce nîşanî wî da - pê nizanin. Ku tu li ba wan jî bêjî, hêvî Xwedê belbî îmana wan jî xurt bibe, îqada wan bikeve cî. Tê jî pê xwedanxêr bibî.

Xwedê-jê-razî dilê Mele Mehmûd nehişt serpêhatiya xwe ji me re got:

- Şer bû, şerê bisilmanan û qoce kafirî bû. Zivistan e, sar e, serma ye, gêdûk e: Eskerên bisilman hînî sermaya wisa şedîd nebûne; qalind li xwe dikin nikarin bilibitin, tenik li xwe dikin dikarin bilibitin, lê vêca ji sermayê diqefilin. Eskerê wî kafirî tenik li xwe dike, lê di ber de jî araq vedixwe pê germ dibe. Êh! ewê eskerê me çawa bi wî kafirî re şer bike? Fîzar-fîzara wan e, meazelah! Wele ez bûm, himet bereket hazir be Seydayê Mele Huseyn û Seydayê Mele Yehya yê Ferhendî bûn, Şêx Evdilqadirê Gêlanî, Şahê Nexşebend, Hezretî Elî, Hemze Pêlewan û li ber cemala navê wî selewat Hezretî Mihemed, wele hema me da pêşiya zariyan, şûr kişand û êrişê bir ser wî kafirî. Her carê ku em li milê rastê şûrê xwe dadiweşînîn bi êlama Xwedê şûrên me çil carî dirêj dibin û pê re çil serî wek kulî dikevin erdê, vêca em li çepê dadiweşînîn dîsa şûrên me çil carî li xwe dirêj dibin û pê re çil serî dikevin

Yekî jê re got:

- Ev yekcar çi bû? Çawa bû? Qey destê wan bi doxîna diya wan ve bû ku li ber we dest ranedikirin?

Mele Sacid nihiçik di teniştê de lê da û got:

- Hecî efendî û kesên dinê xeybane bûn qey ji kafiran ve dihatin xuyankirin Xwedê-jê-razî.

Hecî serê xwe hejand:

- Lê! lê! Lê çawa. Ji xwe eskerê kafir ji eskerê me re digot: "Wele hun ne tiştêkî ne, lêbelê ji nav we carina refek kevok radibin û bi ser me de tîn, ew in ku qira me tînin."

Mele Sacid jê pirsî:

- Êh baş e, Hecî efendî, ev qet çek û sîleh, top û tîfingên wî kafirî tunebûn? Ev qet derba wan li we nediketin?

Hecî bi destê rastê riyê xwe yê şînbaz û pîroz mizda û bişirî.

- Çawa tunebûn? Wele wek taviya teyrokê berikê top û mîtraloyozê wî kafirî dihatin me. Dihatin me lê çawa? Li me diketin, di cilê me de derbas dibûn diketin hundir, di navbera tazî û kirasê me de diman.

Yekî jê pirsî:

- Hun pê brîndar nedibûn?

Wisa xuya bû ku dilê wî zatê muhterem bi nezaniya me dişewitî. Serê xwe bi bişirîneke nerm ve hejand û got:

– Himm?! Brîndar bûyin? Ciyê berikên top û mîtralyozên wî kafirî di canê me de dibûn wek pelqîk. Piştî rojekê du rojan ji berê xwe ve wînda dibûn. Lê yê dijwar ne top û mîtralyozên wî kafirî bû, serma û seqem bû. A di wî şerî de rehmetiyê Seydayê Mele Yehya yê Ferhendî serma girt, piştî ji şer vedigere gazî jina xwe dike. Dibêje: "Keçê ka were çend hecama bavêje navmilê min." Jina wî ya xafil dibêje: "– Êra li te xêr e, hecamê çi lo? Tu ji malê derneketî, ji ber tifikê neçûyî ber sefikê jî, te di ku de serma girt? Tu ji pesna xeber didî?" Mele Yehya lê îsrar dike. Jinik tê ku hecama lêxe. Çawa destê xwe davêje ku kirasê wî derxe, bi carekê xuşîn bi berikên di navbera kiras û canê wî de dikevin û dirijin erdê. Jinik ku çav bi van berik û çav bi wan pelqîkên li ser canê mêrê xwe dikeve, hew xwe radigire, hema ji nav serê xwe dike qîrîn û dibêje "ber cemala Mihemed pêxember selewat! Keça min lawo were li hikm û kerametên bavê xwe binihêre." Ji ber vê xafilîya jina xwe ku kerametên wî lê aşkere bûn Seydayê Mele Yehya negihîşte serê sibê, çû rehmeta Xwedê."

Ethem jê pirsî:

– Çima qey jina wî nizanibû ku mêrê wê çiyê şerê Qorayê?

Hecî Mihemed Elî lê nihêrî û got:

– Xwedê xêr pê kiro, qey karê qenc û weliyan karê zarûka ye? Tu dinihêrî li vê derê bi canûcesedê xwe li ba te ye, lê ew bi kerametê xwe li koşkî dinyayê li derekî dinê ye; ya gemîkî xerq dibe, wê xelas dike, ya tofan rabiye çiyê destê xwe dide berê, ya agir bi derekê ketiye li hawarê çiyê. Ji qenc û weliyan re ka sekn û sekan heye?

Mele Mehmûd bi wî awayê xwe yê taybetî yê nerm û bawerkir jê pirsî.

– Apê Hecî, gelo ev welî û qencê Xwedê ku hene ma ew jî di ser hev re û di bin hev re dest bi dest in, sinif bi sinif in? Te dî gere meriv ji hikmetê Xwedê xafil nebe. Lê meriv bala xwe didê gava kerametê hinan wek yê Mele Yehya azlû dibin, ew tafilê pê dimirin û yên hin weliyên Xwedê yên wek zarê te -ku tu şik tê tune- azlû dibin, tiştekan bi wan nayê. Ev çawa dibe gelo?

– Lê çawa? Xwedê jê razî! Ehlê keramet gişt ne nola hev in. Hin jê hene; ne ew bi xwe zanin û ne ehlî bi wan dizane, lê îla her Xwedê bi wan dizane. Hin hene; ew xwe bi xwe nizanin, lêbelê ehlê dora wan bi wan dizanin û Xwedê bi wan dizane. Desta sisiya; ew bi xwe bi xwe dizanin, Xwedê bi wan dizane, lê xelk bi wan nizanê. Gava kerametên van hersê sinifan aşkera dibin, tafilê pê dimirin. Vêca destek dîtir heye ku hem ew bi xwe dizanin, hem xelk bi wan dizane û ji xwe Xwedê jî bi wan her dizane. Gava kerametên ehlê vê desta paşiyê aşkere dibin tiştekan bi wan nayê, ji xwe herkes pê dizane.



Mele Mehmûd:

– Dibêm ewê van ên paşî ji merteba herî bilintir bin, ne wisa gelo?

Hecî Mihemed Elî:

– Lê çawa? Xwedê jê razî! Ma şik tê heye?

Mele Mehmûd:

– Ez dibêm tu jî ji van ê han î, ne wisa?

Hecî bi dilxweşî di maneya ”erê wisa ye” de bişirî û got:

– Alimê xeybê her ilelah e.

Mele Mehmûd:

– Maşelah û elhemdûlilah! Lê ez li vê ecêbê şaş dimînim, apê Hecî. Zatên mîna te ku wisa ehlê keramet û marîfet in; gelo hikûmat çima ji bona selihandina karûbarê xwe û yê xelkê wezîfe nade we? Ya gelo pê nizane, çi behs e?

– Çawa? Dibe ku hikûmat pê nizanibe, Xwedê jê razî! Heryek ji wan bi wezîfekê wezîfedar e.

– Meqseda min ev bû ku gelo hikûmata me ka wezîfekê, ez çi bêjim mîna xefiyetî an casûsî da te neda te?

– Lê çawa!

– Ev efendî jî ne xerîb in, hevalên me ne. Tu ji kerema xwe re ji me re behsa wezîfa xwe bikî bira ew jî pê bizanin.

– Mele Mehmûdê min î delal, çend sal berê li Bismilê qeymeqamkî qetrehm î zalim hebû. Hikûmatê ew kiriye qeymeqam û şandiye Bismilê, lê hikûmata reben ji ku derê bizanibe ku di dilê wî de kudikên beraz hene. Merivê şîrê xav vexwarî, ew jî dibêje ’êdî ez bûme qeymeqam, ka di ser min re kî heye! Kî dikare çi ji min bike!’ Li xelkê bi kêfa dilê xwe tehde û neheqî dike. Ji jor de ji min re xeber hat, gotin ”çika here binêre ev çi bela wî ye. Xelk çima jê gazin dikin?” Min hespê xwe derxist, teng û bertenga wî lê şidand, xurcika xwe avêt serpiştê û berê xwe da ber bi Bismilê ve. Ez ketim nav çarşiya Bismilê hê piştî nîvro ye, êdî mamûr ji firavîne dizivirin. Carekê min bala xwe dayê ku Qeymeqamê min û te li ber yekî gundiye ku wî avêtiye erdê; bi dara lê dixê û jê re dibêje ”êşekoxlî êşek! Kerê te çima li nav rê rêx kiriye?”. Di nav destûpiyê vî zalimê Qeymeqam de zarebara vî merivê gundî ye ku rebeno bi tirkî jî nizane da cewaba xwe bide. Bismilî jî ji tîrsa vî zalimî yên ku ketine dikanên xwe, xwe melisandine, yên ku ketine ber rîknên serê koşan û xwe veşartine. Wele ez çûm ber Qeymeqam, çik ji hespê peya bûm û bi qamçiyê xwe bi qeymeqam ketim; ’goliko soro te çi xwariye!’ Gote min ”Ûlan tu zanî ez kî me? Ez qeymeqam im.” Wele min guh nedayê, min ew

li erdê di rêxa kerê de gevizand. Mêrikê gundî rabû li riya xwe çû û ez jî çûm hikûmat qûnaxiyê dayira qeymeqam. Bekçiyê ber deriyê oda qeymeqam gote: "Tu kî yî, çi dixwazî? Qeymeqam efendî hê nehatiye." Min tehnekê lêxist û ketim hundir û çûm li ser masê rûniştim. Qasek tê bihurî Qeymeqamê min û te sergirêdayî hat ket hundir û çav bi min ket, got: "Ûlan tê hem di nav çarşıya Bismil de li min xî, irzê min bişkênî û hem jî werî di oda min de li ser masa min rûnêy? Binêre ezê çi bînim serê te." Min bi hêrs got "parlo!"\* Tafilê xwe da hev. Min gotê" Ji vê deqîqeyê pê de min te ji qeymeqamiyê avêt. Ji niha û pê de tu ne qeymeqam î û ne tiştêkî yî. Siktir be ji ber çavê min here." Xwe avêt ser destûpiyê min, giriya got: "Eman di bextê te û Xwedê de me, ez piçûk im min cahilî kir, tu mezin î efû bike. Tu min bidî xatirê zarûk û zêçê min." Min got: "Kerê kurê wî kerî! Gava te li feqîr û hêsîran tehde fikir xweş bû? Zarûk û zêçên te çima wê gavê nedihatî bîra te? Haydê yelah baqalim!"

Wele çendê wî alî li Diyarbekirê bûm, ji min re hin mîx û hacet lazim bûn. Min got ka serîkî li çarşıya îspahiyê jî xim. Min bala xwe dida xerûper tiştûtebayên li ser erebokan, min dit yek gazî min dike: "Mihemed Elî efendî! Mihemed Elî efendî!" Ez lê zivirîm, min ew nenasî. Min gotê: "Xêr be min tu nenasî, tu kî yî?" Stûyê xwe li alîkî xwar kir û gote min: "Malava çawa te ez nenasîm? Ma nayê bîra te? Di filan salê de ez qeymeqamê Bismilê bûm, te ez jê avêtim. Ji bona rizqê zarû û zêçê xwe niha li ber vî desgehî me û bi van hesin û bizmarê zengarî nîfqê wan derdixim." Ez bişirîm û min gotê: "De bixoro çawan e! Xwedê dabû te, te nizanibû bixwara. Ma tu nizanî ku pêstûrî ji gayê cot re jî namîne?" Got: "Erê weleh Mihemed Elî efendî ez poşman bûm lê êdî ji destê min filitî."

Mele Mehmûd destên xwe di hev de miz dan û bi şîranî gotê:

– Maşelah! Subhan ji wî Xaliqî re! Xwezila çend kesên dîtîr jî wekî te hebûna. Lê wayê çawa biye ku te ji bîr ranekiriye? Bi Xwedê kî apê Hecî bi casûsî masûsî qet neçûyî nav dewletên ecnebî?"

– Lê çawa. Hê zemanê rehmetiyê Menderes bû. Rojek Elahûalem çi roj bû nizamim, hatim malê xatiya we got: "Polêsekî hat malê li te pirsî. Got ku Mihemed Elî efendî çi gav were malê bira esehî nesekine bê Qeymeqam efendî bibîne." Hela! hela! Xwedê xêr ke. Hema ji ber derî zivirîm, çûm qûnaxê, derketim hizûra Qeymeqam, min gotê: "Xêr e? Te ez xwestime?" Qeymeqam efendî rabû piya temena kir, got: "Haşa! Mihemed Elî efendî çi hedê min e. Wele Walî efendî têlêfon kir û got: Ecele Mihemed Elî efendî

bibînin û bêjinê bira were vê. Êdî çî ye çî nîne pê nizanim.” Êh ji xwe karûbarê rîya min kiribûn. Siwar bûm çûm Diyarbekirê. Derketim hizûra Walî efendî, min pate lêxist û got: Kerem ke Walî efendî te xêr ê? Walî efendî rabû temena kir û got: ”Mihemed Elî efendî ez nizanim çî ye, çî behs e, lê başwekîl (serekwezîr) Ednan Menderes têlêfon kir û got ecele li erd be li esman be gere hun Mihemed Elî efendî bibînin û wî bişînin vê derê. Hertîşt hazir e, hema em li hêviya te ne.”

”Min da hişê xwe ku karekî muhîm nîn be Menderes gazî min nake. Serê we neêşînim, ez çûm Enqerê, derketim qûnaxa Menderes, nobedar li ber derî bûn, gotin ”dûr!”\*\* Ez li wan fetilîm û min got: ”parlo!”\* Wele pate lêxistin. Min derî vekir û ketim hundir ku wayê Menderes li odê wek feqiyê ku dersa xwe mutale bike, berûberê odê diçe û tê. Min patekî jê re lêxist. Ku çav bi min ket, kêfa wî hat, beşera wî xweş bû û got: ”Wey Mihemed Elî efendî bi xêr û bi ser çavan re hatî. Misêwa min rêpaniya te dikir.

– ”Êh xêr be Başwekîl efendî, te ez heta vê derê anîm. Hêcrana vê çî ye. Ne bê sebeb e.” Rehmêtî kûr kûr fikirî û li min vegeirî, got: ” Na wele Mihemed Elî efendî ne bê sebeb e. Ji Îngîlistanê pîlanek ji me re lazim e, û ferz î ferz lazim e. Casûsên me yên ku çûn bînin, ya asê bûn nema derkevin ya hatin girtin. Vêca em fikirîn, me got hebe tunebe yê ku bikare me ji vê tengasiyê derxîne bi tenê ewê Mihemed Elî efendî be. Û wele niha em li te tifiqîne.”

”Çî bikim? Biye cil û ketiye mil. Wele rabûm çûm Îngîlistanê, pîlan û tiştinên ku lazim bûn min berhev kirin. Li kuçekî Îngîlistanê digeriyam, bala min pêket ku du meriv li dû min in nêzenêz taqîbata min dikin. Ez sekinîm. Min guh dayê ku yek ji yê dinê re dibêje ”van vîng vonk.” Yanî tu zanî, ev casûsê tirka ye. Wele min jî necamêrî nekir, li wan zivirîm, min jî got ”fîn fan fonk fînk fank?” yanî qey ez nizanim hun jî casûsên Îngîlîz in?” Ew ji pey min vebûn.

– ”Ez zivirîm hatim Tirkiyayê, Enqerê. Çûm qûnaxa Menderes, di derencan de hilkişîm hatim ber derî. Nobedar gotin ”dûr ûlan!” Min got: ”Ûlan bavê we ye, êşekoxlîêşek! Parlo!” Wele tafilê xwe dan hevûdu û pate lêxistin. Ez ketim hundir ku Menderes li ser masaxwe rûniştiye û mitale dike. Çawa çav bi min ket, çirçên eniya wî ketin hev û got: ”Mihemed Elî efendî malava ka tu hê li van dera yî, hê neçûyî?” Min gotê: ”Başwekîlê min ez çûm û hatim.” Wele min rakir ji bin çengê rastê lûlikeke kaxiz, ji bin çengê çepê yeka di, ji milê rastê yek, ji ber milê çepê yeka dîtir , ji ber gora rastê lûlikek,



ji ber gora çepê yeka di, ji navrana şal yekê, ji berikên saqo û şalwar yek bi yek lûlikên kaxiz derxistin, li ser masê li ber Menderes kire lod. Menderes li loda ber xwe û li min nihêrî, lêva xwe hilkir û gote min: "Malava ev çi hal e? Hema te giştî bikira destik û bikira derekê." Min gotê: "Ev karê casûsiyê ye, ne yê başwekîliyê ye. Ne karê zarûka ye, efendî! Bi rê de oxilme moxilme dibin, te dît ku lûlikek qefaltin, qe nebe yê dinê xelas dibin." Menderes serê xwe rast û çep hejand û got: "Welahîne Xwedê sed sal bimana min vê fehmê nedikir. Helal be ku tu bera Mihemed Elî efendî yî." Min gotê: "Baş e, emrê hikûmatê û xizmeta dewletê li ser ser û li ser çavê min. Lê qey timî ewê karê bi vî awayî di stuyê min de bimînin. Ev qeliyan? Ji casûsê dewleta Alî Osman kes nema? Lê sibêroj ku bimirim ewê çawa be?" Rehmetî got: "Qet behs meke. Îro çend roj in ez jî lê difikirim."

– "Qey ne wisa ye? Ka kî vê famê dike?" bi awayê pesindanê Mele Mehmûd got û jê pirsî:

– Gelo qet bi casûsî an wekî dinê, riya te bi nav Ûris neket?"

– Lê çawa! Xwedê jê razî!

– Halê wan çawa bû gelo, miamela wan bi çi awayî bû, tu bi çi karî çûbûy?

– Halê wan? De ka ewê halê wan çawa be? Genim tune, ceh kêm e. Hêsir dar dihêrin, arê daran li nav arvan dixin, dikin peksîmat û dixwin. Ne ji vî awayî be halê wan baş e. Kafir te dî ji hevûdu re bi aqûbet in. Herwisa ji dîne xwe re jî pir şedîd in. Ez hêsir bûm di destê wan de. Di herbê de em dîl ketibûn. Wan ez birim bajarekî, qulikek xanî dan min. Karê min ew bû ku rojê carekê herim qereqolê xwe nîşanî wan dim. Rojekî qomsêr gazî min kir, bi awirekî tûj li min nihêrî û gote min: "Tirko! Çavê xwe baş veke, baş guh bide min. Tu tirk î, bisilman î. Tu yê mîna tirkan li xwe kî û tevbigêrî û wekî bisilmanan limê û taeta xwe bikî. Em qebûl nakin ku tu wek erfûedetê me ûrisan bikî, herî dêrê an dev ji dîne xwe berdî werî ser dîne me. Tu li ser dîne xwe û em li ser dîne xwe."

– Gelo çima nedixwestin ku haşa tu herî ser dîne wan û wek erfûedetê wan bikî?

– Bi fikra wan, hetanî meriv li ser dîn û erfûedetê xwe be, meriv ji wan bi ferqtir e. Meriv bisilman e, li ser dîne xwe ye û ew jî fileh in li ser dîne xwe ne. Meriv û ew tevîhev nabin. Ka pez û gur dikarin tevîhev bibin? Lê gava tu herî ser dîne wan, -ê hestiyê helal heram, yê heram jî helal nabe-, çawa be jî ewê damar bikişîne, tê tiştên wan hîn bibî û bi casûsî neqlî Tirkiyayê bikî. Ew jî vê qebûl nakin.

– Subhanelah çi kafirekî jîr e kur-ro? Tam bi îşê xwe zane. Lê em vê li alîkî bihêlin. Karê dinyayê te dît li dinyayê dimîne. Ji xwe Xwedê xêra te jê hasil dike, înce-ellah. Lê wekî dinê hin tişt hene ku ne bi destê hikûmat û ehli ne. Îla bi destê Xwedê, bi îcaza Xwedê jî bi destê we qenc û weliyên Xwedê diselihin. Herwekî em bêjin wek tofanê, agir û şewatê, lehiyê. Te dî Xwedê haşa bi zat û sifetê xwe nayê yan jî em bêjin ku agir bi derekê ketiye û taxekê, gundekî an bajarekî daye ber xwe, ê Xwedê ezze-we-celle bi xwe nayê destê xwe nade berê. Emir dide qencekî xwe, welîkî xwe, ew weliyê Xwedê bi îzna Xwedê destê xwe dide ber wê qisûmatê û ew disekine. Gelo qet tişteki wisa bi serê te de hat an ne.

Ev pirs li ser mesela binê kundir bû ku Mele Mehmûd jê dipirsî.

– Mele Mehmûdê min, tiştên ji bona Xwedê di riya Xwedê de ne. Çend sal berê baraneke gurr bariya. Du-sê hefte bi şevûroj, bê çav vekirin, mîna devê meşkê misêwa ev bimbarek dibariya. Li kuşa çokek lehî rabûbû, îbadulah nikaribûn ji malê xwe derkevin derva. Êh ji destê evdên xafil jî tişteki nayê, ewê evdê reben çi bikin, çi di destê wan de heyê?

”Şevêk piştî limêja eşayê dereng, xatiya we ket nav ciya û raza. Yê min jî hin mijûlahiyên min hebûn, ez pê bilî bûm. Min ew qedandin, êdî karûbarê nav ciya kir, min nihêrt deriyê me yê derva lêket. Hela! hela!! Vî wextê ha ewê kî be. Şev yek û xerab gelek! Te dî divê meriv hesabê xwe bike. Qotek tîfinga min hebû, min ew ji pîncê dîwêr anî û ez çûm pişt derî, min lê deng kir: ”kuro tu kî yî?” Dengêkî hate min, got ”ez im, derî veke.” Hela! hela! ev kî ye? Te dît qenc hene! xerab hene! meriv nizane. Min dengê xwe piçek bilintir kir: ”Kuro lawo tu kî yî?” Dîsa got: ”Ez im û ez im, derî veke!” Êh şîre-şîra baranê ya Îlahî wisa gurr e ku; meriv dengê nas jî ji hev dernaxe. Ez aciz bûm, wele min sirma tîfingê qelabt û fişekê da berê -te dî meriv nizane qenc hene xerab hene, vê şeva Xwedê vê saeta ha! çi zanim- û min gotê: ”Kuro lawo ez ji te re dibêjim, tu kî yî? Çi kes î?” Deng vêca bilintir bû û got: ”Mihemed Eliyê min lawo tu kor bûyî? Ez im, xerifiyo ez im!” Min derî lê vekir ku himet û bereket her timî hazir be. Xwedê celle-we-celallahû bi zat û sifetê xwe li ber derî ye. Ez kolî dest û piyên wî bûm. Min xwe da alîkî derî, rê dayê ku were hundir û pê re jî min gotê: ”Ya Rebî vê şeva ha li te xêr e? Kerem ke were hundir.” Gote min: ”Mihemed Eliyê min lawo! çi hundir e, çi hal e? Tu nabînî ku îro serê çend şev û çend rojan e ku esman qelişiyê û tê de baran nasekine. Ev kar karê te ye, divê tu herî esman pîne bikî.” Min gotê: ”Ya Rebî! Ez rebenê Xwedê û ev karê ha!” Gote min: ”Na lawo! Îmkana

wî tune ye divê tu bikî.” Min got: ” De ka ez herim şalê xwe li xwe kim, ez tazî me.” Gote min: ”Lawo şalê te li te ye.” Min bala xwe dayê subhanellah bera jî şalê min li min e. Lê ez baş pê dizanim ku ez bi tena derpê û kiras hatibûm. Min gotê: ”Baş e, herim çakûçê û bizmarê xwe bînim.” Gote min: ”Lawo! Tu çi merivekî bêsebir û xafil î. Li berîkên şalê xwe binihêre.” Min berîkên xwe oxilme kirin, di ya rastê de çakûçê min û di ya çepê de jî mîxên zêrîn.” Min got: ”Ez hazir im. Ka ezê çawa herim?” Got: ”Tu çi evdekî min î bêsebir î.” Min ha bala xwe dayê ku erd bilind bû û esman nizim bû, erd bilind bû û esman nizim bû, erd bilind bû û esman nizim bû, erd bilind bû weleh hetanî ku esman hat ber fesala destê min. Min bala xwe dayê ku di nivî de çi qelşekî lêketiye. Min destekî avêt keviya qelşê ya rastê, yekî jî avêt ya çepê û got: ”Ya bi qewet û himeta Xwedê û Resûlê ekrem! Ya Şêx Evdîlqadirê Gêlanî û Şahê Nexşebend!” bi hemî hêz û taqeta xwe min herdû keviyan kişandin ser hev, bizmarê xwe danî ser, bi çakûçê xwe kuta. Piştî ku min ew baş bizmar û asê kir, karê min qediya. Êdî ji berê xwe ve bi hikmeta Rebê jorîn erd nizim bû û esman bilind bû, erd nizim bû û esman bilind bû, erd nizim bû û esman bilind bû, ha min dît ku ez li ber deriyê malê me. Ketim hundir, min derî çengel kir. Çûm odê, xwe şêlihand, lembê zenûn kir û ketim nav ciyan. Xatiya we ji xewê veciniqî û got: ”Wîşş! Meriv dibê qey tu ji nav teyrokê têy, ev çi halê te ye?” Min gotê: ”Herê korê tu bizorê razê! Tê ji ku derê zanibî ku ez ji ku derê têm?”

Hecî Mihemed Eliyê Qelşo, Mihemed Eliyê Qelşo weyaxud tikûtenê Qelşo: Min navûdengê vî camêrî zû de, hê ji zemanê zarûtiya xwe bihîstibû. Lê ji min re mîna yekî efsanewî dihat: Wekî mala zalê, Betal Xazî, Herkul an hin kesên dinê. Min nizanibû ku Mihemed Eliyê Qelşo an Hecî Mihemed Eliyê Qelşo hê jî dijî û yek ji endamê civaka me ya wê rojê ye. Loma gava ku ew bi min dan nasîn wekî ku di xewnekê de bim, wisa şaş mam. Wisa şaş mam ku; heta bi bersîva cara pêşiyê îqna nebûm, du car sê car min ji Fikrî Xoco û Mele Mehmûd pirsî da ev camêr ew Qelşo ye.

Zilamekî bi bejna xwe ne kurt û ne jî dirêj bû. Di seriya şêst salî de bû. Bi canê xwe genimgûniyê girtî bû. Riyekî şînboz î fereh lê hebû. Destên wî fereh û gir bûn; xuya bû destên kar û xebatê ne. Şewqeke ji wanê Dawid Nêrgiz malê Diyarbekirê li serî, saqokî lacîwerdê bi ser xêzên spî yê qaçax û şalwarekî reş lêbû. Karê wî hostatî bû: Hostayê xanî lêkirinê, yê aş danîn û niqarkirinê, yê haletê cot û xeratiyê bû. Hostayên bi vî awayî li gundê xwe timî kar nabînin; seyar in, li ku derê kar hebe çendekî ji mala xwe bi dût

dikevin, li ciyê kar-lê-heyî dixebitin, di pey xelasiya karê xwe de dizivirin mala xwe.

Xêrnexwaz û çavnebar gelek in. Bebextî bi hecîtiya wî de jî anîbûn. Dibêjin ku du sê roj berî hecîkî ji gundê wî ji Hecê bizivire mala xwe, Hecî Mihemed Elî tesadufen li Diyarbekirê, li otêla Çelîk Palasê ye. Qeflekî hecî berî yê gundiye wî ku hatine, ew jî li wê otêlê ne. Hecî Mihemed Elî pirsra wan dike, li halê rêwîtiya wan û yê tengasî û zehmetiyên wan ên li Hecê dike. Di pey de pirsra gundiye xwe yê ku çiyê Hecê dike. Ew jî dibêjin: "Wele elhemdûlîlah ji aliyê sihetê ve baş e, li heyatê ye. Lê tiştê ku heye li ser Girê Erefayê cizdanê wî yê pera jê dizîn. Rebenê Xwedê yê bêçare kir qareqar û hawar. Êdî misilmanên dorhêlê xêra xwe jê re destmal vekirin pere berhev kirin." Ew jî dotira rojê ji Diyarbekirê berê xwe dide malê, tê gundê xwe. Yên selavê lê dikin an pirsra wî dikin, bi wan de dixeyide, dibêje: "Heyla fasiq û zindîqno! Ez ji mala Xwedê, ji Heca şerîf tîm û wek hecîkî hun nayên seredana min." Gundî êdî naçar bawer dikin, diçin seredanê. Ew jî teberikên mîna tizbî, xelex û hwd ku ji Diyarbekirê kiriye û bi xwe re aniyê li wan belav dike. Du-sê roj şûn de, heciyê gundiye wî tê. Gundî diçin seredana wî jî û dibêjin: "Wele elhemdûlîlah wayê tu jî û Hecî Mihemed Elî jî hun bi saxî û bi selameti ve gerîn, ji gundê me îsal du hecî derketin." Heciye dinê dipirse: "Hecî Mihemed Elî kî ye, hun behsa kîjan Mihemed Elî yî dikin?" Jê re dibêjin: "Hecî Mihemed Elî lo! Yanî Mihemed Eliyê Qelşo." Mêrik hêrs dibe, xwe hiltîne li erdê dixê. Dibêje: "Hişk û ji binî derew e. Qelşo nehatiye Hecê." Ev gotina wî tê bi guhê Hecî Mihemed Elî dikeve. Êvarê tam wextê ku gundî li mala heciyê dinê ne, Hecî Mihemed Elî radibe diçe seredana wî. Piştî kêfxweşî dana hev, Hecî Mihemed Elî di nav civatê de dibêje: "Heciye delal! Hec ew e ku meriv diçe mala Xwedê li gunehê xwe poşman dibe, li ber destê Xwedê û pêxember tobe dike ku êdî derew neke, bêbextî neke, heqê xelkê nexwe, neûzû billah tiştê haram neke û heqê camêran jî înkâr neke. Newisa Hecî?" Heciye dinê dibêje: "Belê, sedeq amentû bilah! wisan e." Hecî Mihemed Elî dibêje: "Ku wisa be, herê agir bi malê keto tu çima xwe ji Xwedê dikî û dibêjî? Mihemed Elî derew dike, nehatiye Hecê?" Heciye dinê dibêje: "Ez qet jî xwe ji Xwedê nakim, tu nehatî Hecê û li wan deran jî çavê min bi te neketiye." Hecî Mihemed Elî li wî û gundiyan li civatê dizivire, dibêje:

– Li ser Girê Erefê, serê sibê berî ku birêkevin herin şeytan biricimînin, te ji nava serê xwe nekir qîrîn û negot "hawar e! gidyano hawar e perê min dizîn!" Gundî vediciniqin û Heciye dinê jî li hevûdu soromoro dibe û dibêje:

– Tu ji ku ve zanî?

Gundî şaş dibin li wan dinêrin. Lewra Heciyê dinê ji wan re behsa her tiştî kiriye, lê behsa vî tiştî qet nekiriye ku em bêjin Mihemed Elî ji wan bihîstibe. Hecî Mihemed Elî:

– Êh Hecîko! Em herçî hecacên Silva, Bismil, Hezro û Batmanê me xêra xwe destmal venekir -Xwedao tu ji xêrê dernexî!- û ji te re pere berhev nekir?

Heciyê me yê dinê bêtir şaş dibe û bi awakî şeqizî û berxweketî dipirse:

– Êra tu ji ku zanî û era bi xatirê Xwedê tu ji ku pê dizanî?

Hecî Mihemed Elî bi ser gundiye xwe yê bextreş de diçe:

– Ez hê jî bêjim?

Bersiv ji Hecî û deng jî ji gundiyan dernakeve. Rastî û heqiya çûna Hecî Mihemed Elî ya Hecê ji aliyê ometa Mihemed ve tê pejirandin.

Demek kurt di pey hevdişina me ya wê rojê de ji Silva çûm. Di dawiya tîrmeha 1967 an de zivirîm. Mele Mehmûd êdî li ber dikanê nîn bû. Niha di karekî dîtir de bû. Me hevûdu dît, pirsra hevûdu kir û li hal û ehwalê dinyayê pirsî. Mele Mehmûd ji min re got:

– Lê! Malaminê! Hecî Mihemed Elî wefat kir.

– Kîjan Hecî Mihemed Elî, gidî?

– Hecî Mihemed Eliyê Qelşo.

– Na lo! Çawa? Bi çi awayî?

Mele Mehmûd:

– Di wan rojên nebixêr yê şerê Îsraîl û ereban de bû. Ez li ber Tekelê rastî wî hatim, min pirsra wî kir. Nexweş bû, bêkêf bû. Dinaliya. Min jê re got "Bi Xwedê kî apê Hecî ev cihuyê Îsraîl tovê Îslamê brand, erebên ometa Mihemed qelandin. Gelo hun qenc û welî çima li hawara birayên me yê ereb naçin?" Gote min: "Em çawa naçin? Wele em diçin lê ji destê me hew tê. Şevtira dinê ez bûm, Hezretî Mihemed bû, Hezretî Elî şerê Xwedê bû, Şêx Evdilqadirê Gêlanî bû, Şahê Nexşebend bû; em çûn ku herin li hawara ometê. Megava ji dûrî ve balaxwe didayê; bisilman û kafir ji hevûdu kifş bûn, erê evên ha bisilman û yê dinê cihû ne. Lê gava me êrîş dikir û em diçûn bi ser de hema gişt mîna hev xuyan dikirin. Me serî dibirîn, ji dil xwe ve ku neyarê ometa Mihemed in, cihû ne; piştî ku em ji şer fereh dikişîn û dinihêr malikê tu xera bî ku kuştîyên ji destê me gişt ereb in. Êdî kafir û bisilman tevlîhev bûne, di navberê de ferqekî nemaye. Me kir û nekir heta fecra sibê me tişteki havil nekir û em vegerîn. A tu dibînî ji wê şevê de ye min serma girtiye, wê sermaya pîs a çola Erebestanê ye û bi Xwedê ez dizanim ku



filitandina min jî jê tune.” Min gotê ”Na û devê xwe li xêrê veke, apê Hecî!”  
Gote min ”Na! na! Birîndar bi birîna xwe dizane.”

”Di pey de çendekî derbas bû, rojekê meleyê camiya Tekelê selatan da  
û di pey de wefata wî ragihand. Ez çûm hawariyê. Min li hal û hewalê mirina  
wî pirsî. Ew roja ku ewê tê de bimire, dibejê gazî melê bikin. Gazî melê taxê  
dikin. Rehmetî dibêjê: ”Dest pê ke bi ser min de Yasînê bixwîne.” Mele du  
dewr Yasîn pê de dixwîne. Di dewra sisiya de tê heta nivî, rehmetî jê re dibêje  
”mele bes e!” û pê re ber bi esman dinêre û dibêje” de were! de were emanetê  
xwe bistîne! De haydê were li hêviya çî yî?” û pê re jî çavê xwe li ronahiya  
dinyayê digire. Ev bi xwe gotina maliyên wî ne.”

Ez berdiketim. Mele Mehmûd berdiket. Lê Niyazî hosta bêtir berdiket.  
Ji herkesî bêtir berdiket û digot:

– ”Rehmetî weliyekî xas bû. Bi welîtî û van hikmet û kerametên xwe yên  
ku ji me re digot ji tu weliyekî ku em dinasin kêmtir nîn bû. Lê heyf û  
mixabin ku ne yekî ereb bû. Heyfa wî ku umî bû, bi erebî nexwendibû an  
bi erebî nizanibû. Ku ereb bûna; ewê van serpêhatiyên wî bi erebî binivisandina  
bikirina kitêb û ku hema kitêb bigota: ’Qale Mihemed Elî -qedeselahû  
sirrehul ezîm-’ û van tiştê wî vegotina, we dê bidîta êdî ji xwe re. Heyf! Heyf  
û mixabin!”

Hecîkî hebû. Hecî Mihemed Elîkî hebû. Hecî Mihemed Eliyê Qelşo  
(radiyelahû teala enhû).

---

(\*) *parlo: parola, parole*

(\*\*) *dûr (dur: bi tirkî): raweste, bisekine.*

# CIVATA AZADIYA KURD (KÜRT İSTİKLAL CEMİYETİ)

## 1

### Zinar Soran

**P**îştî ku Mustefa Kemal derbasî Kurdistanê dibe, ew bi dijwarî li dijî tevgera Kurdistanê û komeleyên Kurdan dest bi xebatê dike. Bi taybetî piştî ku "Kuvay-i Milli" (Hêzên Neteweyî) li hemberî Yewnaniyan bi ser dikevin, zilm û zordariya Mustefa Kemal ya li dijî muxalefeta Tirkîyê û herweha li hember komele û pêşengên Kurdan jî gelekî diwartir dibe. Komeleyên Kurdan li hemberî wan êrîşan neçar dimînin ku xebat û çalakiyên xwe rawestînin. Hinek pêşengên Kurdan jî direvin derveyî welêt. Ev jî dide diyar kirin ku tevgera kurdî û pêşengên wê, xwe ji bo dijminatî û berberiyek weha re amade nekiribûn; bê keys û firsend hatibûn girtin.

Gava ji aliyê hinek pêşengên Kurdan bi derengî be jî hate dîtin ku Mustefa Kemal tu mafî nade Kurdan û propogandaya "Biratiya Tirk û Kurdan" tenê ji bo xapandina Kurdan e, dest bi fikirandin û hewldana sazkirina rêxistineke îllegal hate kirin. Di encamê wê hewldanê de, rêxistinek îlegal bi navê "Azadî" hate damezirandin.

Li gor ku Zinar Silopî dinivîsîne; her ku Mustefa Kemal li hemberî dîn û ber bi bêdîniyê ve gav davêt, rewşenbîrên Tirk û Kurdan jî xwe li dora şexsiyetekî bi rûmet, serokê eşîra Cibran Mîralay Xalid Beg dicivandin û di sala 1922- an de, di maneya serxwebûniyê de bi navê "Azadî" rêxistineke îllegal damezirandin. Serbaz û ronakbîrên kurdan yê ku rêxistina Azadî saz kiribûn, ji bo bidestxistina serxwebûna Kurdistanê rêxistinek leşkerî ya ku bikaribe bighêje vê armancê pêwîst didîtin û ji bo pêkanîna vê vatîniyê dixebitîn. Îhsan Nûriyê Bitlîsî, Mulazim Îsmâil Heqqî Şawêş yê Silêmanî,

Xurşîte Hertûşî hinek ji wan serbazên kurd yên ku endamên vê rêxistinê bûn. Îsmail Heqqî Şawêş li ser talîmata navendiya Erziromê, vatiniya ku li hinek derên Kurdistanê rêxistinê pêş ve bibe dide ser milên xwe û tê Diyarbekirê. Bi beşdariya Cemîl Paşazade Qedrî, Cemîl Paşazade Qasim, Dr. Fûat, Av. Mehemed Efendî -Bavê Tûjo- yanî Hecî Extî, Cemîl Paşazade Ekrem û hinek hevalên wan, li Diyarbekirê liqê Azadî tê saz kirin. Peywendiyên nava liqê Diyarbekirê û navenda Erzitomê bi dest û bi riya serokê liqê Darahênê, Teyîb Elî dihate danîn<sup>1</sup>.

Li ser tarîxa damezirandina rêxistina "Azadî"yê û navê wê, dîtînen cihê hene. M. S. Lazarev li ser haziriya vê rêxistine dinivîsîne ku Xalid Beg û serbazên Kurd yên di alaya wî de bûn, di sala 1920-î de dest bi propogandaya serxwebûna Kurdistanê dikin. Ji bo ku li hemberî biryarên "Misakı Milli" (Sûnda Neteweyî) ku erdên Bakurê Kurdistanê jî dixist nava sînorên Tirkîyê, xebatek bi rêxistinî pêk bîne, Xalit Beg serokeşîr û şexên Gimgimê (Varto), Kanî Reşê (Karliova), Melazgirtê, Bulanixê û Xinisê dibîne û bi wan re dighêje encama ku dema rizgarkirina gelê Kurd hatiye. Pêşengên Kurdan di vê baweriyê de bûn, ku ew dê bi propogandaya şiyarkirina neteweyî û serhildanek çekdarî welatê xwe rizgar bikin.. Wan ji aliyekî êşîrên ku hevalbendên wan bûn bi çek dikirin û ji aliyê din jî, ji xelkê daxwaz dikirin ku ew kincên kurdî li xwe bikin, bi kurdî bixwînin û binivîsin. Herweha Xalid Begê Cibranî berhemên nivîskar û siyasetvanên Kurdan yên weke Melle Ehmedê Cizîrî, Ehmedê Xanê û hwd belav dikirin.

Xalit Begê Cibranî di havîna 1920-î de, bi endamên "Kürdistan Teali Cemiyeti" Ebdulqadir û Evdirehîmê Hekkarî re têkiliyan datîne. Ew bi riya wan, têkiliyê bi mebûsê Meclîsa Tirkîyê Yusuf Ziya û hevalbendên wî re jî datîne. Xalid beg, Yusuf Ziya û hevalên wan li ser muraceata Koma Neteweyan û hewldana serxwebûna Kurdistanê li hev dikin<sup>2</sup>.

Li gor ku M. A. Gasararyan dinivîsîne; grûbên Kurdan yên îllegal di Gulana 1923-an de, di pêşengiya "Kürdistan İstiklal Komitesi -Azadî-" de, îmkanên yekitiyê pêk anîn. Ev rêxistin îllegal bû; ji komikên ku ji pênc kesan û bi dizî pêk dihat. Her endamekî di komika rêxistinê de, xwedî navekî rêxistinî û payeyekê bû. Hew kesên di nava komikê de hevdû nas dikirin û tenê yekî ji wan têkilî bi endamekî ji komikek din re datanî<sup>3</sup>.

Martîn Van Bruinessen jî li ser damezirandina Azadî weha dinivîsîne:

"Azadî li Tirkîyê, di sala 1923- an de hatiye damezirandin. Ji rêxistinên berê bi temamî cihê hatibû avakirin. Kadroyên kargêr ne ji esîlzadeyên bajarî (ji derveyî çend kesan pê ve) ji leşkerên xwedîtecrûbe pêk dihatin. Navenda

rêxistinê ne li Stenbolê ya jî Ankarayê bû, li Erziromê bû ku kolordiya 8- an jî li wir bû. Berpirsiyarê navendî, Xalit Beg, di dibistana ku Ebdulhemîdê 2- an ji bo Alayên Hemêdî vekiribû, xwendibû. Ji ber perwerdekirina bajêr dîtibû, li gorî yên din bêtir neteweperwer bû. Yusûf Ziya Beg jî parlementerê Bidlîsê bû. Ji ber vê yekê jî, bê ku bal bikişîne dikarîbû bigeriya û têkilî daniya.

*Rêxistinê haziriyên xwe yên destpêkê, di nava serbazan de meşand. Ji her aliyên Kurdistanê, têkilî bi kesên xwedî nufûz re danî. Ji bo ku di sala 1923- an de hilbijartin di rojevê de bû, Yusûf Ziya bi behana hilbijartinê bi hêsani têkilî datanî”<sup>4</sup>.*

Li gor ku Zinar Silopî û Dr. M. Nurî Dersîmî dinivîsin, ”Azadî” di sala 1922- an de hatiye damezirandin. Di vî warî de û li ser liqên vê rêxistinê Nûrî Dersîmî weha dinivîsîne:

”Bi armanca parastina mafên Kurdan, di sala 1922- an de, di seroktiya Mîralay Xalid Begê Cibranî de û bi beşdariya mebûsê Bidlîsê Yusûf Ziya û gelek serbazên Kurdan, li Erziromê bi navê ”Kürt İstiklal Cemiyeti” partiyek hatibû damezirandin. Armanca serbaz û ronakbîrên Kurdan yên hevalbendiya vê partiyê dikirin, rêxistinek li seranserî Kurdistanê şaxvedayî pêk bînin.

*Li Bidlîsê, Darahênê, Elezîzê, Diyarbekirê, Ruhayê, Sêrtê û li gelek cihên din liqên partiyê hatibûn damezirandin”<sup>5</sup>.*

Li gorî Robert Olson dinivîsîne; endamên ”Kürt Teşkilat-ı İçtimaiye Cemiyeti” di damezirandina ”**Azadî**”yê de, roleke aktîf listine. Navê vê trêxistinê di destpêkê de ”**Civata Azadiya Kurd**” bû. Bi dû re bûye ”**Ciwata Xweseriya Kurd**”. Li gorî raporên serbazên Kurd yên ku di 4-ê Îlona 1924- an de serhildana Beytulşebabê amade kiribûn, Azadî di 1921-ê de hatiye damezirandin. Ew pênc serbazên ku firar kiribûn û agahdari dabûn Îngilîzan, ev bûn: Elî Zekî ibn Welî, Îsmail Heqî Efendî ibn Mehemed Elî (Mûsil), Îhsan Beg ibn Nûrî Beg (Bitdlîs), Tevfîq Efendî ibn Hesên (Mêrdîn) û Ehmed Rasîm Efendî ibn Mikdal (Çan). Ew hemû di Ordiya 7- an, Tumena 2- an û Alaya 8- an de serbaz bûn<sup>7</sup>.

Yek ji wan raporên serbazên Kurdan jî di pirtûka Ahmet Mesut de hatiye weşandin. Di vê raporê de, li ser koka rêxistinê, sedemên vê tevgerê, bîr û baweriyên Kurdan, 33 liqên ”Azadî” û endamên wê yên girîng hatiye rawestandî. Serbazên Kurdan, sedemên vê tevgerê û siyaseta ku dewleta Tirkîyê li hemberî Kurdan meşandiye jî bi 11 xalan diyar kirine:

”1. Qanûneke nû ya ku di derheqê eqeliyetan de û vê gavê ji bo xiristiyanan tê bikaranîn, niyeta hukûmeta Tirkan derdixîne holê ku ew

dixwazin nufûsa Kurdan ya li wîlayetên Rojhilatê bi tevayî buguhêzin Rojavayê Anadolê û koçerên Tirkan û kesên ji nîjada Tirkan di cihên wan de bi cih bikin. Bi vî awayî, navbiriya "Şirîta Turaniyê" ya ku di nava Derya Sipî û Qafqas û Turkîstanê de ji holê bê rakirin.

Li gor kesên ku agahdariyê didin, weke destpêka vî planî, gelek ronakbîrên Kurdan ji niha de ji Rojhilata Anadoliyê hatine rakirin û koçerên Tirkan di cihên wan de hatine bi cih kirin.

2. Bi rakirina Xelîfetiye ji aliyê hukûmeta Tirkan ve ku ev yek ji wan çend peywendiyên di navbêna Tirk û Kurdan de mabûn, ji holê hate rakirin.

3. Di dadgeh û dibistanan de, ziman tenê bi tirkî sînorkirin û di dibistanan de qedexekirina zimanê kurdî. Ev tedbîrên ku li gorî dilê Tirkan, dihatin wê maneyê ku di pratîkê de êdî di nava Kurdan de hînkirin bi tevayî ji holê radibû.

Tirkan medresên olî yên Kurdan jî girtin ku ew ji bo Kurdan avayiyên dawî yên hînkirinê bûn. Teva van hemû gavavêtinên zordarî, li her derê Kurdistanê baca hînkirinê jî tê stendin.

4. Bêjeya "Kurdistan"ê ji hemû pirtûkên hînkirinê hatiye derxistin û li seranserî welêt navên cografîk yên kurdî hêdî- hêdî bi navê tirkî tên guherandin.

5. Memûrên payebilind weke walî û muteserrifan yên Kurdistana Tirkîyê, bê îstisna hemû Tirk in; qaymeqam nêzî nîvî Tirk in û nîvî Kurd in. Her çiqasî piraniya memûrên piçûk Kurd in jî, Tirk di hîlbijartina wan de û bi taybetî ji bo kesên ku bêhna welatparêziya Kurd ji wan tê negrin kar, pir bi diqqat in.

Kurd di vê baweriyê de ne ku Kurdistana Tirkîyê wîlayetên Erziromê, Erzîncanê, Bitdlîsê, Wanê, Diyarbekirê û Xarpêtê digre nav xwe, her weha wîlayeta Hekkariyê divê têkeve ser.

6. Teva ku bac salê ji carekê bêtir tê xwestin jî, tu feydeya bacên ku tên dayin, nayê dîtin. Bê bertil û ruşwetê, di dadgehan de edalet bi tu awayî pêk nayê.

7. Di hîlbijartina mebûsên ku ji bo Meclîsa Neteweyî ya Tirk de, hukûmet destdirêjiyê dike. Mebûs ne bi îradeyek azad ya gel, bi femandariya hukûmeta Tirk tên "hîlbijartin".

8. Ji bo ku yekitiya neteweyî û hêza berxwedana li hemberî kiryarên hukûmetê pêk neyê, hukûmet siyaseta ku her gav eşîrên Kurdan bera hevdû de, dimeşîne.

9. Ji bo xwestina bacê û alîkariyê, leşker digrin ser gundên Kurdan,

heywanên wan talan dikin û bertîlê ji wan distînin.

10. Di sicîl û dosyayên leşkerî yên Kurdan de, suîstimalî tê kirin û ji bo karên pîs û xerab Kurd tèn hîlbijartin.

11. Hukûmeta Tirk bi alîkariya rastmalê Almanan, hewl dide ku dewlemendiya xwezayî ya Kurdan talan bike<sup>77</sup>.

Di vê rapora ku ji îngilîzan re hatiye pêşkêş kirin de, liqên rêxistina Azadî, endam û berpirsiyarên wê yên girîng jî weha hatine nivîsandin:

### **Erzirom** (navenda wê)

Mîralay Xalid Beg (*Serokê rêxistinê; Qumandarê berê yê garnîzona Erziromê; niha li Qersê tucar e*)

Qaymeqam Selîm Beg

Qaymeqam Kazim Begê Piçûk

Mîralay Raxip Begê Piçûk

Hecî Mewlûd ya jî Hecî Dûrsun Efendî (*Ji giregirên Erziromê*)

Qaymeqam Arif Beg (*Vê gavê qaymeqamê Xinisê ye*)

Ebdulxuda Cafer Beg

Arslan Beg (*Ev herdu birayên hev in*)

### **Stenbol**

Seyid Ebdulqadir Efendî (*Serokê Liqê*)

Ebdurehim (*Awukat*)

### **Kars**

Yuzbaşı Tewfîq Efendî (*Serokê Liqê*)

Bayezîd

Şêx Îbrahîm (*Serokê Liqê*)

### **Eleşgirt**

(*Di belgeya orjînal de, nav nehatiye nivîsandin*)

### **Melazgirt**

Kor Husên Paşa, ji eşîra Heyderan, (*Serokê Liqê*)

### **Varto**

Xalid Beg (*Serokê Liqê; divê bi serokê Cemiyetê ve tev li hev nebe; serokê Kurdên Hesenan, Mîralayê eşîrekê*)

### **Xinis**

Ruştu Efendî (*Serokê Liqê*)

Yuzbaşı Raşîd Efendî

### **Mûş**

*(Di belgeya orjînal de nav nehatiye nivîsandin)*

### **Bidlîs**

Yuzbaşı Ziya Beg *(Mebûsê berê; Serokê Liqê)*

Bînbaşı Hecî Hesen Beg

Evdurehman Axa *(Şirnex; niha li Sêrtê girtî ye)*

Hecî Dûrsun Axa *(Mûş)*

### **Wan**

Mele Ebdulmecîd Efendî *(Birê Mele Seîdê Kurdî; Serokê Liqê)*

Sadûn Beg *(Karabîsar; serokê eşîrên Hesenan)*

Bînbaşı Arif Beg *(Şemsekî; Serokê eşîra Şemsekiya)*

Elî Beg *(Birayê Arif Beg)*

NOT: Kesên ku agahdarî dane bîhîstine ku Mele Seîdê Kurdî yê bi nav û deng, di rojên destpêka Îlonê de, ji bo ku di ser Bidlîsê re were Wanê, ji Stenbolê derketiye.

### **Sêrt**

Yuzbaşı Îhsan Beg *(Serokê Liqê)*

Hecî Ebdullah Efendî *(Tucar)*

Derwêş Beg *(Mufetişê Gumrugê)*

Qaymeqam Rezzaq Beg *(Vê gavê qaymeqamê Bîlecîkê ye; hukûmetê ew şandiye Anadolîyê)*

Mîralay Weyis Beg *(Teqawid)*

### **Şirnex**

Suleyman Axa *(Serokê Liqê; ji eşîra Hecî Beyra)*

### **Cizîrê**

Hecî Dûrsun Efendî

Ebdulwehab Efendî

Ebdulmutalîb Efendî *(Mudûrê nehiya Silopî)*

### **Diyarbekir**

Cemîl Paşazade Ekrem Beg *(Serokê Liqê)*

Doktor Fûat Beg

Ebdulxenî Beg

Doktor Nafiz Beg  
Bînbaşi Mustefa Beg  
Qaymeqam Adem Beg (*Boluga siwarî ya yekem; ji Diyarbekirê; weke neteweperwerekî bi rûmet tê nas kirin*)

### **Mêrdîn**

Hecî Xidir Efendî

Qaymeqamê Dêrsimê Qadir Beg (*Ji Mêrdînê şandin Dêrsimê*)

### **Ezirgan**

(*Di belgeya orjînal de nav nehatiye nivîsandin*)

### **Xarpêt**

(*Di belgeya orjînal de nav nehatiye nivîsandin*)

### **Dêrsim**

Kangorzade Elî Heyder (*Serokê Liqê*)<sup>8</sup>

Îsmail Heqqî yek ji wan serbazên kurdên ku beşdarî hewildana serîhildana Beytulşebabê bûbû. Raporek wî ya li ser serîhildana Şêx Seîd, di kovara "Troşak"ê de hatiye weşandin. Her çiqas, hinek agahdariyên ku ew dide dibe ku ji rewşa objektîf bêtir hatibe mezin kirin jî; ji bo kesekî rasterast di nava wan bûyeran de bû, hêjaye ku mirov li ser agahdariyên ku ew dide rawese. Ew di vê rapora xwe de, li ser damezirandina "Azadî"yê weha dinivîsîne:

"Neteweyê Kurd ku hergav di bin êrîşên Tirkîyan siyaseta wan ya qirkerî de dinaliya, li dora pêşengên xwe civiyan. Daxwazkirina doza gelê Kurd û bidestxistina vê vatiniyê, bi yekdengî dan serokê eşîra Cibran Xalid Beg. Xalid Beg, cara yekem di çiriya pêşîna 1920-ê de, bi awakî dizî û navendiya wê li Erziromê, Komîteya Azadiya Kurdistanê damezirand. Komîteyê, armanca rizgarkirna ji bin destên Tirkîyan û bidestxistina serxwebûnê dabû pêşîya xwe.

Komîteyê di nava çend mehan de li gelek bajaran liqên xwe damezirand û li her derê Kurdistanê belav bû. Bi Dêrsimîyan re têkilî danî. Karên komîteyê yê destpêkê bû weşandina weşanên kurdî. Bi vî awayî gelek pirtûkên kurdî hate weşandin û dest bi hevdana edebiyata bi devkî kir. Komîteyê têkilî ne hew bi serokên eşîran, her weha bi şêx û meleyan û bi taybetî bi xwendekarên Kurd yên di dibistanên Tirkîyan de, bi serbazên Kurd yên di ordiya Tirkîyan de û bi memûrên Kurd yên ku di daîrên dewletê de bûn



re jî, danî.

Beşê danûstendinê yê Komîteya Kurdan gelekî xurt û bi rêk û pêk bû. Komîteyê, biryarek ku li Ankarayê û li dijî hebûna neteweyê Kurd dihate girtin, berî ku têkeve pratîkê dibîhîst, digîhand kesên pêwîst û bala wan dihate kişandin. Di vî warî de, fedakarî û canbêzariya xwendekar, serbaz û memûrên Kurdan hêjayê pesindan û hurmetê ye. Di tevgera rizgarîxwaziyê de, ulemayên Kurdan fedakerî, sirgirtina bi zanebûn û sêdaqetiyek mezin nîşan dan.

*Hemû armanca xebatên neteweyî yên komîteyê ev bû ku nîşanî Kurdan bide ku ew kultura xwe ji bîr nekin, siyaseta Tirkan ya "Xwîn û Hesin" raxînin ber çavan û bi çî bihayê dibe bila bibe, divê Kurd ji bin nîrê Tirkan rizgar bibin û Kurdistanek serbixwe damezirînin*"<sup>9</sup>.

Garo Sasunî jî, li ser hinek berpirsiyar û damezirandina "Azadî" yê weha dinivîsîne:

*"Gava Kurdan dît in û têgihîşt in ku êdî ew li hemberî dewleta nû ya Tirkan tenê man in, Îslambûyîna wan, ew alîkariyên ku berê ji Tirkan re kiribûn nayên ber çavan û bi ser de jî tehlûkeya "Tirk" hew berê xwe dide wan; di çiriya paşîna 1920-î de, di berpirsiyartiya serokê eşîra Cibran Mîralay Xalid, Mebûsê Bidlîsê Elî Riza, Kemal Fewzî Beg û Şêx Saîdê Neqşîbendî yê navdar de hewl dan ku rêxistinek hundurî damezirînin. Vê rêxistinê di nava neteweyê Kurd de hêdî hêdî şax veda û di nava xebata çend mehan de, weke organîzasyoneke mukemmel, tevayîya Kurdistanê himbêz kir"*<sup>10</sup>.

Di vê derê de, weha diyar e ku Garo Sasunî navê mebûsê Bidlîsê Yusûf Ziya û birayê wî Elî Riza tev li hev kiriye. Elî Riza birayê Yusûf Ziya bû û yek ji wan serbazên Kurd bû ku di hewldana serîhildana Beytulşebabê de cî girtibû.

Li ser berpirsiyartiya Kemal Fewzî jî yekfikirî tune ye û nêrînên cihê hene. Gava Profesor M. A. Hasratyan behsa amadekirin û birêvebirina serîhildana Şêx Seîd dike, weha dinivîsîne:

*"Beriya her tiştî, weke ku me li jor jî dît, yên ku serîhildan amade kiribûn ne şêx bûn; di serî de Mîralay Xalid Begê Cibranî, rojnamevan Kemal Fewzî, Dr. Fûat, kesên din yên giregirên Kurdan bûn; di pêşengiya rewşenbîrên Kurdan Komîteya Azadî bû"*<sup>11</sup>.

Malmîsanij di derheqê endametiya Kemal Fewzî de, zêde ne emîn e. Li gorî wî, teva ku di hinek çavkaniyan de tê diyar kirin ku Kemal Fewzî endamê "Kürt İstiklal Cemiyeti" bû jî, mirov di vî warî de nikare bigihêje hukmekî misoger<sup>12</sup>.

Ji îfadeya Kemal Fewzî ya "Dadgeha Îstiqlalê" tê zanîn ku ew pênc-şeş mehan li cem Simko maye. Her weha em dizanin ku di wê demê de têkiliyên serokê "Azadî"yê Xalid Begê Cibranî û Simko bi hevdu re hebûn. Mebûsê Gencê Hamdî Beg di 17-ê hezîrana 1924-an de bi telgrafekê, têkiliyên Xalid Beg û Simko îxbar dike. Ew di vê telgrafê de weha dinivîsîne:

*"Serokeşîr Xalid Begê Vartoyî ku li Erziromê ye, bi mebûsê Erziromê Suleyman Necatî Beg û hevalên wî re li hev kirine. Ew, bi Simkoyê Kurd yê ku ji bo xizmetkirina armancên xerab yê Îngilîzan li sînorê Wanê serî hildaye û weke mirovekî tarî tê naskirin re, ji bo serxwebûnê li Bidlîsê, Mûşê, Gencê û derdora wan, bi dizî danûstendinê dikin"*<sup>13</sup>.

Li ser têkiliyên Xalid Begê Cibran û Simko, Ehmed Teqî jî agahdariyek girîng dide. Gava ku ew behsa nameya Xalid Beg ya ku ji Simko re şandibû dike, weha dinivîsîne:

"Di dawiyê de Xalid Beg weha kerem kir: Ji bo ku tu vê name û şîfreyê bi dizî bighînê Îsmail Axayê Simko, ez van gotinan dibêjim. Ev kar jî, hew dikare bi riya te pêk bê. Ji ber ku baweriya Tirkan bi te heye. Ji Îsmail Axa re bibêje ku bila ew jî li aliyê xwe hevkarîyê bêtir bike û hewl bide ku têkiliyê bi Rûsan re deyne. Belkî ew alîkariya me bikin.

Min name û şîfre girtin, xatir xwast û dû re ez hatim Sariqamîşê. Ji wir, ji bo ku ez herim cem Îsmail Axa, bi dû re jî mazbataya mebûsiyê bigrim, ber bi aliyê başûr ez hatim Wanê.

Îsmîl Axa, li gundekî nêzikî Îranê, yê bi navê Başqaleyê ku berê yê Ermeniyên bû, dima. Gava ku ez çûm cem wî, Reşîd Cewdet jî li wir bû.

Min hemû gotinên ku Xalid Beg gotibûn pêşkêş kirin, name û şîfre dan wî.

*Îsmail Axa ji min re pir sipas kir. Reşîd Cewdet jî got ku bi rastî Kak Ehmed layiqê pesindanê ye"*<sup>14</sup>.

Yek ji wan kesên ku li ser "Azadî"yê û tevgera wê nivîsandiyê jî M. Şerîf Fîrat e. Teva ku wî bi bîrûbaweriyek Kemalîst nivîsandiyê jî, mirov dikare ji hinek agahdariyên wî îstifade bike. Li gor ku ew dinivîsîne; di havîna 1920-î de li Stenbolê Xalid Begê Cibranî û serokê "Kürdistan Teali Cemiyeti" Seyîd Ebdulqadir û Evdirehîmê Hekarî li hev dikin. Bi riya wan, mebûsê Bidlîsê Yusûf Ziya û hevalên wî dibîne û biryar didin ku ji Koma Neteweyan doza mafên xwe yê neteweyî bikin.

Xalid Beg ji axa, mele û muxtarên gundan nivîsên mohrkirî distîne û wan ji "Kürdistan Teali Cemiyeti" re dişîne ku bi destên Nemrûd Mustefa û Şerîf Paşayê Kurd bighêje Koma Neteweyan.

Piştî ku Xalid Begê Cibranî dişînin Erziromê, ew bi dizî li her alî dest bi haziriya serhildanê dike. Xalid Beg bi çend serbazên ku ji Kerkûk û Silêmaniyê bûn û li kolordiya Erziromê diman, li hev dikin û di sala 1921-ê de têkiliyan bi "Kürdistan Teali Cemiyeti" û Yusûf Ziya re germtir dikin. Yusûf Ziya ji ber vê muxalefetê, ji Meclîsê tê avêtin. Ew bi muxalefeta Mustafa Kemal yê li Ankarê û Stenbolê re têkiliyan datîne; nerînên wan û daxuyaniya "Kürdistan Teali Cemiyeti" ji Xalid Begê Cibranî re dişîne Erziromê. Xalid Beg wan di ber çavan re derbas dike; nerînên xwe yê di wî warî de dixê ser û ji gelek şêx, axa, mele û giregirên Kurdan re dişîne.

Xalid Begê Cibranî û Şêx Seîd, di Bihara 1922-an de, li Erziromê bi rojan li ser tevger û serhildanê dipeyivin. Di bihara 1924-an de jî, mebûsê berê yê Bidlîsê Yusûf Ziya di ser riya Stenbol-Ankarayê re tê Erziromê û hefteyekê dibê mêvanê Xalid Beg. Li wê derê, ew dighêjin vê baweriyê ku divê eşîr bê biçekkirin û amade kirin; bi riya Simko û Şêx Mehmûdê Berzencî alîkariya Îngilîzan bê temînkirin; biryarnameyên xelkê di ser Sûriyê re ji Koma Neteweyan re bînin şandin û bi dû re ji aliyê Şêx Seîd riya serhildanê bê vekirin.

Yusûf Ziya bi vê biryarê û nameya Xalid Beg dihere Xinisê, gundê Qolhîsarê, mala Şêx Seîd. Şêx Seîd jî vê biryara wan îmze dike. Yusûf Ziya nameyeke Şêx Seîd jî digre û dihere cem gelek serokeşîr, mele û giregirên Kurdan yê Gökso, Tekman, Gököğlan, Kanî Reşê û Vartoyê. Yusûf Ziya biryar û îmzeyên Şêx Seîd û Xalid Begê Cibranî nîşanî wan dide û li ser rewşê agahdariyê dide wan<sup>15</sup>.

Di payiza 1924-an de, Yusûf Ziya vedigere Stenbolê û li wê derê endamên "Terakkîperver Cumhuriyet Fırkası" û hinek muxalifên din yê Mustafa Kemal dibîne<sup>16</sup>.

(Dumahîk heye)

### **Têbinî û çavkanî:**

1. Zinar Silopî, Doza Kurdistan, Öz-Ge Yayınları, Ankara 1991, r. 85- 86.
2. M. S. Lazarev, Yeni ve Yakın Çağda Kürt Hareketleri, Weşanên Jîna Nû, Swêd, Îlon 1991, r. 131.
3. Yê ku ji Metin Toker, Şeyh Said ve İsyan, Akis Yayınları, Ankara, 1968, r.

165 neqil dike: M. A. Gasaratyan, Yeni ve Yakın Çağda Kürt Hareketleri, Weşanên Jîna Nû, r. 165.

4. Martin van Bruinessen, Ağa, Şeyh ve Devlet, Öz-Ge Yayınları, Ankara, r. 348- 349.

5. Dr. Vet. M. Nuri Dersimi, Kürdistan Tarihinde Dersim, Ani matbaası, Helep- 1952, r. 173.

Li gorî Zinar Silopî, "Azadî" di sala 1922- an de hatiye damezirandin. Binere: Zinar Silopî, berhema navê wê derbasdibe (b.n.d.) r. 85.

6. Robert Olson, Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı, Öz-Ge Yayınları, Ankara, çirya paşîn 1991, r. 72.

7. Ahmet Mesut, İngiliz Belgelerinde Kurdistan 1918- 1958, Doz Yayınları, İstanbul, gulan 1992, r. 143- 144.

8. Ahmet Mesut, b.n.d, r. 147- 148.

9. Yê ku ji Troşak, Çeleya Pêşîn ya 1925, hejmar: 6 -248- û çirya paşîn 1926, hejmar: 1-249- neqil dike: Garo Sasuni, Kürt Ulusal Hareketleri ve Ermeni- Kürt İlişkileri (15. yy'dan Günümüze), Weşanên Orfeus, Stockholm, 1986, r.171.

10. Garo Sasuni, Kürt Ulusal Hareketleri ve Ermeni- Kürt İlişkileri (15. yy'dan Günümüze), Weşanên Orfeus, Stockholm - 1986, r.170- 171.

11. Prof. M. A. Hasreryan, Dr. K. M. Ahmad, M. Ciwan, 1925 Kürt Ayaklanması - Şêx Said Hareketi- Jîna Nû Yayınları, Uppsala, adar 1985, r. 31.

Li gorî Uğur Mumcu; Seyid Ebdulqadir, Kemal Fewzî, Qedrî Cemîl Paşa, Qasim Cemîl Paşa, Dr. Fûat, Av. Mehmet (Hecî Extî, Teyîb, Yûsuf Ziya û serokê eşîra Hesenan Xalid Begê Hesênî jî endamên vê rêxistinê bûn. Binere: Uğur Mumcu, Kürt- İslam Ayaklanması, Tekin Yayınları, Ankara, 1991, r. 56.

12. Malmîsanij, Bitlisli Kemal Fevzi ve Kürt Örgütleri içindeki Yeri, Stockholm, çeleya paşîna 1993, r. 49.

13. Yê ku neqil dike: Uğur Mumcu, b.n.d, r. 65.

14. Yê ku ji Xabatî Gelî Kurd Lê Yaddaştekanî Ehmed Teqî da, r. 79- 80 neqil dike: Malmîsanij, b.n.d, r. 49.

15. M. Şerif Fırat, Doğu İlleri ve Varto Tarihi, çapa pêncan, Türk Kültürü Araştırma Enstitüsü Yayınları, Ankara, 1983, r.156- 166.

16. Yê ku ji A. M. Hamilton, Road Through Kurdistan, London 1927, r. 295- 296 neqil dike: Prof. M. A. Hasreryan, 1925 Kürt Ayaklanması - Şeyh Sait Hareketi, r. 8.

Ji bo vê behsê binere: Dr. Vet. Nuri Dersimi, b.n.d, r. 174.

Rismên însanan ji aliyên me  
**ÎBOYÊ DÎNAMÊT**

**Nedim Dağdeviren**

**W**ê çaxê navê me herdûyan jî yek bû: "Êşşek oxlî". Di her talîmê de yên ku "rehet-hazirol" û "sax-sol" nedizanîn em bûn. Yên ku bi Tirkî nedizanîn jî dîsa em bûn...

Qêrîn bi qomitan diket:

"Rahaaatt!"

Pê re jî rehên stûyê wî wek qalindîya pêçîkekê radibûn. Gava dengê wî di hate me, ne di destê me de bû ku em veneciniqiyana û me xwe serrast nekira. Di qûmanda "rehet"ê de ku yek ji me di "hazirol"ê de dima, hêrs dihatê, pêşî li min, pişt re jî li Sido dikire qêrîn:

"Êşşek oxlî êşşekler, rahaaatt!"

Di dû re jî bi goştê canê me diket. Pat û kut, hirm û girm li me dixist. Heyanî ku ez hînî "rehet-hazirol"ê bûm, ruyê min û devê min ji ber kotekan pûç bûbûn.

Bes min dikir û nedikir ez hînî "sax-sol"ê nedibûm. Erê ez dizanim "çep" kîjan alî ye, "rast" kîjan alî. Lê de werin gava ku qêrîn bi qomitanê bêbav diket, ji min re bibêjin ku çawa dest û lingên min li hev dipiçikîn. Her tişt ji bîra min diçû, ez qasekî mit û mat dimam. Wextê qomitan digot "bizivire!", ez dizivîrîm, lê ez nizanim bi kîjan alî ve...

Rojekê piştî talîmê, qomitan ban min kir: "Qûyrûqlûû!"

Min vî navê xwe yê hanê jî nas dikir, "qûyrûqlû" ez bûm. Û min dest pêkir: "Elî oxlî Zîzê' den olme, 1949 Cizîr doximlî, îkincî bêlûk, bîrincî tabûr erlerinden Remezan Çelik..."

Min ji alîkî ve kunya xwe dixwend, ji alîkî ve jî berbi qomitan dimeşiyam. Bi qasî du gavan hatim ber wî, sekinîm, min xwendina kunya xwe qedand, paniyên postalên xwe li hevûdinê xistin û ji qirika tijî got:

"Emrê qomitanim!"

Te digot qey guhê wî qet ne li min bû. Destên xwe danî ser qûna xwe û xwe pik kir:

"Rahaaatt!"

Êdî min bi vê dizanî.

"Haziroot!"

Ez hînî vê jî bûbûm.

Lê qomitan tenê bi van nema. Îcar jî dest pê kir:

"Saaaa dönn!"

Û ez zivirîm. Lê ew nesekinî, dîsa û dîsa got... Ew dibêje, ez dizivirim, ew dibêje, ez dizivirim.

"Saaaa dönn!"

Bizivire ha bizivire... Wî tim digot "saa, saa, saa !!!"

"Saa" çi bû gelo? Çep-bû an rast? Tiştên min zanibû jî êdî min ji bîr ve kiribû. Hema ez dizivirîm... Esker, avahî, roj, dunya hemû bi min re dizivirîn, êdî. Ji vir pêve tu tişt nedihat bîra min. Dibêjin, ez gêj bûme. Qomitan ez dame sekinandinê, pişt re kulmeke wisa li min daye ku qasekî min nikaribiyê rabim ser piyan...

Piştî ku ez rabûme min gotiye "Qomitan tu yî erê?" "Te kerbavî, te kûçikbavî" û min lêxistiye... De lêxe, lêxe, lêxe bavo... lêxe... û min lêxistiye hetanî esker hatine wî teresbavî ji nav lepên min xelas kirine.

Qomitan birine nexweşxanê, di pey feleqe û kotekên giran re ez jî çûm hepsê.

Bi awakî din bûna ezê tu carî hînî Tirkî nebûma. Ez sê mehan di hepsê de mam û min li vir hevalne baş nas kirin. Wan hevalan ez hînî Tirkî kirim. Yek ji wan, ji hêla me bû. Ji Wanê. Navê wî Îbo bû. Em bi hev re ji hepsê derketin û sirgûnî bêlûkekê bûn.

Wextê em çûn bêlûka nû, hemû çawîş-onbaşî ji me ditirsyan. Wan jî lédanxwarina çawîş bihîstibûn. Ji ber vê yekê bela xwe êdî di me nedidan.

Li bêlûka nû, me Kurdên din jî nas kirin. Yek Şêxmûs, ji Diyarbekirê, yê din jî ji Polatliyê bû. Navê wî Xelîl bû. Kurmanciya me di hinek gotinan de bi ser hev ve nedîç. Lê dîsa jî me ji hevûdin fahm dikir. Gotinên ku wî fahm nedikir ji me dipirsî û dixwest wan gotinan hîn bibe.

Ez berê hinekî şaş bûbûm: "Polatli li ba Anqerê ye, ma Kurd li wir jî hene?" Hingê çû hevaltiya me bi Xelîl e xurt bû. Lê, yê din, Şêxmûs ne wek me bû. Ew li Stembolê bi cî bûbû. Zimanê wî, şiklê rabûn û rûniştina wî ji me re ne xweş dihat. Me jê hez nedikir.

Qumandarê bêlûkê "yuzbaşî" bû. Seyekî wî hebû û her gav pê re bû. Her tim wextê em kom dibûn û qûmandar dipeyivî, seyê wî dihat nav me, xwe di me dida, dikir girr-girrr û carna jî xwe diavêt ser me. Ma kê dikaribû ji seyê qûmandar re tişteke bigota?

Rojekê dîsa em civiyabûn, qûmandar hat û dest bi peyvê kir; û lê dirêj kir:

"... ku Ataturkê ezîz nebûya, me ne azadiya xwe û ne jî îstîqlala xwe..."

Ji nişka ve dengê ji nav eskeran peyva qumandar birrî...

-Hooşt, hoşşt, min di xwediyê te..."

Min, pêre pêre ew deng nas kir. Ew dengê Îboyê me bû. Min di dilê xwe de got "Heywaxx, yuzbaşî dê wî bikuje" Yuzbaşî li alî deng zivirî û got:

-Kîm ûlan o eşşoxleşşek (Ew kurê kerê kî ye)?"

Îbo ji ciyê xwe dengê xwe bilind kir: "Hecî oxlî, Asê'den olme 1949 Wan doximlî... erlerinden Îbrahîm Çelîk." Qûmandar bang wî kir: "Gel bûraya (Were vir)!"

Îbo bi lez meşîya hat li ber qûmandar li selamê sekinî.

-"Nê dedîn ûlan (Te çi got kuro)?"

-"Qûmandarê min, Çîko (navê seyê qûmandar Çîko bû) bi min girt, min got hoşt da ku min berde."

-"Ku Çîko bi te girtibe, ev ji bo te şeref e, şeref... Te fahm kir? Wexta yê wêkî we li hemberî hikûmeta me û cimhûrîyetê radibûn û şerr dikirin, seyên me yê milliyetperest ji cepheyekê ta'lîmat dibirin cepheya dinê. Şopên dijmin diajotin." Zivirî ser çawîş:

-"Panzde roj hepsa çadirê."

Û vegerya ser Îbo: "Here şûna xwe kurê kerê!"

Piştî talîmê Îbo birin disîplînê. Heta panzde rojan me hevûdu nedît. Roja derketina Îbo bû. Piştî lihevpirsînê, ez, Îbo û Şêxmûs, em rûniştibûn. Îbo got: "Ez panzde rojan tim fikirîm, min xistiye serê xwe ezê Çîko bikujim!"

Berê me got qey Îbo dixwaze henekê xwe bi me bike. Dibe ku ji ber hêrsa ku panzde rojan di çadirê de heps raza bû. Di pey re me fahm kir ku Îbo bi rastî dixwaze vê yekê pêk bîne. Dûr û dirêj pîlanên xwe ji me re got. Me jî ya xwe jê re got: "Îbo dev jê berde, ew heywanekî bê sûc û bê guneh e, doza çi li seyî dikî?"

Lê Îbo li ser ya xwe ma: "Na, ezê vî seyê ezîzê cimhûrîyetê bikujim".

Piştî wê rojê, her gav me Îbo didît ku ji nav bermayiyên qerwaneyê hestiyar dide hev. Van hestiyar dibir dida Çîko. Êdî di talîma de Çîko ji Îbo venediqetia.

Rojekê yuzbaşî gazî Îbo kiribû û jê re gotibû: "Aferîn, aferîn, dinêrim navbera te û Çîko gelek baş e. Hepsa çadirê li te hatiye, aferîn, aferîn..."

Îbo piştî van gotinên yuzbaşî ji me re neqil kir, domand: "Belê, belê heps li min hat, ewê li Çîko jî were..."

Teşqela hazirîyên cejna Cimhûrîyetê ji mehekê zêdetir ajot. Ji ber berevkirina qûnikên cixaran, qirş û qalên dinê yên li dora bêlûkê û boyaxkirin û paqijkirina hundur û derva, di kesî de hal nemabû.

Serê siba cejnê, zû, me paqijîya xwe ya dawîn kir, çekên xwe yên meşê li xwe kirin. Her der dîçirîsî. Ji bo "toren"ê borîya civînê lêxist. Em giş li meydanê kom bûn. Tabûr li meydanê gihîştibû hev û li benda "Alay Qûmandarî" bûn. Bi qêrîna "hazirool" a yuzbaşî re, hê me xwe di haziroolê de girtibû ku ji dûr ve 'ewtîn bi Çîko ket. Hingî çû dengê Çîko nêz dibû. Çîko berbi alî me ve wisa bi lez dibêziya û pê re jî bi dengêkî wisa dikir kastînî ku me hemûyan his kir ku ewê tişteq biqewime.

Di wê gavê de çima cîba Alay-Qûmandarî ji meydanê xuyanî nekir!

Hele-kel bi yuzbaşî ket... Xwe jidand ji bo pêrginiya qûmandarê xwe. Di wê navê de Çîko jî nêz bûbû, êdî herkesî didît ku fitîlek di paşîya Çîko de dişewite. Berê qûmandar tê gihîşt:

- "Heywaxx Çîko bigrin! Di qûna wî de dînamêt heye. Bêlûûûk dîqqeett!"

Gava ku eskeran navê dînamêtê bihîstin, kê karîbû wan li şûna wan bigire. Giş vir de wir de reviyar. Albay jî her tişt fahm kir. Cîba wî bi lez ji meydanê bi dûr ket. Hê em berbi vî alî, wî alî direviyan, qêrîna duduyan bi yuzbaşî ket: "Heywaxx! Dînamêt diteqe, xwe bavêjin erdê!"

Me hemûyan xwe avêt erdê. Di pey re jî me dengê teqîneke bêkeys û dengê zûrîna Çîko bihîst. Deng hate birrîn, min hêdika serê xwe rakir û li der û dora xwe nihêrt. Min dît ku Îbo jî li nik min e. Nêzî me kes tunebû. Îbo dibişirî. Bi dengêkî niv-nizm gote min: "Çîko jî bû şehîdê cimhûrîyetê".

Piştî vê bûyerê bi qasî mehekê îzin hatin hilanîn. Yuzbaşî ji ber îhmalkarîya xwe ya di cejna cimhûrîyetê de hate sirgûn kirin.

Navê Îbo jî di navbera me de "Îboyê dînamêt" ma.

*Stockholm, 1986*

*Ez dixwazim sipasî du hevalên xwe bikim ku di warê ziman de alîkarîya min kirin.*



# **EZ BI XWE**

## **(1893-1930)**

### **Mayakovski**

#### **Ya herî girîng**

Ez di 07.07.1894-an de hatim dinyayê (an jî di 1893-an de -agahdariyên ku dêya min dide û yê ku ji lîsteya cîhê karê bavê min derdikevin, ji hevdu cuda nin). Cîhê min î bav û kalan, gundê Bagdadyê ye. Ev gund li Gurcîstanê li herêma Kutaissi ye.

#### **Pêkhatina Malbatê**

Bav: Vladimir Konstantinoviç (li Bagdadyê karkirê daristanê), di 1906-an de wefat kir.

Dê: Aleksandra Alekseyevna

Xuşk: a) Lyuda, b) Olya

Bi qasî ku tê xuyakirin, tu Mayakovskîyekî din tune ye.

#### **Ders**

Diya min, hemû xuşkên min ên tîn bîra min û xwarziyên min ders dan min. Arîtmîk tu bawerî neda min. Diviyabû min ew sêv û hirmêyên ku min li zarokan belav dikirin, bihejmartana. Dema ku yekî diyarî dida min, an dema ku min diyarî dida yekî, kesî tu ew carî ne dihejmartin. Li her deverê Kafkasyayê, bi qasî ku mirov nikare xeyal bike, mêywe hene. Ez bi zewq fêrî xwendinê bûm.

#### **Pirtûka yekem**

"Mirovê ku Mirîşk Xwedî Dikir, Agafya". Heger wê gavê çend pirtûkên din



yên weha têketana destên min, min ê bi carekê dev ji xwendinê berda. Lê şensa min hebû ku pirtûka duyem "Don Kîşot" bû. Lê çi pirtûk! Min ji xwe re ji text şûrek çêkiribû û min hemû tiştên li dora xwe bi erdê re rast kiribû.



### **Lîse**

Ez Jules Verne dixwînim. Hemû fantazî. Zilamekî bi rîh, qabiliyeta min î resamî keşif kiribû û bê feyde dersên resimê dide min.

### **Sosyalîzm**

Axaftin, rojname. Li her deverê gotin û termên ku nayên fahm kirin. Ez ji xwe dipirsim, îzahatan dixwazim. Ez di saet şeşan de ji nav nivînan rabûm. Ez xwe bi temamî didim pirtûkê û dixwînim. Berê "Sosyal Demokrat, Xwe Ji Wir Bidin Alî". Ya duduyan, "Hevpeyvînên Li Ser Ekonomiyê". Ez di hemû jiyana xwe de, li hember qabiliyeta sosyalîstan ya ku rastiyan derdixin rohnîyê û dinyayê sistematîze dikin, heyran mame. Ez gelean fahm nakim. Dipirsim. Min dixin dorhêleke marksîst.

## **Rojên li Moskovayê**

Xwarin ne xerab e. Teqawîtiya bavê min, mehê 10 ruble ye. Ez û xwuşka xwe ya hevalcêwî xwendekar in. Dêya min mecbûr e ku odayên xênî, bi kirê bide û ji kirêdaran re xwarinê çêbike.

## **Xwendin**

Ji bo min edebiyat hîn li ortê nexuyaye. Felsefe, Hegel, zanistinên xwezayê. Lê beriya her tiştî, Marksîzm. Tu esereke din ya ku bikaribe bi qasî "pêşgotin" a Marks, min şad bike û di nava heyecanê xe, tune ye.

## **Partî**

Ez di 1908-an de dibim endamê SDAPR(Bolşevîk). Ez propagandîst im. Ez çûm ba nanpêjan, dû re soldirûyan û di talîyê de jî ez çûm ba karkirên çapxaneyan.

## **Girtin**

Ez di 29-ê Adara 1908-an de ketim xefikekê. Min deftera xwe ya notgirtinê xwar. Tev navnîşanan û cildê wê. Kesê ku îfadeya min distend, ji bo tiştên ku wî dixwest ez binivîsînim, zor dida min. Ez bi belavoknivîsandinê dihatim tawanbarkirin. Min ew îfadeya ku hatibû nivîsandin, ji bêçaretîyê, çewt şirove kir. Belkî jî min ew xapandibûn. Ez bi kefaletî hatim berdan.

Ez serbest bûm. Min salekê xebata partiyê kir û dû re, min ji bo demeke kin xistim bin çavan. Ev cara yekem bû ku min bi heq hukum dixwar. Lê ji ber biçûkbûna temenê min, ez dam bin çavdêriya polîs û berpirsiyariya weliyê min.

## **Qaşo paradoks**

Ez bi heyecanê ve dagirtî, ji girtîgehê derketim. Hemû tiştên ku min dixwend aîdî mezinan bûn. Lê tiştên ji yên wan xweştir nivîsandin, çi qas hêsan bû. Ez hîn ji nuha ve bi dinyayê re, ketimê nav pêwendiyêke temam. Bi tenê di huner de, pêwîstiya min bi tecrubeyan heye. Lê gelo mirov dikare vê ji kî derê peyda bike? Tu agahdariyên min ên di vî warî de tunene. Divê ez dest bi xwendegeheke ciddî bikim.

Min navbir da xebatên partiyê û dest bi fêrbûnê kir.

## **Destpêka hostetiyê**

Ez xwe, weke ku min tu carî helbest ne nivîsandibe, hîs dikim. Ez tecrubeyan werdigrim, lê talî bi dilşewatî diqede. Min dest bi çêkirina resiman kir. Min li Xwendegeha Resîm-Heykel û Mîmariyê -bi tenê vê muesseseyê xwendevan bêl belgeya pêbaweriyê distendin- dest bi xwendinê kir. Ez baş dixebitîm.

Rojekê min helbestek nivîsî. Min ew ji Burlyuk re dixwend.\* David weha sekinî, li min nihêrî û bang kir: "Belê tu helbestvanekî dahî ye!" Kêfa min ji pesinandineke weha ya ku min heq nekiribû re hat. Min xwe bi temamî da helbestan.

### **Destpêka sala 1914-an**

Ez qabiliyeta xwe hîs dikim. Ez meseleyekê pirr baş fahm dikim û fêr dibim. Bi temamî. Ez di derheqa meseleyekê de dipirsim. Li ser meseleyeke şoreşgerî. Ez berhema ku navê w; "Ewrê Bi Pantalon" e, di serê xwe de xeyal dikim.

### **Herb**

Ez li hember wê ketim heyecanê. Berê bi tenê bi aliyê wê yê xemilandî û bi qelebalix ve. Ez sîparîşa afîşan didim, helbet mutlaqa afîşên leşkerî. Dû re helbest. "Herb hatiye îlankirin".

### **Tebax**

Herba yekem. Ez felaketa herbê raste rast jiyam û fêr bûm. Herb tişteki pirr xerab e. Paş cepheyê hîn xerabtir e. Ji bo mirov bikaribe li ser herbê tişteki bibêje, divê mirov wê jiyabe. Ez dixwazim navê xwe, bi dilxwazî binivîsînim. Min qebêl nakin. Belgeya min a pêbaweriyê tune.

### **Cotmeh (Oktober)**

Gelo divê mirov li gel be, an li hember be? Ev pirs ji bo min derbas nabe. Ev şoreşa min bû. Ez çûm Smolnîyê. Ez xebitîm. Çi diviyabû bihata kirin, min hemû hel kirin.

### **Sala 1920-an**

Min ya navê wê "Sed û Pêncî Milyon" bû, qedand. Ez pirtûka xwe ya helbestan, bê ku navê xwe li ser binivîsînim, çap dikim. Ez dixwazim ku hemû mirov yek bi yek helbestan binivîsînin û xwe mukemmel bikin. Tu kes vêya nake. Lê herkes navê min dizane. Ez çî bikim. Vê carê jî ez navê xwe li ser dinivîsînim û diweşînim.

Ez dinivîsînim û resiman çêdikim. Min sê hezar (3000) afîş çêkirin û şeş hezar (6000) nivîsên binî nivîsandin.

### **Sala 1924-an**

Ez helbesta ku navê wê "Lenîn" e, diqedînim. Min ev helbest di gelek civînên karkeran de xwend. Ez ji vê helbestê ditirsyam. Ji ber ku mirov dikaribû bi hêsanî ew daxista sewiyeya îfadeyêke siyasî. Ew atmosfera di civîna karkeran

de kêfa min anî û baweriya min a di warê pêwîstiya vê helbestê de xurttir kir.

### **Sala 1926-an**

Ez bi zanebûn derbasî nivîskariya rojnameyê bûm. Huner, slogan. Helbestvan diqîrin, lê ne di wê rewşa ku di rojnameyan de binivîsîn de ne. Di îlaweyên bêberpirsiyar de, hîn zêdetir helbestan diweşînin. Lê divê ez bi bêmanetiya wan a helbestî bikenim. Bi tiştên weha re meşxûlbûn, siviktî ye. Ji dervayî jina min, ji bo tu kesî jî ne întresan e.

### **1927**

Ez karê xwe yê bingehîn li Komsomolskaya Pravdayê dikim. Ez di wextên xwe yên vala de, li ser helbesta ku navê wê "Qenc û Xweşik" e, dixebitim.

Ez helbesta "Qenc û Xweşik" bi qasî helbesta "Ewrê Bi Pantalon" programatik dihesibînim.

Wekî din jî senaryo û pirtûkên zarokan hatin nivîsandin.

Ez bicîhanîna wezîfeyên ku digrim ser milê xwe, berdewam dikim. Ez li ser hev 20.000 not digrim û li ser pirtûkekê bi navê "(Ji wî kesê ku notan digre re) Bersiva Cîhanî", difikirim. Ez dizanim bê girseyên ku dixwînin, çi difikirin.

### **1928**

Ez helbesta navê wê "Xerab", listikeke tîyatroyê û jiyana xwe ya edebî dinivîsînim. Gelek kes weha dibêjin: "Çîroka jiyana te pirr ne ciddî ye". Rast e. Ez hîn ji dinyaya akademîk bi dûr neketim û ez fêrî bi awayekî bi îtnayî lixwenerîne nebûme. Wekî din jî gava meseleyên min kêfa mirov bînin, min eleqedar dikin. Ketin û rabûna gelek edebiyatvanên sembolîst, realîst û hwd û têkoşîna me ya li hember wan. Hemû di ber çavên min re derbas bûn. Ev ji dîroka me ya ku bi temamî ciddî ye, beşek e. Û ez dinivîsînim.

**Wergêr:**

**Mustafa Aydoğan**

*(Sovjetunion Heute, Tîrmeh 1983)*

*Ev nivîs hatiye kurtkirin û ji Tirkî hatiye wergerandin.*

---

\* Hevalê Mayakovskî yê resam û helbestvan, David Burlyuk

# YA DA Û EZ

## Ahmet Cantekin

**C**anroj xwe ji xwe re li ser rewşa xwe dihizirî. Wî got:

– A niha diya min tê hundir û min li ber mêzê dibîne. Ez diya xwe nas dikim. Dema ew min di vê rewşê de bibîne, kezeba wê dê bişewite. Ew ê dest bi girî bike. Bi girî nê ve jî hema çî were ber devê wê , ew ê bêje. Rewşa min ê dilê wê wek xaniyekî bîne xwarê. Êdî ew nizane - ne ku ew di rewşa şahiyê de nizane- na; ji ber ku rewşa min ew jî pêrîşan kiriye; ew ê dest pê bike.

– Canrojê min! Diya te bi heyran, diya te bi qurban. Ev tu yî Canroj!? De bêje... kurê min, tu ketiye çî rewşê!.. mala min şewitî! Li welatê xelkê tu pêrîşan bûyî! Hawar li min! Çavên te jî nabînine! Wey li min! Kurê min, tu min dibîni? Bexê! Hele porê te! Wax! Wax! Tu ketiye çî rewşê! Tu çima ha bûyî? Bexê, tu bihata ba diya xwe. Min ê li kurê xwe binihêriya!

– Ez dizanim. Diya xwe Jîndayê nas dikim. Devê wê nasekine. Ne ku devê wê nasekine, bi rastî dilê şewitiye yê ku nasekine! Ew dila dibêje, digirî û dinale...

Ew dilê zîz wek zarokekî biçûk e. Geh şa ye, geh xemgîn e. Dil ku dilê diya min Jîndayê be! Ez dizanim, ew hema ji xwe diçe. Hêstirên çavan wek çemê Ferat in. Nasekinin! Nikarin bisekinin! Hema li dû hev wek asmanê binqulbûyî dibarîne.

Çaya min jî xweş bûye. Ev bûn çend roj ku min nikaribû çayeke xweş vexwim. Ji lezan meriv ne çêja tiştêkî dizane, ne jî baş û xweşbûna tiştêkî.

Bihar jî êdî hat. Belê, belê hat. Berf ji zûda ve ye ku helî û çû. Cîhan germ bû di saya Rojê de. Kincên zivistanê jî ketin cîhên xwe. Hinek daran û sincan gupik jî vekirin.

Roj, her roj heye. Roj dirêj bûn. Serê sibê Roj zû dertê û êvarê jî dereng diçe ava.

Min çend çûkên biharê jî bidîtana, çi xweş dibû. Ez ê gelek şa bibûma. Min ê wek diya xwe ji wan bipirsiya; çûkno! Hûn ji ser seran û çavan re hatin. Fermo, werin. Ji welêt, bajarokê min, dê û bavê min, xwîşk û bira, dost û yaran; yek jî ji neyaran çi deng û gotin hene?

Bi rastî serêvara paşîniya borî, dema piçek ewr bû, lê germ bû, refek çûk çûn. Li dora 40-50 çûkan hebûn. Çi dengên xweş ji wan dihat! Wan çi xweş dixwend! Bi rastî ew bûn ku agirê dilê min ji nû ve pêket. Pêketin jî çi pêketin! Çavên min çar vebûn. Rûyê min geş bû. Lingên min, gavên min mezintir dikirin. Rê li bin min wek marekî dixuşiya. Min bi çi şahiyê xwe gihandîbû malê! Bi rastî şahî jî şahiyek ewqas hêja nebû. Ji bo min, merivekî biyanî, ji welêt dûr, ma şahî heye! Na! Bi Roja sor be ku ji bo min şahî tune. Li jor jî min peyva şahiyê bi şaşitî bi kar anî. Diviyabû min peyveke, gotineke din bi kar bianiya. Li welatekî biyanî ku meriv lê pêrişan dibe, dipelçiqe, tê êşandin; şahî tune! Lê ji nezanîna min e ku ez peyva şahiyê bi kar tînim.

Ez Jîndayê nas dikim. Dema wê têra xwe ez maç û hembêz kirim bi şûn de jî dor ê bê kinc derxistinê. Ew ê kincên min ji min bike. Xem nake ku ez bêjim diya min a delal. Ez baş im. Sax im. Tişteki min tune. Ew dê ye û gotina wê derbas dibe. Ne ku min ew daye; na, wê ez da me. Ji ber wê ye ku gotina wê derbas dibe û dê bibe jî. Herçiqas ku ez mezin im, xwedî jin û zarok im jî dîsa xem nake. Ez lawê wê yê biçûk im. Şîrînê wê me. Nezan im, sêwî me û bêkes im.

– Bexê min... ev der çi bûye? Bêje, bêje, hinekan tişteki lêxist? — Na dayê, na... kesî tişteki lênexist. Dema ku min dixwast tişteki hişk bibirim, min meqes da ber zikê xwe ku piçekî alîkariyê jê bistînim. Dema ez hatim dawiyê, min meqes pir guvaşt û paşîya meqesê jî zikê min guvaşt û xwîn bû. Lê du-sê rojan de xweş bû.

– Ka ez li lingên te binihêrim. Ka pê û pêçiyên te hene.

– Na dayê, ne ling, pê û ne jî pêçiyên min hene! dema ku xwarina min tune bû, min ew xwarin.

– Na, na, ez dikim binihêrim. Goreyên xwe derbixe.

– Na dayê! Tişteki ku tu lê binihêrî tune.

- Ez dibêjim derbixe û tu jî derdixî.  
 ... Pey li min! Hawar li min! Kurê min pêyê te çi bûye? Ew di ber kû de ma? Ew çi bû? Ew di ber kîjan makîneyê de ma?  
 – Tu çi dikî diya min?!
- Ez piyê kurê xwe maç dikim. Ma ez çi dikim!  
 – Erê diya min, erê. Ez te nas dikim. Dilê te her wek xwe ye. Lê a niha dora te ye. De tu bêje. Çima porê te wirg spî bûye? Çima rûyê te qermiçî ye? Wek axa zeviya nûajotî, li ber Rojê şewitî... Çermê te çima ewqas hişk bûye?
- Tu dev ji min berde heyran. Tu xwe bêje. Tu çima li ber xwe dinihêr? Rûyê te, dengê te bi girî dibe. Kelgiriyek li ser dengê te ye. Ez dibînim hêstir ji çavên te tèn. Pozê xwe dikişî...  
 – Tiştêkî min tune dayê. Min bîriya te kiribû loma ez kelgirî bûm. Baş e, çima tu digirî?  
 – Ez nagirîme Canrojê min. Hêstir bi xwe ji çavên min têne. Diya te nagirî. Ez nagirîm.  
 Êdî girî bûye jiyana me. Her kî negirî, dilê wî reş e.

*Stockholm 1993*



# RAYAN

## J. Espar

Werrek bi ay rojan! Zerra mi mi wena. Reyanê mi di zî  
hêvî herikiyêna hezey  
gelekî embazan. Embazê ganfîday û erjiyayey  
embazê ki ez ewro

yînî hetî şermezar o.

'Eyb yeno vatiş ma nêzanaynî merg çi yo çikare wo.

Ti çendi vajî ma endî xwi

ra razî bî, to vatînî qey ay koy-moyê wîrdêkî heme  
ma viraştî. Bawereya ma sey

pola qasidî.

Xeyalê ma romantîkî,

şoreşgêrî bî xeyalê ma

biney zî saxekî

û naşî.

Estaranê zerrênan hewnê ma xemelnaynî

asmîno sêmên di. Babet babet vilikî

zergûnî bînî zerrîda ma ya teniki ser o.

Ma bengîyê rindey

ma sembolê neweyey

ma xwazgînê azadiya nazdari bî.

**J. Espar**

(1956 - Pîran)

Kitêba wî ya dawîn:

**Tanî Estanikî û**

**Deyirê Ma**

Qali hameya qali ez vana, nêki ewro hinî ne aw pey  
germini ne zî serdini bena.  
Giregirê ma payedarî, îllegalîta ma namedari bî. Îllegalîta  
ki ma vatînî  
qey halînê zorê gonarî ya.  
La gama ki barbaran bestî çek û rextî  
gama ki yew şew xafila ameyî lek bi lekî  
ne havila hewnan bî ne zî ya xeyalan.  
Giregiran zî mepersî!  
Yê bê ki vajorî bî  
bê ki riy yînî bidejo  
pey vîyedê xwi kend  
û hergû yew yew heti ra şî.  
Sey seyekanê binê dêsan  
milçewtî û milulî  
destê ma pistinê ma di  
Ma raşte di mendibî.  
Roj hinî rojê bêbavan  
çi apoletin, çi bêapolet  
roj rojê unîforma bi.  
Zîndano tarî di  
ters ramitinî  
ganî girewtinî  
unîformayinan.

Ters kuçan di  
ters keyan di  
fekdê mi ro nîna ez vaja  
ters dekewtibi pîzzedê şarî.

Ez çi serey to bidejno  
Rojê seki yew mi ra vajo: "Ti zî rayan î birak!  
Rayanê Binê Xeti."  
Mi pîzzedê xwi di va:  
"De ha Serê Xeti, ha Binê Xeti  
timo ayo ki zerra mi biya çarleti."  
Yew nimacê dosere ra  
ez raymenda Berê Mêrdînî ra!  
Mi çend waştîni yew vajo:  
"Ti xeyr şêrî silam bêrî leyro!"  
Ay nimac, kesî vîrî şono caran!  
Kamî zanaynî ay nimacê  
bêrîya min a çendroja  
Stokholm di bena duyey serra.  
Kamî guman kerdîni gelo  
Tîtikê koyan beno warey gerilla.

*Nisan 1994*

# WAŞTA

## J. Espar

Ti gege terni û ciwani  
naziki û delali  
vilika hinari manena.

Ti gege şermokini û nazini  
veyeka yewşewa manena.

Ti gege tersoneki û siviki  
xezalêka koyî manena.

Ti gege zerteniki û pîzeveşni  
qesbaya may manena.

La hergû reya ki ti binê çiman ra  
ewniyêna û peşmiriyêna  
ti tena waşta manena.

*Sibat 1993*

# GAP Û MÎRATA KULTURÎ

**Osman Aytar**

**D**ewleta Tirkîyê, projeya ku bi navê "Projeya Anadolîya Başûrêrojhilat" (GAP)" tê nasîn, her dem wekû propagandayê bi kar tîne. Li gor berdevkên dewletê, "pêşeroja" gelê Kurd wê bi GAP'ê bê guherandin. Wekû her caran, di dema vekirina yek ji tunelên Ruha (Şanlıurfa)yê de jî, bi rojan di radyo, televîzyon, rojname û kovaran de, propandayên li ser derew û demagojiyan avakirî, hatin kirin. Propagandayên weha, hindik an zêde her dem tên bikaranîn.

Gelo rastiya GAP'ê çi ye? Wê çi bîne û bibe?

GAP, projeyek fireh e û li gor planên resmî yên dewleta Tirkîyê, wê li ser ava Ferat û Dicleyê 22 bendav (baraj) û 17 santralên elektrîkê avabibin. Ger GAP bi tevayî bê avakirin, nezî 1.6-1.7 milyar hektar erd wê bîn avdan û 26-27 milyar kilowattseet elektrîk wê bê bi destxistin. Ji bo avdana erdên zîreetê yên herêmê, li Ruhayê du tunelên mezin ava dibin. Di çerçeweya GAP'ê de, heta nuha bendava ku bi tevayî qediyaye, tenê Bendava Karakayayê ye. Bendava Atatürk û Tunelên Ruhayê jî, tenê hin beşên wan qediyane. Karê avakirina hin bendav û santralan jî didome û yên mayî jî hîn di sewiyeya planê de ne<sup>1</sup>.

Bê şik gellek aliyên vê pirsê hene û ne mumkun e ku di nivîseke weha de mirov bikaribe hemû tiştan bîne ziman. Armançên siyasî, civakî, aborî û yên din ên dewleta Tirkîyê ku li ser GAP'ê ne, gellek in. Di gel vê, hin tiştên ku bi avabûna bendav û santralên elektrîkê, hatin û wê di pêşerojê de bîn holê jî hene. Xerakirina mîrata kulturî, yek ji van tiştan e, ku divê mirov bi girîngî li ser bisekine.

## Pêwîstiya pêşveçûna tevayî

Dewleta Tirkîyê, di warê polîtîkayên pêşveçûnê de jî, helwesta xwe ya dîrokê bi tundî didomîne, guh nade peyman û pîvanên navneteweyî. Ger bi xwe îmzekiribe jî, ji bo wê ne girîng e û li gor berjewendiyên xwe yê kurtewext, dikare mîrata dîrokî û kulturî ya gelan bi hêsanî xera bike. Wexta pirs dibe pirs a Kurd û Kurdistanê, ew bêberpirsiyartî hîn hovane dimeşe. Projeya GAP'ê, yek ji van mînakên bêberpirsiyartiyê ye.

Di vî warî de gellek peyman û biryarên navneteweyî ku ji alî Tirkîyê ve jî hatine îmzekirin, hene. Di nav van peyman û biryaran de du hebên balkêş hene ku ji bo agahdariyek giştî, xwedî maneyên girîng in.

Yek ji van, bi navê "Dehsaliya Dinê ya Geşbûna Kulturî (1988-1997)" tê nasîn, ku bi biryarên civînên giştî ên Neteweyên Yekbûyî û UNESCO (Rêxistina Kulturî, Zanistî, Perwerdekarî ya Neteweyên Yekbûyî) hatiye qebûl kirin. Tirkîye, him pêwîstiyên vê biryarê nayne cî, him jî di pratîkê de li dijî vê biryarê gavan davêje. "Rêberê Pratîk" ku ji bo çalakîyên Dehsaliya Dinê ya Geşbûna Kulturî hatiye amadekirin, hin rastiyên planên pêşveçûnê, ku ji bo planên GAP'ê jî aktuel in, tîne ziman. Di rêberê de behsa helwesta pêşveçûna tevayî tê kirin. Tespîten wekû *"Hemû babet projeyên pêşveçûna civakî û aborî ku rewşa kulturî û xwezayî ya civakê nagrin ber çavan, mehkûmê têkçûnê ne"* û *"Tu projeya pêşveçûna rastîn, nikare taybetiyên bîngêhên ên rewşa kulturî û xwezayî, pêwîstî û daxwaziyên gelên alaqeder bide aliyêkê"*, rastiya GAP û xerakirina mîrata kulturî tînin ber çavan.

Çar armancên bîngêhên ên "Programa Dehsali" ya ku di çerçeweya Dehsaliya Dinê ya Pêşveçûna Kulturî de hatiye îlankirin, ji alî perspektîf, ji bo pirs a Kurdan jî gellek di cî de ne. Ew çar armancên wekû, *di pêşveçûnê de liberçavgiirtina unsûra kulturî, nasîna nasnameya kulturî û dewlemendkirina wê, firehkirina beşdarbûna jiyana kulturî û geşkirina hevkarîya kulturî ya navneteweyî*, him ji alî pêşeroja polîtîkayên dewletê, him jî ji alî pîvanên pêşveçûnê, xwedî maneyên girîng in.

"Peymana Parastina Mîmartiya Ewrûpayê" ku ji aliyê Tirkîyê ve jî hatiye îmzekirin, di vî warî de mînakek eşkere ye. Him di vê peymanê de, him jî di planên ku di vê mijarê de hatine amadekirin de, pêwîstiya jiyandin û parastina doralî û mîrata mîmarî, di projeyên pêşveçûna civakî û aborî de liberçavgiirtina mîrata kulturî û dîrokî, tê behskirin. Di peymanê de hin hukmên ku yê ku peyman îmzekirine girêdidin jî, hene<sup>4</sup>. Lê ji bo Tirkîyê ne xem e.

Ji ber ku ji plankirina GAP'ê heta nuha, dewleta Tîrkiyê tu car pêwistiya şîrovekirina tesîrên projeyê nedîtiye; hin pîvanên navneteweyî ku pêdivêtîyên wan divê ji destpêka projeyan bêne bicihanîn, bi bêberpirsiyarî paşguh kiriye; bajarekî antîk ê Kurdistanê û gellek cihên dîrokî di bin ava bendavan de man. Ger tedbîrên pêwîst neyên standin, an jî planên heyî neyên guhertin, wê bajarek wekû Hesenkêfê û gellek cihên din jî di bin ava bendavan de bimînin.

## **Di bin avê de xezîneyeke kulturî**

Tiştên ku di kolînên arkeolojîk ên girikên (Şemsiyetepe, Değirmen-tepe û Koşkerbaba) ku di bin Bendava Karakayayê de man û di yê bajarê Samsatê de hatin dîtîn, bi serê xwe him nîşanên dewlemendiya mirata kulturî û dirokî ya Kurdistanê ne; him jî sewiyeya wêrankariya GAP'ê ya li ser mîrata kulturî nîşan didin. Ji ber ku kolînên arkeolojîkî dereng dest pê kirin, gellek tiştên hêja di bin avê de man.

Di kolînên arkeolojîk ên Girikê (höyük) Şemsiyetepeyê (1978-1985) de hin tiştên ji Çaxê Hesinî, Çaxê Pêşî yê Tûncî û Çaxê Kalkolîtîk mayî, hatin dîtîn. Li Şemsiyetepeyê, di gel dîtina perçeyên dîzik û qafikan, kêra hesinîn, derziyek tûncîn û hin figûrên ji Çaxê Tûncî mayî û kûzekî sor ku tê texmînkirin ku ji Çaxê Hesinî maye; hebûna avahiyên bi kevîran çêkirî, jêmayiyên kûre (firûn) û odayên bi tîfik, nîşanên sewiyeya bicîhbûna mirovayetiye ku wê demê li herêma bûye ne<sup>5</sup>.

Di kolînên Girikê Degirmen-tepeyê de (1978-1984), tiştên ku ji Berê Mîladê 4 000-5 000 sal mane, hatin dîtîn. Serê tîrkevanek û kaseyek ji Çaxê Hesinî; kort û sandûqên (bi kerpîçan çêkirî) zexîreyê, aletên ji kevîran çêkirî û gellek perçeyên kaseyên ji Çaxê Hesinî; hin aletên ji hestiyên çêkirî, hin ziyet, hin babetên moran, kûreyên ji bo helandina sifir (bakir), xaniyên bi kevîr û bi kerpîçan çêkirî û firûn û argûnên (tîfikên) wan ên ji Çaxê Pêşî yê Tûncî, hin tiştên balkêş ên ku ji avê xelasbûne ne. Heta dema me mayîna xaniyên bi kerpîçan çêkirî, wekû hostatiya mîmariya wê demê tê şîrovekirin<sup>6</sup>.

Di kolînên arkeolojîk ên Girikê Koşkerbabayê (1978-1983) de, di gel avahiyên bi kerpîçan û bi kevîran çêkirî yê ji Çaxê Hesinî û Çaxê Pêşî yê Tûncî, dîtina hin perçeyên dîzik û qafikên ji Berê Mîladê 1000 sal mayî û hin jêmayiyên avahiyên ji dema Urartûyan, wekû nîşanên bicîhbûna mirovatiyê tîrê şîrovekirin<sup>7</sup>.

Bajarê Samsatê jî, bi tevayî di bin ava Bendava Ataturkê de ma. Wekû tê



zanîn, Samsat bajarekî kevnare yê Kurdistana Bakur bû. Bajarê Samsatê, ji Qraliyeta Kommagene ku Berê Mîladê di sala 69'an de avabûbû, paytextî kiriye. Avakarê vê qraliyetê, Antiochosê I. jî tê de, şeş qralan li herêma Samsatê 141 sal hukumdarî kirine. Herêma Samsatê, di pêvajoya dîrokî de bûye cîwarê gellek gelan û gellek hukumdaran jî li herêmê serdestiya xwe domandine. Sumeran, Hurriyan, Hîtîtan, Mîtanniyan, Medan, Asûriyan, Persan, Roman, Ereban, Selçûkiyan û Osmanîyan li gor rewşa cîwarbûn û serdestiya xwe, li herêmê jiyane û hukumdarî kirine. Lê Kurd, wekû tê zanîn piştî têkçûna Împaratoriya Medan, bi awayekî giştî her dem bindest bûne.

Di kolînên arkeolojîkî yên bajarê Samsatê de, hin tiştên jêmayiyên kulturî hatin xelaskirin; lê mixabin xezîneyeke mezin di bin avê de ma. Li Samsatê kolînên arkeolojîkî, di sala 1978'an de dest pê kirin; lê di gel vê derengdestpêkirinê jî, kolîn bi dûzan nemeşîyan. Di kolînan de jêmayîyên girîng ên Çaxê Navîn ê Tuncî û yê Berê Mîladê 2000 salî, hatin dîtîn. Perçeya kitabeteke ji Çaxê Dereng ê Hîtîtiyan, di wazoyek ku ji Çaxê Asûriyan mayî de dîtina peykerê kulliyek ku ji bronz hatiye çêkirin, perçeyeke tuxlayeke cilakirî, hin tiştên balkêş ên ku hatin dîtîn in. Di kolînan de morên ji Çaxê Nû yê Babîlan (Berê Mîladê 625-539) û Çaxê Dereng ê Asûriyan (Berê Mîladê 721-705) jî hatin dîtîn. Li ser morên Çaxê Nû yê Babîlan, şiklê figûrên mirovên ku li ber sembolen "Xwedê" secde dikin, heye. Li ser mora ku tê texmînkirin ku ji Çaxê Dereng ê Asûriyan maye, rismê qralek ku li ber figûrê ku ihtimalek mezin "Xwedayê Heyvê yê Herranê" temsîl dike, secde bûye, heye. Di kolînên Samsatê de, dîtina jêmayiyên qesra ku tê texmînkirin ku di dawiya dema Helenîstîk û Romayê de, ji alî bavê Antiochosê I., Mitradates Kallinikos (Berê Mîladê 100-70) hatiye çêkirin, xelaskirinek baş bû. Li wir, perçeyên mozayîkê, sîkkeyên Mitrades Kallinikos û hin berhemên peykersazî; di kolînên bircên Samsatê de jî jêmayiyên demên Bîzans û Îslamê hatin dîtîn. Di kolînan de di gel dîtina gellek tiştên ji dema Artûkiyan, Selçûkiyan û Eyyubîyan mayî; taybetî jî di kolîna sala 1983'yan de di qata dema Helenîstîk de di nav paçekê de sîkkeyên sîmîn, tiştên zîynet ên sîmîn û zêrîn, mirarî û moriyên ji kevîrên giranbuha çêkirî jî hatin dîtîn. Sîkkeyên sîmîn 340 heb bûn û yê dewletên Emewîyan, Ebbasîyan, Samanîyan, Hemdaniyan û Buweynîyan bûn. Di kolînên sala 1984'an de jî, 3 sîkkeyên zêrîn ku li ser wan navên xelîfeyên Ebul Cafer Harun (Piştî Mîladê 786-809), Ebul Fazl Cafer el Mutewekkil ala'llaha (Piştî Mîladê 847-861) hene, hatin dîtîn<sup>8</sup>.



Di nav sînorên Semsûrê (Adiyamanê) de gellek berhem û avahiyên dîrokî jî di bin ava Bendava Atatürkê de man. Li Gextê (Kahtayê) Girikê Ancozê, li Samsatê gorên di nav zinaran de çêkirî, Tirba Arslan Paşa, Tirba Hesên Hecî, Tirba Hecî Yusuf, Tirba Mehmet Gazî Paşa, hin kîtabetên kevn, hin xaniyên kevn (Mala Bekir Çetin, Mala Kadir Aslan, Mala Mustafa Kuran, Mala Nazîf Toprak û Mala Nurî Satici), Mescîda Hesên Aga û Mescîda Tepeönüyê di bin ava Bendava Atatürk de man<sup>9</sup>.

Pêşeroja bajarê Hesênkêfê jî di talûkeyê de ye. Li gor planên GAP'ê, ger Bendava Ilisu avabe, wê Hesênkêf bi tevayî di bin avê de bimîne. Wekû tê zanîn, yek ji bajarên kevnare yê Kurdistanê jî, Hesênkêf e.

Li gor hin çavkaniyan, di Çaxê Pêşî yê Klasîkî de navê bajêr Cepha (Cefa) bûye û di belgeyên Konsîlê Khalkedonê (nuha navê wê "Kadiköy" e) de navê wî wekû merkeza Metraniya (piskoposîya) Suryaniyan derbas dibe. Li gor van çavkaniyan, di wê deme de gellek dêr li herêma Hesênkêfê hebûne. Bajar, dem dem ketiye destê Ebbasiyan, Hemdaniyan, Merwaniyan û Artûkiyan; herweha ji Artûkiyan re paytextî jî kiriye. Ji ber ku gellek şikeftên ku ji parastinê re musaît in li Hesênkêfê hebûne, bajarî bala gellek hukumdaran kişandiye ser xwe. Hesênkêf, carekê ji alî Îlhaniyan hatiye xerakirin jî. Di destpêka sedsala 16'yan de demekê ketiye destê Safewiyên Îranî, lê ew desthilatdarî dirêj neajotiye û di sala 1516'an de bi alikariya hin beg û serokeşîrên Kurdan, Hesênkêf ketiye destê Osmanîyan. Dewleta Tirkîyê jî, ji avabûna xwe, desthilatdariya herêmê dewr girtiye<sup>10</sup>.

## Notên binî:

1. Ji bo şirovekirinek berfireh û pîrralî a li ser GAP'ê binêre:

Osman Aytar, Kürdün Makûs Talihi ve Güneydoğu Anadolu Projesi, Medya Güneşi Yayınları, İstanbul, Kasım 1991

Di şirovekirin û binavkirina jêmayiyên kulturî û dîrokî de tesîrên îdeolojiya resmî û polîtîkayên dewleta Tirkîyê jî, divê her dem bê hesabkirin.

2. UNESCO-Mimarlar Odası, Kültürel Gelişmenin Dünya Onyılı ve Türkiye, E Yayınları, İstanbul, Mart 1990, r.22-24

GAP, li ser xwezaiyê û jiyana miravan (wek mînak, sebebûna hin babetên nexweşîyan) jî hin tesîrên neyînî (negatîf) dike. Ev aliyê wê pîrsê dikare bibe mijarê nivîseke din.

3. UNESCO-Mimarlar Odası, r. 25-32

4. UNESCO-Mimarlar Odası, r. 77-85

5. Ji bo kolînên Şemsiyetepeyê (Di nav sînorên gundê Bilaluşağı de ye ku girêdayî qezaya El'ezîzê, Baskîlê ye) binêre:

- A.Muhibbe Darga, Şemsiyetepe 1979 Yılı Çalışmaları, II.Kazı Sonuçları Toplantısı (Ankara, 11-15 Şubat 1980)

- A.M.Darga, Şemsiyetepe Kazıları 1981 Yılı Çalışmaları, IV. Kazı Sonuçları Toplantısı (Ankara, 8-12 Şubat 1982)

- A.M.Darga, Şemsiyetepe Kurtarma Kazıları 1982 Yılı Çalışmaları, V.Kazı Sonuçları Toplantısı (İstanbul, 23-27 Mayıs 1983)

- A.M.Darga, Şemsiyetepe 1984 Yılı Kazı Çalışmaları, VII.Kazı Sonuçları Toplantısı (Ankara, 20-24 Mayıs 1985)

- A.M.Darga, Şemsiyetepe Kazıları 1985 Sezonu Sonuçları, VIII.Kazı Sonuçları Toplantısı (Ankara, 26-30 Mayıs 1985)

6. Ji bo kolînên Değirmentepeyê (Nêzîkî gundê İmamlı ku girêdayî Meletiyê ye) binêre:

- Ufuk Esin, Değirmentepe Kazısı 1979, II.Kazı Sonuçları Toplantısı (Ankara, 11-15 Şubat 1980)

- U. Esin-Savaş Harmankaya, 1984 Değirmentepe (Malatya) Kurtarma Kazısı, VII.Kazı Sonuçları Toplantısı (Ankara, 20-24 Mayıs 1985)

7. Ji bo kolînên Koşkerbabayê (Nêzê gundê Meydancık ku girêdayê Meletiyê ye) binêre:

- Onder Bilgi, Koşkerbaba (Göçkerbaba) Höyük 1979 Yılı Kazıları Sonuçları, II Kazı Sonuçları Toplantısı (Ankara, 11- 15 Şubat 1980)

- O. Bilgi, Koşkerbaba Höyük 1981 Dönemi Kazıları, IV. Kazı Sonuçları Toplantısı (Ankara, 8-12 Şubat 1982)

- O. Bilgi, 1983 Dönemi Malatya-Koşkerbaba Höyük Kurtarma Kazıları, VI.Kazı Sonuçları Toplantısı (İzmir, 16-20 Nisan 1984)

8. Ji bo kolînên Samsatê binêre:

- Nimet Özgüç, Samsat 1984 Yılı Kazıları, VII. Kazı Sonuçları Toplantısı (Ankara, 20-24 Mayıs 1985)

- N. Özgüç, Sumeysat Definesi, Belleten, Türk Tarih Kurumu Yayını, Aralık 1985

- Tahsin Saatçi, Sumeysat Definesi Sikkeleri, Belleten, Aralık 1985

- A. Ahmet Tırpan, Samosata Aşağı Şehir Sur Duvarları, VIII. Kazı Sonuçları Toplantısı (Ankara, 26-30 Eylül 1986)

Navê Samsatê, berê Samosata bû, di dema Ereban de navê Sumeysat girt.

9. Yurt Ansiklopedisi, Cilt 1, r.241

10. İslam Ansiklopedisi, Cilt 5, Kısım 1, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul 1977, r.452-454

# JÎ SÎFÎRÊ

## Paşa Uzun

**D**i girtîgeha Dîyarbekirê de, divê me di şevê de neh-deh marşên Turkî ezber bikira û divê herkes di demekê kurt de hînî nivîsandin û xwendina Turkî bibûya. Piraniya me bi ser diketin, yê ku nikarîbûn mal li xwe dişewitand, dest û nig li wan nerm dibûn. Qerdîyanên girtîgehê bi copan diketin ser canê wan û weke hevîr ew nerm dikirin.

Her kî çi dibêje bila bibêje, can şîrin e û tirsê lêdanê giran e.

Gelek însan hebûn ku di emrê xwe de tu caran ne Turkî peyivîbûn û ne jî Turkî xwendibûn. Ev însanên Turkînezan di şevê de dibûn kewê gozel û bi Turkî dixwendin.

Niha divê ez ji kovara Komeleya Nivîskarên Kurd re nivîsarekê binivîsînim. Ev daxwazî jî çend hevalên Komeleyê tê. Bê zor û bê tirsê lêdanê, yê endam û yê ne endam divê bi pê nûsa xwe alîkariyên xwe ji kovara Komeleyê re pêşkêş bikin.

**Paşa Uzun**  
(1953 - Sêwreg)  
Kitêba wî ya dawîn:  
**Siverek'ê Bir**  
**Gece Vakti**

Bes ez nizanîm, ezê ji ku û çawa dest pê bikim. Ez ji nivîsê û nivîsandinê gelek dûr ketime. Ev dora sê salan e ku min bi Kurdî tiştêk nenivîsandîye. Berî vê bi çend sal, min di redaksiyona kovara Berbangê de cî girtibû. Bi zor û zehmetî û bi alîkariya hevalan min çend nivîsar nivîsandin. Lê zor e, zehmet e, wekî zaroyên şeşsalî divê meriv li pê heval û nasan bigerre û alîkariya wan bixwaze.

Gotina min ew e ku, divê meriv hin tiştan di vexta wê de dest pê bike. Niha emrê min çel e. Heta îro roj min gelek tişt bi Turkî nivîsandîye û bi Tirkî hîn bûme.

Berî ku ez di redaksiyona Berbangê de cî bigrim, min bi dil û daxwaziya xwe dev ji zimanê Turkî berdabû.

Bi Turkî guhdarîkirin û bi Turkî xwendin niha min ji kok de terk kir. Her çiqas mentiqî nebe jî dilê min dest nade ku ez Turkî bixwînim û Turkî guhdarî bikim. Pirtûkên bi zimanê Turkî min ji nav pirtûkên xwe derxistin, niha di nav embara xaniyê me de toz digrin.

Niha emrê min nivê rê jî derbas kirîye û ez dixwazim bi Kurdî binivîsînim. Di vî salê xwe de ez ji sifirê dest pêdîkim û ji sifirê destpêkirin hertim zor e. Gava ez vê nivîsarê dinivîsînim, carna disekinim û li kelîmeyên rast digerrim. Weke însanekî kor ez di şeva tarî de li riya rast digerrim. Bêzimanî weke korbûyinê zehmet e, Xwedê bira serê kesekî de neyne.

Herweha daxwaza dilê min bi Kurdî nivîsandin e û divê bê gilî û bê gazinc ez vê bidomînin. Lê ezê bigihîjim ku derê, jiyana min a rojane wê dest bide an na, ez nizanîm. Dibe ku hevalên zimanzane, hevalên ku di vî warî de pêş ketine bi min bikenin. Bes xem nîne, ezê jibo serketinê bixebitim. Gava ez bi ser neketim, ezê xwe paş ve bikişînim û li mala xwe rûnim.

Zor û lêdan tune, ne copên qerdîyanên Dîyarbekirê û ne jî "devê tîfinga mor". Yê ku zorê dide min dilê min e.

Vê carê di vê nivîsara kurt de min hîssên xwe nivîsandin. Ka hele bise careke din ger şert û şurût dest bidin ezê hewl bidim ku nivîsareke din binivîsînim.

16. 2. 1995

# "NO KÎ MA RA WO"

## Mûnzûr Çem

**S**iro ke Çorum de eskerîya xo kerdêne, xaftela rozê emir amevî ke şêrê Gîresun. Çi turî ke emir vêjîyavî kî nêvînetîvî, hama eve lerze kewtîvî ra raye û şîvî. Nêzdîyê di heftêy ra dime, ke xo rasnavî Boyabat, endî eskerî de hal nêmendîvî. Kincî ser o bîvî qilêrînî, pos de mendîvî. Yê tayîne dirriyavî, parçeyî ci ra sanîyêne ra. Yê tayîne kî postalî lingû de heleşîyavî ro. Vêsanîye û têsanîye ver, teqeta xo qedîyavî. Hen qefelîyayî bî ke, çokî bine de bîyêne çewtî, bese nêkerdê ke game berzêne. Binê çentî de bîvî bulik, lingê xo hard ra kas kerdê, zarzor şîyêne. Eskerî de moral nêmendîvî, çêfê xo bine ra remavî.

Uzay ra gore kî eke mola amê cidayîş, zeke mordem maya xo ra newe yêno dîna, hen bî. Ci ra tayê, eve lerze meredîyayî ra, tayê kî nîştî ro. Tayîne eve merax çimê xo dormê xo de fetelnayî, nîyada, tayîne kî sarê xo na ro zonîyonê xo ser, fikirîyayî.

Memedo Dêsmiz ve xo kî, eke tenê senikek nîst ro, nêvînet, pêyser ust ra, destê xo kerdî cêvanê xo, hurdî hurdî fetelîya. Eke hen tenê nahet û dohetî ser ame-şî kî, xaftela hîrê-çar cênî ve hondekî cuwamêrdan ra kewtî ra

**Mûnzûr Çem**  
(1945 - Kêxî)  
Kîtêba wî ya dawîn:  
**Ferhengê Kurdî**  
**(Zazakî)-Tirkî**

çiman ver. Çituri ke yê dî, zerre de gonî girîye. Sayeke komêde dostanê xo dîvî. Sayeke ayê ke verva ci yê, wertê dêy û dîne de hevalîya serran bîye. Hen ci ra nêzdî, hen gonegerm osêne. Çi esto ke nêwast xeletîye bikero, o sebeb ra gore kî tenêna eve dîqet nîyada. Nê! Sasîye te de çinebîye. Dêrsîmîzî bî yê. Sîma xo şivî ro sîma sarê Dêrsîmî. Eke na qerar nîya da ci, nara kî nêvînet, hetê ci ser bî ra derg şî. Hama hen şiyêne ke, sayeke dîne rê elaqadar nêbîyêne, hen xo rê fetelîyêne. Siro ke êy hen kerd, cênîkêda kokime werte de bîye, aye eskero ke yê dormû ra axme bîyo, dêy de nîyada nîyada û xaftela va ke:

– Wêêyê, no eskero ke koyê Dêrsîmî ra ma qir kerdîme u yo. Nîyadê, surringinê ê kowû kî hona pa ro.

Memed, zerê xo de huya hama vengê xo kî nêkerd. Çiqaşî ke dest ra ame, oncîya xo na ro nêzonayêne. Heto bîn ra kî devam kerd, hetê dîne ser şî.

Ayê de Dêsmû tenêna zêde eve dîqet binê çiman ra têy nîyada. Cênîka kokime kî qet nêvînete, Memed îşaret kerd û va:

– Wêêyê! Sayeke koyê Dêrsîmî yo, ma dime yeno cîyê weno ha!

Memedî o ra dime gos pira nêkuya, raste– rast hetê dîne ser şî. Cênîke nîyada ke nêvîndeno yêno, nara kî ze tenê çêfê xo rema û eve xof, va ke:

– No cîyê weno hama nêzû çik o.

Naye ser o Memedî veng fist ra xo, va ke:

– Heya waya mi, ez van cîyê burîne, hama sima nêvîndenê ma se bikêrîne.

Çi turî ke Memedî hen va, veng kewt ra cênîka kokime û va ke:

– Wîy ve mi ro bo! Xizir mi ve kore kero! Wîy, nê no na wo ma ra wo! Na wo zonê ma qesêy keno!

Surginî sas kewtîv ci, nêzonêne ke se bikerêne. Heto zu ra qesê xiravînî vatîv, serm kerdenê. Heto bîn ra kî welatê xo ra zu rastê ci amêvî, eve zonê dîne têy qesêy kerdê, çêfê xo hurêndî de bî.

Eve o hal, waxto ke tenêna bî nêzdî, rind amêy tê rî, zuvînî de nîyada, nara kî cuwamêrdû ra Qemerê Hêyderizî veng fist ra xo va ke:

– Lawo, nîyade çîyê van, hama ti gereke înkâr mekerêne ha. Ti Memedo ke areyê Têsnîge ver der a, o nîya? Sîma to şîya ro sîma dêyî.

Memed huyî û va ke:

– Ya, ez ûne.

Qemer, xêlê serrî ra avê şivî Têsnîge, dêsê areyê Memedî navî ro. Uza ra zuvînî zonêne. Xora eke kincê eskerî pira nêbîyêne, Qemerî seke dî, o nas kerdê, hama kincû hen vurnavî ke naskerdene qolay nêbîye.

Endî Memed lewê dîne de nîst ro, hal-xatirê zuvînî pers kerd, naza-haza ra qesêy kerd. Yê, di serrî ra avê surgin kerdîv, rusnavî Boyabat. Eke amêvî

nêamêvî kî fetelnêne ke cayê xo yo newe misêne. Eskera bî ke no kî çiyede zor bî. Îne nêwastêne ke welato xêrîv de vindê, hama çîyo ke dest ra bîyamêne kî çînebî. Omidê xo vîndî nêkerdê, çî esto ke vinetene ra qederî kî raye çînebîye.

Eke eve o hal tenê waxt vêrd ra, cênîka kokime nara kî Memedî de nîyada huye û eve vengêde wes û nerm va ke:

– Mi qeda biguretaye, mi ti nas nêkerda. Mi nêzona ke ti Dêsmiz a, ma ra wa. Qedayê binê lingonê to cên, tu nêbo qesonê mi ve xo çetin bijêrê, biheredîyêne.

Heto zu ra hen va, heto bîn ra kî destê xo kerd ra derg, cayê misna ra ci û va ke:

– Nîyade, ha cawo ke mîyî te de çerenê, çê ma uza wo. Vêyvê ma estê, domonê ma estê, bê ma şime çê, mêymanê ma be. Kinconê to şume, uwe keme hazir, xo ro ke. Heftêde xo vinde, rawereşîye, têpîya pêyser bê.

Memed oncîya huya, va ke:

– Îzne mi nêdanê. Ewro îtar îme, meste kata some, se keme bêlu nîyo. Bese nêken bêrîne.

Hona ke êy na qesê xo newe qedêno kî, vîrrike amê pirodayêne, esker eve lerze, her het ra vost şî hurêndîya îştîma de bî top. Aye de Surginan pers kerd va ke:

– Çuwa wo, çik o, se bîyo ke?

Memedî va:

– Herv esto, endî some herv.

Cênîka kokime sas kewte ci, hen motê Memedî bîye û va ke:

– Wîy! Herv çik o? Çê ma nîna, di-hîrê rojî mêyman nêbena?

– Naza eskerîye wa, seva çîyê henênî firsend ma nêdanê najnî. De musade bidê mi, endî ez şêrîne.

– Ti mecbur a, gerek şêrê?

– Ya, eyî va ke.

Na çekûyan ra dime zuvinî ra xatir wast, Memed bî ra rast, eve lerze hetê cayê îştîma ser şî. Waxto ke şî kî, cênîka Hêyderize boyna ci rê minete kerdêne.

Waxtêde kilmek ra dime, esker kewt ra raye. Hondo ke Boyabat ra durî nêkewtîvî kî, çimê Memedî, boyna surginanê Dêrsîmî ser o bî. Qesê ke wertê dêy û dîne de vêrdîvî ra, hata ke şî Sînop, di rojî aqil ra qe nêvejîyayî. Vengê cênîka kokime hona gos de bî û vatêne, "Wîy ve mi ro bo! Nê no na wo ma



ra wo! Na wo zonê ma qesêy keno!”

Waxto ke kewtî Sînop kî, mordemî hen zonêne ke ceznê amo, êy pîroz kenê. Sarê şaristanê Sînopî, nahet-dohetê rayan de amevî pêser, eve zerro pak, eve huyayîş eskerî de nîyadêne. Çiqaşî ke mordemê ke şaristan îdare kenê, înan sava na karî plan virastîvî, hemeg serf kerdîvî kî, wastena miletî ve xo kî têpîya henêne bîye. Waxto ke vinetî, çadirî sanay ci, nara kî eskerî nîyada ke sarê Sînopî mîyî kerdê topî, sare birnê, gost kerdo hazir ke esker va buro xo mird kero. Çorum ra va nat, raya virêne bîye ke esker zê vatene xo wareşîyêne ra û pîzê xo kerdêne mird.

Ê rozû ra dime halo ke Memedî dîvî, boyna dêy ser o fikir kerdê, surginê Dersîmê ke Boyabat de têy qesêy kêrdîvî, yê ardê verê çimonê xo. Yîne çî turî eskerî ra xuye kerdê, tersêne; sarê Sînopî çî turî ci ra hes kerdê û wayîr vêjîyêne! Çi ferqêde girs bî? Eke wertê Kirmancîye de esker nîya cayê de bivêjîyêne, xof û ters kewtêne zerrê miletî. Waxt bî ke zofîne, seke esker dî, remêne, çê ra durî şîyêne. Esker, wertê dîne de qesa xiravine bîye, êşkence bî, qirkerdiş û surgin bî. Hama Sînop de çîyêde henê çînebî. Sarê Sînopî vatê ke:

– Eke cendermû hesav mekerîme, ma rêyê Seferberlîgîye Virêne de esker dîyo, rêyê kî nika, sirê hervê Hîtlerî de vêneme.

Ferq çîqaşî gîrs bî. Îsonê hurdî hetû wayîrê di dînyawû bî û na dînyayî zuvinî ra zaf durî vinetêne.

Endî a roze ra têpîya kî eskerîya Memedî Sînop de vêrde ra. Serre 1941 bî û Herbê Dînya yê Didîne devam kerdêne. Dotê Sînopî, Dengizê Şîyayî û hardê Rusya ser o hervêde giran bî. Halê Tirkîya kî bêlu nêbî. Her deqa, her sanîya, mumkun bî ke herv kewtêne. Na sevev ra gore kî eskerîye zor vêrdêne ra. Ters dêyme zerrê eskerî ra nêvejîyêne.

Heto bîn ra, ziddê raza virêne, wertê eskerî û gelî de kî hama hama ke elaqe çînebî. Sayeke dorme ro eskerî cêrîyavî. Hama oncîya kî Memed heqa Sînop û sarê Sînopî de tayê çî misêne, yê nas kerdêne.

Rozê hurêndîya novetî de bî, nîyada ke komê cênî û cuwamerdî ha yê dot ra yêne; boxê, vosnê û kelê ver o, ramenê. Hîrêmena hêywanî kî zof xo dest de bî. Boxe, hurêndîya xo de nêvînetî, nahet-dohetî ser remêne û boyna herrese kerdêne. Eke amêy bî nêjdî, Memedî pers kerd va ke:

– **Birayêne**, texmîne sima çik o, sima suke de nîne çî ra rosenê?

Yîne va:

– Ma nayîne nêroseme, nê qirvan ê esker axa.

– Hala hala. Çî qirvan ê ke?



Cuwamêrdû ra juyî aye de uşîra destê xo kerde ra derge, wertê dengizî de ada misnê ra ci û va ke:

– Esker axa, ti nêzonena. Dêrsim vanê welatê esto, uza ra waxtê de mordemê ardo îta, naza merdo. O mordem wayîrê sirr û kiramete bîyo. Nîyade ha cawo ke sipê keno, turva dêyî uza ra. Na qirvanû beme uza sare birtname. Korî û nêweşî sonê a turva ser, benê rindî, dot ra wes yê nê. Turva, turva Şix Silemanî ya.

Memedî qal nêkerd ke eve xo Dêrsîm ra wo. Xo na ro nêzonayêne û pers kerd, va ke:

– Hewû ma na Dêrsîm kamecî het ser kuno ke?

Mordemekî va ke:

– Esker axa, ma nêzoneme, hama ma pers kerdo, vanê hetê Erzurimî der o.

Na qesî ra têpîya kî va ke:

– To rê bara to gostê qirvanî bîyarîme?

Memedî va:

– Sima hata bîyarê ez naza ra son. Novetî vurîna, Heq razî bo.

Eve o qêyde yê kewtî durî şî. Xêlê waxt dîne dime nîyada, o ra têpîya kî dest na pira mesela Şix Silemanî ser o fikirîya. A raya virêne nêbîye ke Memedî namê Şix Silemanî hesnêne. Eke amêvî Sînop nêamevî, çond rêy bî ke milletî ci rê meselê dêyî qesêy kerdêne. Vatene ra gore, Şix Sileman waxtê pasayî de surgin kerdo, rusno Sînop. Eke tayê waxt uza mendo kî ponc mordemanê xo yê ke têy amê, ci ra musade wasto, vato:

– Apo, eke îzna ma dana, ma xo rê endî şîme çêwonê xo.

Şix Silemanî vato:

– Oxirê sima ve xêr bo apo gorî. Mevindê, era raye kuyê şêrê. Qe metersê, sima raye ra kederê nêvênenê, sonê resenê çê. Ez kî meste sodir çî turî ke bimbarekê rojî silam da, miren. Ê mi endî tamam a.

Roza bîne rasti kî, seke tîjî vêjîna, Şix Sileman dîna xo vurneno. Waxto ke mêyîtê dêy şunê kî, ayê ke lewe der ê ecayîv de manenê. Çî turî ke heto ju şunê qedenenê, eke sire yêno heto bîn, Şix Sileman eve xo, xo çarneno heto bîn. Naye ser o xevere danê xocû û zonawoxû, yîne anê pê ser ke hala no çuwa wo, çik o bizonêne. Pêyê conî, xocê vano ke:

– Na mordem wayîrê sir û kiremete wo. Mordemê nîyanênî nêmirenê, honde ke dînya xo vurnenê.

O ra dime, ada ke te de surgin de bîyo, êy pulê daye ra danê we, mezele kenê sipê, millet kî uza jîyare qewil keno, yêno ser o qirvanû sare birneno,

minete keno. Wela mezela dêy zê teverikî benê çêwonê xo. Ayê ke zêde amêne mezele ser kî Çerkezî bî.

Heto bîn ra Memedî Heqa Şix Silemanî de tayê çîyê bînî zonêne ke, xevera sarê Sînopî ci ra çînebîye. Şix Silemanî ra Dêrsîm de Dewrês Sileman ya kî Sêy Sileman vajîyêne. O, pîlê Kurêşû bî. Pîr bî. Dêrsîm de kî milletî o wayîrê kiramete zonêne, ci rê hurmet kerdê, lew nêne dest ra. Merdena dêy ra dime, xêlê cawû de sarê Dêrsîmî turva dêy ser o sond werdê û vatêne:

– Ser vê Turva Dewrês Silemanî ya ada Sînopî bo.

Eke vengê çêverî ra cineqîya we, ame ra xo ser, cêra ra, nîyada; tornê xo bî. Mektev ra amêne. Daye de eve huyîyîş çimî çarnay ra zuvinî ser û domanî nêvînetî, tekî şî kewtî oda xo.

Memed ecayîv de mendîvî. He ya; eke amevî Alemanyâ nêamevî, zêde kî ke amevî suka Duîsburgî, zaf fikirîyêne, rew-rew xo ra şîyêne. Hama xoraşiyayîşê na raya pêyêne kî zêde bî. Hen bîvî ke bine ra xo kerdîvî vîndî, poncas serre ra zêde pêyser şîvî, kevtîvî ve rozanê eskerîye. Rêyna bîvî esker, rêyna Çorum ra şîvî Sînop, rêyna uza surginê Dêrsîmî dîvî. Waxto ke na meselî ser o nîya vînet kî, xaftela, hen xorî ra, têpêy zerrê xo ant we. Naye ser o, cênîya xo pers kerd va ke:

– Se bî oncîya?

Memedî, pençero ke têy nîyadêne, do pençere ra çimê xo durî nêfîstî û eve vengêde barî û pêrsan va ke:

– Ma kamî vatêne ke nêjdîyê heştayserre de ez mecbur ben çê xo terk ken cênîkî? Kamî vatêne ke surgin na raye kî yêno, qemetîno yaxê ma ra? Kamî vatêne ke serra hazar û new se wû neway û çorîne de, dewî rêyna yê nê riznayîş û vês nayîş; milletî ra vajîno ke "sima ya naza ca verdanê sonê, ya kî mîrenê". Kam bawer kerdê ka na eve milletî bena? Serra hîris û heştî de qe ke nê, ca misnênê ra surginû, zêde-kêmî hêgayî dênê ci. Na raye aye kî nêkenê. Vanê "terk kerê şêrê, kata sonê şêrê, se kenê bikerê". Zalimû nêverda ke pêniya amrê xo çê xo de ravîyarnîne, hardê xo de bimîrîne. Dêrsîm kotî yooo; Elemanîya de Duîsbug kotî yo! Çi karê minê kokimî nazawû de esto? Hi, çi karê mi esto?

Siro ke qesê xo qedena kî, hayî ro ci nêbî ke lîskanê cênîye de hêsirî gir bîyênê amênê cêr.

# DİMİLKÎ DÎ NERÎ Û MAKÎ

**Haydar Diljen**

**Z**ey xeylê meselandê zîwanî ê bînan, meseleda nerî û makî ser o zî bol çî niyameyê nuştiş. Min bi xo zî na mesela ser o karêndo hera û derg nêkerdo. Min, tenya çimên ci ser ra çarna û nê qaydeyê cêrênî dî. Ez do demena tepya na mesela ser o qorna vindera.

Eza nika ferhengêdê Dimilkî-Tirkî ser o xebitêna. No karê ferhengî, do roşinkerdişdê tayn meselandê gramerî ê bînan û nê babêtê nerî û makey ser o zî yardim bikero. Yanê bi kilmey a, ez do qorna ageyra na mesela ser. Bi no awayo ki no nuşte ewro çap biyo, gerek kes zey nuşteyêdê munaqêşî bewniyo ci ra. Ez winî bawer a ki, embazê ki zîwan û Dimilkî ra fam kenê, çî bi feka û çî zî bi nuştişa, ki nê nuşteyê min û nuşteyê bînê ki bi Dimilkî ya yan zî Dimilkî ser o nusiyayê û ê ki nûsênê, munaqêşe bikerê û rayanê xo vajê, do halkerdişdê tayn meselandê zîwanî ê bînan di zî xeylê gamê ravey bêrê eştîş.

Min di nê nuştêdê xo yê babetdê nerî û makî ser o, Dimilkîya çorşmedê Sêwregi esas girota. Embazê ki Dimilkîya mintiqandê bînan zanê û zîwanî ra fam kenê, ki bişê bidê pê ver, dima ma do bişê ci ra tayn qaydeyanê ûmûmî vejê.

**Haydar Diljen**  
(1951 -Sêwreg)  
Kitêba wî ya dawî:  
**Destpêka**  
**Rêzimana Kurdi**

Zeki şima do cêr di zî bivîni, di giramerdê Dimilkî di mesela nerî û makey meseleyênda bol muhîm a. Tesîrê nerî û makey hem naman, hem sifetan, hem zamîran û hem zi fiilan ser o esto. Ki na mesela rind roşn nêbo, raştnuştîşê Dimilkî bol zehmet o. Jo ra, roşinkerdişdê na mesela rê karêndo hewna vêşî, derg û hera lazim o.

Ez di nê nuştêde xo di, kamcî babet kelîmey bi seredê xo ya nerî yê, ya zî makî yê û kamcî kelîmey îstisna yê, ser o vêşî nêvînderda. Çunkî qandê ki kes bişo na kiştada mesela ser o vîndero, gerek kes kelîman hemînê ra biewniyo. Zeki min va, ez a bi xabatda ferhengî ya xebatênda wina zî kena. Yanê wexto ki ez fina ageyra na mesela ser, ez do babetandê kelîman ser o zî tayn çîyan binûsa û îstisnayan veja meydan.

Ez pawena ki embazê ki zîwanî ra fam kenê, nê nûştêyê min ze nuştêyêndê munaqêşî qebûl bikerê û ser o munaqêşe bikerê ki ma binkeyanê qaydandê zîwandê xo vejê meydan û bi goşt û gonî kerê.

Ez texmîn nêkena ki di lehçe û zîwanandê mîletandê bînan di rolê mesela nerî û makîyey wina gird bo. No babet, di lehçada Dimilkî di cayêndo ciya gêno. Mesela, bewniyê, hema hema namey pêro, bi seredê xo ya, ya nerî yê ya zî makî yê. Hetta xeylê sifetî zî bi seredê xo ya sufîksê makîyey gênê.

Nika çend xisûsê ki bi xebatênda kilm a kewtî min çîman ver, ez do jew bi jew cêr di rêz kera. Ki şima biwanê, şima do bivîne, zîwanêno ki bi semedê yasaxkerdişî ya heta nika zaf niyameyo nuştîş û koyan ser o pa qalî biyê senî wahêrê qaydeyan o!

1. Sifetî xoser notr ê. Labirê goreyê nameyo ki wesfê ci danê, sufîksê nerî yan zî makî gîne.

### MÎSAL:

awa girênayê	saya sûri	nano teze	kêbero girote
cewo girênaye	goliko sûr	awa tezê	pencer(ey)a girotê

2. Heme çiyê ki nameyê ci bi herfda "i" ya qedênê, makî yê.

### MÎSAL:

heri, estori, nani, soli, goliki, engûri, qelema, awi, legani, gozi, encîli, lingi, kergi ....

3. Heme sifetê ki wesfanê çiyandê makîyan danê yan zî bi awayên a alaqeyê ci bi çiyêndo makî esto, bi vengê "i" ya qedênê.<sup>1</sup>

**MÎSAL:****NERÎ**

'alim  
aboqat  
adir  
adirên  
alçax  
Alman  
asnên  
bêaqil  
bêbin  
bêfesal  
bêhal  
bej  
bêkar  
bêkes  
belek  
belengaz  
bênamûs  
bengin  
berber  
bergîr  
berz  
bêşeref  
bêveng  
bêwahêr  
bewran  
biaqil  
binên  
bizêk  
cambaz  
camûs  
casûs  
cayîl  
cemedin  
cêrên  
cesûr

**MAKÎ**

'alimi  
aboqati  
adiri  
adirêni  
alçaxi  
Almani  
asnêni  
bêaqili  
bêbini  
bêfesali  
bêhali  
beji  
bêkari  
bêkesi  
beleki  
belengazi  
bênamûsi  
bengini  
berberi  
bergîri  
berzi  
bêşerefi  
bêvengi  
bêwahêri  
bewrani  
biaqili  
binêni  
bizêki  
cambazi  
camûsi  
casûsi  
cayîli  
cemedini  
cêrêni  
cesûri

**NERÎ**

ciwan  
comerd  
corên  
çeleng  
Çerkez  
çetelin  
çewt  
çilek  
çirax  
deyndar  
dişmen  
durist  
embaz  
embiryar  
Ereb  
esmer  
gird  
golik  
her  
hêsîr  
hêtîm  
heval  
îmansiz  
îxtîyar  
kavir  
kej  
kerdox  
kilm  
koçer  
kokim  
kor  
Kurd  
lal  
lalek  
leyr

**MAKÎ**

ciwani  
comerdi  
corêni  
çelengi  
Çerkezi  
çetelini  
çewti  
çileki  
çiraxi  
deyndari  
dişmeni  
duristi  
embazi  
embiryani  
Erebi  
esmeri  
girdi  
goliki  
heri  
hêsîri  
hêtîmi  
hevali  
îmansizi  
îxtîyari  
kaviri  
keji  
kerdoxi  
kilmi  
koçeri  
kokimi  
kori  
Kurdi  
lali  
laleki  
leyri

**NERÎ**

mahkûm  
malîm  
merezin  
mesûl  
meymûn  
mindûr  
munasib  
mûyin  
namdar  
nebaş  
nêweş  
niçar  
nuştox  
parên  
patron  
payeker  
pêlin  
pemeyin  
pêrarên  
pereyên  
perîşan  
pîs  
pirûzin  
pisîng  
pit  
porderg  
porkej  
qulin  
qûnek  
qurnaz  
raşt  
rind  
rişkin  
saf  
saxlem  
sêkurr

**MAKÎ**

mahkûmi  
malîmi  
merezini  
mesûli  
meymûni  
mindûri  
munasibi  
mûyini  
namdari  
nebaşi  
nêweşi  
niçari  
nuştoxi  
parêni  
patroni  
payekeri  
pêlini  
pemeyini  
pêrarêni  
pereyêni  
perîşani  
pîsi  
pirûzini  
pisîngi  
piti  
pordergi  
porkeji  
qulini  
qûneki  
qurnazi  
raştî  
rindi  
rişkini  
safi  
saxlemi  
sêkurri

**NERÎ**

serd  
serdin  
sererût  
serewişk  
serqot  
serxoş  
Sêwregij  
sûr  
sûkij  
sûtal  
şagird  
şaristani  
şaş  
şehîd  
şenik  
şêr  
şerefsiz  
şermok  
şêx  
şîrin  
tembel  
teng  
tercuman  
tersokin  
tersonek  
teyr  
teyşan  
tirş  
topal  
tozin  
turîst  
verek  
verên  
verg  
veyşan  
vîsol (bêsol)

**MAKÎ**

serdi  
serdini  
sererûti  
serewişki  
serqoti  
serxoşi  
Sêwregiji  
sûri  
sûkiji  
sûtali  
şagirdi  
şaristani  
şaşi  
şehîdi  
şeniki  
şêri  
şerefsizi  
şermoki  
şêxi  
şîrini  
tembeli  
tengi  
tercumani  
tersokini  
tersoneki  
teyri  
teyşani  
tirşi  
topali  
tozini  
turîsti  
vereki  
verêni  
vergi  
veyşani  
vîsoli (bêsoli)

<b>NERÎ</b>	<b>MAKÎ</b>
viran	virani
viste	vistê
wendox	wendoxi
werdêk	werdêki
xasek	xaseki
xizmetkar	xizmetkari

<b>NERÎ</b>	<b>MAKÎ</b>
xort	xorti
xoz	xozi
yeman	yemani
yar	yari
yaşil	yaşili
zengîn	zengîni

4. Sifetê ki bi vengdê "e" ya qedênê, wexto ki wesfê çiyêndê **makî** danê, "e" virêna, bena "ê"

**MÎSAL:**

<b>NERÎ</b>	<b>MAKÎ</b>
amorde	amordê
arêdaye	arêdayê
ageyraye	ageyrayê
cemindiyaye	cemindiyayê
cîngene	cîngenê
cikerde	cikerdê
çarnaye	çarnayê
nêmende	nêmendê
nêpawite	nêpawitê
nêresaye	nêresayê
nêşermaye	nêşermayê
nêwende	nêwendê
nîmçe	nîmçê
nîmserre	nîmserrê
nîşankerde	nîşankerdê
niminte	nimintê
padiskinaye	padiskinayê
perşikite	perşikitê
pewjiiyaye	pewjiyayê
pewte	pewtê
pînekerde	pînekerdê
qabkerde	qabkerdê
qesnaye	qesnayê

<b>NERÎ</b>	<b>MAKÎ</b>
rakewte	rakewtê
ramyaye	ramyayê
remaye	remayê
remnaye	remnayê
resaye	resayê
ronište	roniştê
serepište	serepiştê
sereşikite	sereşikîtê
şeliqiyaye	şeliqiyayê
tadaye	tadayê
taşte	taştê
telebe	telebê
tepište	tepiştê
tirawite	tirawitê
veşate	veşatê
vinîbiyaye	vinîbiyayê
viraşte	viraştê
viste	vistê
waşte	waştê
wende	wendê
xapênaye	xapênayê
zanaye	zanayê
zewijiyaye	zewijiyayê

## 5. Sifetê Îşaretkerdeni:

Sifetê îşaretkerdeni, qandê çîyandê nerî û makîyan ciya ciya yê:

NERÎ

o (qandê çîdê dûrî)

no (qandê çîdê nezdî)

MAKÎ

a (qandê çîdê dûrî)

na (qandê çîdê nezdî)

BOLAMORÎ<sup>2</sup>

ê (qandê çîdê dûrî)

nê (qandê çîdê nezdî)

### MÎSAL:

O lajek birayê min o.

No kutik har o.

A keyneki waya min a.

Na keyneki xasek a.

Ê keynekî xasek ê.

Nê kutikî har ê.

"Ê" jûjû finê qandê jewomordê<sup>2</sup> çîdê nerî zî yena bikaramyayış.

### MÎSAL:

Ê henarî bidi min.

Ê kutikî girêdi.

## 6. Fîlê biyayîşî<sup>3</sup>:

a. Ki failê cumla, **makî** û jewamor bo, fîlê biyayîşî, beno "a".

b. Ki failê cumla, **nerî** û jewamor bo, fîlê biyayîşî beno "o".

c. Bolamorê wirna cinsan zî beno "ê".

### MÎSAL:

Qelema min sûr a.

Defterê min sûr o

Çimê min siya yê

Porê min siya yo.

Zinciya min siya ya.

Giştê min barî yê

d. Ki mexsedê kesî failêndo nerî bo, di şexsdê jewamorî ê didini di zî fîlê biyayîşî beno "ê".

### MÎSAL:

### ÇEND MÎSALÊ BÎNÎ:

Ez xasek a	Ma xasek ê.	Ti jêhatî ya. (makî) / <i>Ti jêhatî yê. (nerî)</i> Ti bejnderg a. (makî) / <i>Ti bejn derg ê. (nerî)</i>
Ti xasek ê	Şima xasek ê.	
Ti xasek a	Ê xasek ê.	
O xasek o		
A xasek a		



### 7. Zamîran di nerî û makî:

Di Dimilkî di, di grûbî zamîrê şexsî estê. Zamîrê şexsdê hîrini, qandê nerî û makî ciya-ciya yê. Qandê nerî **o/ ey**, qandê makî zî **a/ ay** bi kar yeno.

#### Grûba I

ez

ti

o

a

ma

şima

ê

#### Grûba II

mi (min)

to

ey

ay

ma

şima

eyna

#### **MÎSAL I**

Vizêr **o** ame kê ma. (Na cumla di mexsed nerî yo.)

Vizêr **a** amê kê ma. (Na cumla di mexsed makî ya.)

**O** dersi dano min. (nerî)

**A** dersi dana min. (makî)

#### **MÎSAL 2**

Ey min rê say ardî. (nerî)

Ay min rê say ardî. (makî)

Ez **ay** ra bol hes kena. (makî)

Ez **ey** ra zî bol hes kena. (nerî)



## 8. Fiîlan ser o tesîrê nerî û makî

(Min tiya di tenya hîrê wextê fiîlan ê esasî girotê.)

### A • Fiîlê îtranstîfî

#### DEMEYO NIKAYÊN

##### Faîl nerî

Arjen o yeno.

Arjen o şino.

Arjen o rakewno.

Arjen o werzeno.

Arjen o bermeno.

Arjen o huweno.

Arjen o kixeno.

Arjen o winêno.

Arjen o remeno.

##### Faîl makî

Roşna ya yena.

Roşna ya şina.

Roşna ya rakewna.

Roşna ya werzena.

Roşna ya bermena.

Roşna ya huwena.

Roşna ya kixena.

Roşna ya winêna.

Roşna ya remena.

##### Faîl bolamor

Arjen û Roşnaya yê yenê.

Arjen û Roşnaya yê şinê.

Arjen û Roşnaya yê rakewnê.

Arjen û Roşnaya yê werzenê.

Arjen û Roşnaya yê bermenê.

Arjen û Roşnaya yê huwenê.

Arjen û Roşnaya yê kixenê.

Arjen û Roşnaya yê winênê.

Arjen û Roşnaya yê remenê.

a. Ki faîl nerî bo, hem faîl û hem zî fiîl sufiksê nerîyey, yanê "o" gênê.

b. Ki faîl makî bo, hem faîl û hem zî fiîl sufiksê makîyey "a" gênê.

c. Ki faîl bolamor bo, fiîl sufiksê bolamorey "ê" gêno.

#### DEMEYO VIYARTE

##### Faîl nerî

Arjen ame.

Arjen şî.

Arjen rakewt.

Arjen werişt.

Arjen berma.

Arjen huwa.

Arjen kixa.

Arjen winya.

Arjen rema.

##### Faîl makî

Roşna amê.

Roşna şî.

Roşna rakewti.

Roşna weriştî.

Roşna bermê.

Roşna huwê.

Roşna kixê.

Roşna winyê.

Roşna remê.

##### Faîl bolamor

Arjen û Roşna ya amey.

Arjen û Roşna ya şîy.

Arjen û Roşna ya rakewtî.

Arjen û Roşna ya weriştî.

Arjen û Roşna ya bermay.

Arjen û Roşna ya huway.

Arjen û Roşna ya kixay.

Arjen û Roşna ya winyay.

Arjen û Roşna ya remay.

Di wextê viyarte (ravêrde) ê fiildê **ameyişî**, şexisdê jewamorî ê hîrini di:

a. Ki faîl nerî bo, fiîl bi vengdo "e" ya qedêno.

b. Ki faîl makî bo, no vengo "e" virêno bena "ê". Yanê fiîl bi "ê" ya qedêno.

c. Ki faîl bolamor bo, "e" dima vengo "y" yeno û no vengê "y", bolamoreya faîlan misneno.

## DEMEYO AMEYOX

### Faîl nerî

Arjen do bêro.  
Arjen do şiro.  
Arjen do rakewo.  
Arjen do werzo.  
Arjen do bibermo.  
Arjen do bihuwo.  
Arjen do bikixo.  
Arjen do biewniyo.  
Arjen do biremo.

### Faîl makî

Roşna do bêro.  
Roşna do şiro.  
Roşna do rakewo.  
Roşna do werzo.  
Roşna do bibermo.  
Roşna do bihuwo.  
Roşna do bikixo.  
Roşna do biewniyo.  
Roşna do biremo.

### Faîl bolamor

Arjen û Roşna ya do bêrê.  
Arjen û Roşna ya do şirê.  
Arjen û Roşna ya do rakewê.  
Arjen û Roşna ya do werzê.  
Arjen û Roşna ya do bibermê.  
Arjen û Roşna ya do bihuwê.  
Arjen û Roşna ya do bikixê.  
Arjen û Roşna ya do biewniyê.  
Arjen û Roşna ya do biremê.

Di demeyê ameyoxî di, faîl kamcî cins ra beno wa bibo, kişta nerî û makî ra tesîrê ci fiîlî ser o çiniyo.

## B • Di fiilandê transtîfan di tesîrê nerî û makî:

### DEMEYO NIKAYIN

### Ki obje nerî û jewamor bo

Ez a goştî hewadana.  
Ez a goştî wena.  
Ez a goştî werdi kena.  
Ez a goştî erzena.  
Ez a goştî lete kena.  
Ez a goştî vila kena.  
Ez a goştî cawena.  
Ez a goştî guvişnena.

### Ki obje makî û jewamor bo

Ez a engûri piloznena.  
Ez a engûri wena.  
Ez a engûri cikena.  
Ez a engûri erzena.  
Ez a engûri lete kena.  
Ez a engûri vila kena.  
Ez a engûri cawena.  
Ez a engûri guvişnena.

### Ki obje bolamor bo

Ez a henaran piloznena.  
Ez a henaran wena.  
Ez a henaran werdi kena.  
Ez a henaran erzena.  
Ez a henaran lete kena.  
Ez a henaran vila kena.  
Ez a henaran cawena.  
Ez a henaran guvişnena.

Di antişdê demeyê nikayin ê fîlandê transtîfan di, nerî û makî biyayiş yan zî jewamor û bolamor biyayişê objeyan, fiîlî ser o tesîr nêkeno.

### DEMEYO VIYARTE

**Ki obje nerî û  
jewamor bo**

Min goşt pilozna.  
Min goşt werd.  
Min goşt werdî kerd.  
Min goşt eşt.  
Min goşt lete kerd.  
Min goşt vila kerd.  
Min goşt cawit.  
Min goşt guvişna.

**Ki obje makî û  
jewamor bo**

Min engûri piloznê.  
Min engûri werdi.  
Min engûri cikerdi.  
Min engûri eşti.  
Min engûri lete kerdî.  
Min engûri vila kerdî.  
Min engûri cawiti.  
Min engûri guvişnê.

**Ki obje bolamor bo**

Min henarî piloznay.  
Min henarî werdî  
Min henarî werdî kerdî  
Min henarî eştî  
Min henarî lete kerdî.  
Min henarî vila kerdî.  
Min henarî cawitî  
Min henarî guvişnay.

Fiîlê transtîfî ê ki kokê ci bi "a" ya qedênê:

- Ki cumla miyan di obje nerî û jewamor bo, fiîlo transtîf ti sufiks nêgêno; yanê herfa "a" nêvirêna û zey xo manena.
- Ki obje makî û jewamor bo, vengê "a" virêno beno "ê".
- Ki obje bolamor bo, fiîlo transtîf herfa "y" gêno.

Fiîlê transtîfî ê ki kokê ci bi herfênda konsonant a qedênê:

- Ki cumla miyan di obje nerî û jewamor bo, fiîlo transtîf ti sufiks nêgêno.
- Ki obje makî û jewamor bo, fiîlo transtîf vengê "i" gêno.
- Ki obje bolamor bo, vengê "i" virêno, beno "î". Yanê fiîl bi "î" ya qedêno.

## DEMEYO AMEYOX

**Ki obje nerî û  
jewamor bo**

**Ki obje makî û  
jewamor bo**

**Ki obje bolamor bo**

Ez do goştî bipilozna.	Ez do engûri bipilozna.	Ez do henaran bipilozna.
Ez do goştî bûra.	Ez do engûri bûra.	Ez do henaran bûra.
Ez do goştî werdî kera.	Ez do engûri werdî kera.	Ez do henaran werdî kera.
Ez do goştî bierza.	Ez do engûri bierza.	Ez do henaran bierza.
Ez do goştî lete kera.	Ez do engûri lete kera.	Ez do henaran lete kera.
Ez do goştî vila kera.	Ez do engûri vila kera.	Ez do henaran vila kera.
Ez do goştî bicawa.	Ez do engûri bicawa.	Ez do henaran bicawa.
Ez do goştî biguvişna.	Ez do engûri biguvişna.	Ez do henaran biguvişna.

Zeki cor di zî aseno, antişdê demeyê ameyox ê fîlandê transtîfan di, ki obje jewamor bo zî, bolamor bo zî, kişta nerî û makî ya tesîrê ci antişdê fîlî ser o çiniyo.

### Çend notê peyênî

1. Kelîmeyê ki nameyê heywanandê makîyan ê, heme makî yê.

#### **MÎSAL:**

kergi, bizi, bewrani, kaviri, goliki, mî, heri, estori, mirîçiki, xezali, delfergi, pisîngi, arwêşi, bergîri, manga

2. Heme kelîmeyê ki nameyê cinîyan ê, makî yê.

#### **MÎSAL:**

Berfîki, Fati, Roşna, Şîlani, Bewrani, Gewri, Sosini, Nalîni, Besi, Besiki, Siltani, Pemi, Reşîki, Besna, Werfîki, Delali, Xezali, Nûri, Îmxani,

Kelîmeyê ki nameyê camêrdan ê, nerî yê

Azad, Osman, Haydar, Siwar, Remzan, Arjen, Mehmed, Elî, Mirad, Firat, Zinar, Mehmûd, Bawer, Silêman, Nedîm.

3. Sifet û nameyê ki alaqeyê ci bi cinîyan yan zî çiyênda makî esto, pêro makî yê û ê ki alaqeyê ci bi camêrdan yan zî bi çiyêndo nerî estê pêro nerî yê.

## MÎSAL:

*makî*

veyvi, xalî, 'emi, kebanî, vistirî, keyna, keyneki, dêmari, way, wayeki, cinî, dedkeyna, wendê, xaseki, sûri

*nerî:*

bira, ap, pî, xal, xalza, dedza, camêrd, lajek, sûr, sipe, wende, xasek

---

<sup>1</sup> Kelîmeyê ki kîştâ Sêwregî, Maden, Pîran û Çêrmûg di bi "i" ya qedênê; kîştâ Dêsimî di bolkî bi "e" ya qedênê. Yanê "i" kîştâ Dersimî di bena "e".

<sup>2</sup> **jewamor** = yewhûmar, **bolamor** = zafhûmar,

<sup>3</sup> Goreyê M. Ciwanî, no fiil, fiilê **biyayîşî** niyo, ê **estbiyayîşî** yo. Biewinî Kitabdê M. Ciwanî "Kürtçe Dilbilgisi", riper: 106.

# BİRARO

## Se'îd Kawe

**Ş**ewî payîz e, şewêkî kîrrûmat. Xelkî şar be bîrî beyanî w rojbûnewe seriyân nawetewe. Jin û piyaw, wîrd û dirîşt, le xurabî xew dan.

Şekrê, dayikî mindalî bêderû, be xem û jarewe xewtuwe. Tarîk û rûnî beyanî le xew raperî. Hemû leşî reseraw kewtibû. Xewnêkî naxoşî dîbû. Şemal û Mamelî kurî bo nan degîryan.

Le ber Gulaley xuşkiyan deparanewe naniyan bidatê. Be anîskdan lêyan depîrsî:

– Bo çi nandênî lê daxîstûyin nanman nadeyey?

– Kure çi nandên, nandêtan lê girtûmetewe? Lew male da key nan be ejmar bûwe, key nan le nandên nirawe w qufil û qerazey wêxirawe? Bo bawerim pê naken, ke delêm nan niye? Wella bîlla taqenanêkî tê da ye, ewîş bo kake Simkoy biratanim helgirtûwe. Bo xotan dezanin ew şew nore kêşkiyetî. Êsta be bîrsîyetî dêtewe. Xo debê pariwe nanêk hebê bîxwa. Bo xotan êwarê beşe nanî xotan xwardiwe. Ewîş beşî Simko ye w natandemê. Minîş wek êwe bîrsîme, belam çare niye debê bew bîrsîyetîye bisazêyin.

Şekrê bew welame naxoşey Gulale wexeber hatibû.

**Se'îd Kawe**  
(1939 - Alyawa)  
Kitêba wî ya dawîn:  
**Jwan**

Rojî pêştir bîstibûy çend mindalî kesk û sûr le birsan mirdibûn.

Şekrê tasa bû. Lêfekey le ser xoy tûr helda w be nîwe tarîkî çawêkî gêra, Şemal û Mamel û Gulale nûstibûn û le şîrin xewî xoyan da bûn. Be sipayî le cêgakey hate der û serêkî nandênî da. Pênc nanî têda bû. Ahêkî hatewe ber û le ber xoyewe gutî:

– Le kone we gutûyan, xewn be rawejûn, diyar e rast e. Çakeşukur pênc nanman heye, dena taqenanêk be dimî kê daderê? Simko be birsî w mandûyî bêtewe w nan nebê bîxwa şêt debim. Carî-caran îş be malî drawsêkan bilêm çend nanêkim denê dwayî deçime bazar dekirim û botan dênimewe. Kê nan be qerz deda? Kê nanî heye? Pêt wa ye carane 'Ebesî babîyan beyanî rast bêtewe biçê nanî germ bênê, be mindalekan bilê: Nanî germ û rone kere w mastim bo hênawin hestin bîxon.

Be naşikurî nebê, pelamar û hêrişî dujmin bo ême rêk kewt. Ay çon be naheq 'Ebeyan şehîd kird û mindalîyan lê hetîw kirdim û debê be bêwejin koşî pêyan rabigem. Be rehmet bê 'Ebe, wîrdî zimanî bû deygut: Dilî mindalan meêşene her çî wîstiyân boyan amade bike. Ke çî êsta filisêk şik nabeyn û ewey Xwa daynawe nîmane lew pênc nane bew la we. Ew îş demêkî dî dexurê bo nîweroj nazanim çî bikem. Xakim be ser, tûştî çî rojêkî reş harûwîn û kes agay le kes nîye. Xwaye du'am qibûl key carêkî dî şer nebêtewe le we man xiraptir be ser bê. Le çî dewr û zemanan da ne dîtrawe w ne bîstrawe, le şarêkî awa gewre da kar û nan dest nekewê w pênc ser xêzan le pênc nan pitir şik neben!

Dek kwêr bim bo binemalêkî têt û pirrî wek malî Hemelas be rojî rûnak le birsan le jûrê da mirdin pêyan şûreyî bûbêne der lem û lew daway nan biken.

Tawêkî dî debê biçim serêkî nanewexanekan bidem belkû hewîr şêlanêk, engut kgirtinêk, yan her karêkî tirî nanewexaneyan hebêt û bim denê, eger be naneêşkeke ş bê, kariyan bo dekem û nayelim mindalekan im birsî bin. Çi qeydi ye ba Gulale ş le gelim bê w kar bika, nanî rojaneke bênînewe bes e.

Belkû bew yarmetîyey Simkoy kurîşim ke be pêşmergayetî werdegrê, bijîn û minalekan çawîyan lem û lew nebê. Xwa bikem Simko selamet bê w le şer û kêşe be dûr bîn, nemir-nejî ş bijîn her razîm.

Şekrê, dirêjey da bew lêkdanewanewe w kend û kojewekanî.

Bilêy ew natebayî w lêk morbûnewane şerîyan lê helnayîsê? Ca çon şer û kêşe nabê? Edî mawêk leme w ber le ser tema' û çawçinokî w ziyadkirdinî kirêy dukandaran agir helnekira, wexta bû germa w pirîşkî hemû Kurdistan bigrêtewe?

Edî kurî xelkîyan be gij yek tirî da nekird? Tika le tikakar birra belkû dest



helgirin, kurî em û ew nekujrê. Sereray ew bezme ş, rêziyan bo pêşniyarî ew hemû gewrepiyawaney siyasî w nûser û...

Danena w gwêyan bo ranegirtin. Belam lawey be dû wişey 'Erebî w Turkî w Farişî destî pê le stoy yek tir kirdin!

Xo eger heta ser bê ewî ş her baş e. Belam aşti be naw pijikerî lawekî birwa nakem dewamî hebê.

Le swêy Simkoy kurim ara w qarawim lê helgîrawe. Ay lew ferhenge naqola w naheze çon le nawman da cê kewtûwe. Be Xway ew ezmûnaney le rabirdûm heye, katêk xo be zil zanîn û berzefirî em û ewim we bîr dêtewe, heqîme bitirsim şerî birakuji helaysêtewe? Dey ca xo gulleş em û ew nanasê. Kwêregulleyek dê w lawêkî wek Simkoy kurim le herdî degewzênê w sed hawar be pûlêk e.

Kê dezanê kurî min le ber çî çekî helgirtûwe? Kê dezanê bira w xuşk û daykî Simko rojê nanêkî wişk dexon û naçar in be zigî birsî helken, bew hîwayey gelekeman rizgarî dê.

Dey be temay Xway, rebî Simko Xwa legel kurî xelkî bitparêzê w berdî sard û germit neyete ser rêy.

Oxey ewe Simko ş hatewe, ya Xwa be xêr bêyewe role. Tu Xwa Simko giyan deng û bas çî ye, bom bigêrewe?

– Bekeyfî to ye daye giyan, ewro serî mang bû yarmetîm wergirt. Hîsabim kirdiwe eger ard bikirîn û bikey be nan, tozêkî dest pêwe bigirîn, mange w mang nanewîşkîyekeman debê. Bo qend û çayeke ş Xwa kerîm e. Dey ca mîwe ş naxoyin. Le mer cil û bergîşewe, be pîne w pero deybeyne ser ta bizanîn çî lê dêtewe.

– Baş e role, to ew hewaley xoşe basit kird bom bigêrewe bizan çîye w çit bîstiwe?

– Daye giyan, gutim hewal xoş e, mandûm, lêmgerê.

– Baş e role, bilê bizanim karxane w kargeyan bo danawîn? Genim, ard û ron û şekir û çaman be ser da dabeş deken? Alaman bo hel deken? Her delêy hewal xoş e, xoş e!?

– Hay hû, hay hû, to her pêt wa ye debê ard û ron û şekir û ew ewman be ser da bibeşnewe, yan karxaneman bo damezrênin. Kiçî dayegiyan xo ew dû hêzana dewlet nîn.

– Dewlet çî ye role? Teqet le ser nebê w piştîwanî lê biken û teba w reba bîn, dewlet wek awkirdinewe wa ye, belam min tirsim le dinedanî jêrewe ye, tirsim le berzefirî w xo be dana w zana zaniyî deshelatdarekan e, witey kesiyen naçête gwê we.

– De baş e daye giyan, rehmet le babit, çonî delêy ba wa bê.

Daykî Simko tawêk rama w çawî le Simko birîbû belkû ew hewalexoşey bo bigêrêtewe w suknayî bê.

Katê zanî Simko bêdeng e w mirteqî le xoy birîwe, gutî:

– Role to bot basî nekird hewale xoşeke çî bû?

Simko serî sûrand bo lay dayikî w be qelsî gutî:

– Kwa hewal le we xoştir e ke cûtedeselatarî Kurdan belênîyan da be xelk û belgenameyan mor kirdiwe, carêkîtir natebayî nêwan xoyan be şerr û kêşe hel neken. Baş e daye giyan hewal le we xoştir? To Xwa ew mizgêniye bo ye nabê şayî w govendî bo bigrîn?

– Rolegiyan to pêt wa ye min xwêndewar im? Yan deçime derê bizanim hewal çî ye? Ewey to şewaw şew bom negêryewe çî dezanim?

Daykî hanayekî hate ber, dway têweramanêk pirsî:

– Erê Simkogiyan! To bilêy ew dewletaney derewe be rastî yarîdeman biden? Yan karîyan heye w dway cêbecê kirdinî îş û karî xoyan, piştman tê deken?

Simko le serexo, wek mamostayek ke qise bo yekêk bika w fêrî bika, be bizay ser lêw destêkî hawîşte ser şanî w gutî:

– To pêt wa ye, karîyan heye w piştman tê deken. Belam min pêw wa niye daye giyan. Meger bo xoman nemanewê w legel yektirî nehawêynewe. Ew kat qisem niye w le wane ye be cêman bêlin û biron piştman têken.

Daykî be ming-ming deyboland û deygut:

– Kwa çîyan bo kirduwîn? Çend sal e dên û deron hîçîyan diyar niye w...

Simko sûr helgera w le dayikî der helbû, be tûndî be dayegiyan, dayegiyan gutî:

– Çende bêbezeyane basî lawekî dekey, bê ewey bizanî çîyan bo kirduwîn.

Edî dayegiyan, xet û sinûriyan bo pelamarder, diyarî nekird, bo ewey netiwanê hêrişman bikate ser derdî gorînman bidatê?

Edî bo bergirî le ême, firokey cengîyan nehênawe le bombaranman biparêzin?

Edî cil û berg û xwardemeniyan bo nehênawîn, bo wey le birsiyetîman rizgar ken?

Xan û medrese w nexoşxane, wêranekaniyan bo çak nekirdînewe. Êstaş her wa xerîk in?

Pareyan bo çap nekirdîn? Bangiyan bo danenayîn? Parekeman le parey derawsêkan be nirxtir niye? Ke deyan sal e dewlet in?

Fêryan nekirdîn parleman helbijêrîn, bo birine serî peristîj û kesayetî

netewekeman? Hereşeyan le Taran û Enqere w Bexda nekird waz le dest têwerdan bînin?

Hezar car amojgariyan nekirdîn, waz le bêne w berew hat û çoy Êran û Êraq û elawla bînîn?

To Xwa daye pêm nalêy çî mawe boman biken? Bo be ser xoman neroyin, gwêman be hîç şitêk nabizwê, her rojê xerîkî bezmêk î n û qwanêk lê dedeyn û qise w bas bo em la w ew la deben.

Daykî be şêwey du' a destî berz kirdewe, dwaye serî daxist û bédeng bû. Bîrî le witekanî Simkoy kurî dekirdewe. Hîway pitirî peyda kird belam le ber nîgranî dwaroj xoy dexwardewe w dilexorpekey her wek xoy bû. Ezmûnekanî xoy we bîr dehatinewe. Hêriş û pelamarî dujminan, kuştarî xelkî bêtawan, şehîdekan, rew, awareyî, zîndan, eşkence, helwasîn, şehîdbûnî 'Ebey mêrdî w dieyan şitî tir û çarereşî tir.

We bîrî hatewe, le kobûneweyek da deyangut: Madam azad î n û le jêr sêberî em û ew da nîn, bîrsî bîn, tûnî bîn, tenanet bêberg û pêlaw îş bîn, xoştir e le destbeserdagîrawî w zebr û zeng le serniwandin.

Witey kurelawekey ew roje le gwê da dezirîngawe ke deygut: Çend dewr û zemanêkî xoş e, bêgane axa w kwêxam niye. Qey naka, be bîrsiyetî ş ray debîrêm, her azadî heldemêsim. Ew azadiyey ke salehay sal e bab û bapîranman hewlîyan bo dawe, le serî gîrawin, qurbanîyan dawe, azar û eşkenceyan le pênavî da dîwe, sardî w germîyan le ser çêştuwe...

Simko awirêkî le daykî dawe w dîtî her wa çote nêw bîr û xeyalat û le nêw dinyay bîrewerî xoy da mele deka. Simko be şêwey dildanewe pîrsî:

– Dayegîyan, pêm bilê le ber çî pejare dewrî dawî werezî? Be xemxwardin çî dekrê?

Daykî bîrî le zor şit kirdibowe, belam neydewîst basîyan bikat. Nebada Simko werez û dilêş bê. Tenya beristeyekî biçûk, wek le ser dû rêyanêk bê mebestî xoy geyand û gutî:

– Le îş û karî xot razî w detewê dirêjey pê bidey?

Simko bew pîrsiyarey daykî, sedan girê û gol û kend û kosp, sedan tarîkî w çarereşî, deyan gir û giriftî binemale w... hate ber zeynî. Deyzanî daykî ne pêy xoş e pêşmerge bê! Ne pêy xoş e waz le berberekanî dijî dujminan bînê. Bo ye be şeke we ew pîrsiyarey lê kird. Simko axêkî helkêşa w gutî:

Dayegîyan, pêşmergeyê bo min îş û kar niye, belkû bîr û birwa ye. Rast e ew yarmetiyey demdenê yarîdederêkî baş e bo jîyanî êwe, belam eweşim nendenê, rêgayekî girtûme ta mirdin dirêjey heye. Rêgayekî helimbijarduwe birwam pêyetî w le xwên û êsk û pilûskim da cêgîr buwe. Dezanîm le

natebayiyey naw xoyan detirsî. Dezanîm xelk la we delên "Xwa biyanbirê ewane her neban baştir bû".

Edî kê hebaye dayegiyan, kê xebatî we rê xistibaye? Pêt wa niye? Eger kesanî tir îş we pêş kewtiban her ewe debûn? Axir ewane le nêw xoman helqulîwin.

Na dayegiyan, ew rêkxirawane her bibin baş e. Axirî rojêk be we degen yek bin û rêgay çarî dûberêkî bidozinewe. Xebat dijî dujminiyan be heq e. Ewan le ser rêgay rast in. Ewan çawsûrman in, palpiştman in. Le hasit dujmin lemperman in. Le wan bew la we kê le serman we ciwab dê? Çend sal bû kam layenî rojawa w rojhelat bergirîyan lê kirdîn, yan we ciwab hatin nemankujin.

Her ewaney xoman in û baştir in. Çunkî ewan le ême pêk hatûn û ême pêk hêneryanîn. Her ême ş bo xoman ewanman geyande hasman. Riwangey to ş rast e dayegiyan, ke delêy dûrengî w xo le yekdî ciyakirdinewe yekî le karexirapekaniyan e. Belê rast e, min îş maweyek e xerîk im fêrî ew şitaneyan debim. Naçar im fêriyan bim. Debê fêriyan bim. Pêwîstîm pêyan e debê biyanzanîm. Bîr nekeyewe ewan pê delên fêriyan bim, na dayegiyan, bawer bike ewan le amojgarî bew la we şitêkî tirim pê nalên. Belam hengawekaniyan hanim deden fêrî ew şitane bim.

Çi bikeyn dayegiyan? Bê pena yin, hîç derûy rûnman niye. Dujmin le regî esto nîzîktir e, bê û biwêrê bicûlêtewe, be çawqûçanêk degate serman û tûşî qureşêlekey caran debîynewe. Naçar im dûrengî w ciyawazî wergirim û le layenekey tir dirdong bim. Bimewê w nemewê eweyan lê fêr debim. Çünke namewê bêlayan bim, danîşim sebrî hatinewey leşkirî dujmin bikem.

Malî Simko wek qutabxane deçû. Simko herçî bîstibay û bîzanîbaye, katê dehatewe bo daykî degêrawe. Şemal û Mamel û Gulaleş le basekaniyan da beşdar û gwê helxer bûn.

Simko zor car be daykî degut: Debê wirya bîn, dujmin le regî esto nîzîktir e. Dujminan hezar û yek nexşey gilawî pîlangêriyan be deste we ye. Deyanewê be her corêkî boyan bikrê, ew hele, baş w ew doxe, rexsawe helkewtuwe, lekîş Kurdan biden.

Hat û çoy neyaran germ e. Le Taran bo Dîmişq, bo Enqere, Bexda... Le bine we debûne mile, debûne milayeket, debûne şêx, mela, îmam... Hereşeker, nawbijîker, qehriyan derijand, be top barin, hare w nerrey firoke, xendik lêdanî ser sinûr, be hêdî w hêminî xokêşane nêw Kurdistan, be dinedan, deste w beste pêkewenan, tema, çek, pare, herweha kirînî em û ew.

Serencam, natebayî, nalêkî, lêk sûrbûnewe, pêk werbûn û pêk helpirjan û kuştin û birîn...

Şekrê le swêy Simko cîngilî dedan. Be werrezî çawî le televîzyon bû. Gwê dabuwe prûpagandî rijîm. Çawî le ser yek danabû. Be şîw û dol û rewezeberdekan û Pîremegrûn û Qendîl û Sêsinûr û deştî Hewlêr û Kerkûk û Sefin da degerra, cwanemerg û winbûwekanî Badîn û Soran û Helebcey dehatinewe bîr.

Êware Simko hatewe. Xemgîn bû, aloz û perîşan bû. Daykî pêy seyr bû Simko hatotewe. Debiwaye le binke bê w şewê kêşk bidat. Bo debê hatibêtewe?

Diway têweraman, naçar hoy hatinewey lê pirsî.

Be dengêkî nîwegiryan nûzandî, nûzêkî pîrr le nale, belam le serexo, neydewîst derî bibrê. Ewe xû w xide w ferhengî xoman e, namanewê didan be heleanmanewe binêyin. Belam naçar bû bo daykî bas bika w bilê qisem heye, hatûmewe pêt bilêm. Ne wekû diwayî rêgem nebê bêmewe lat. Çawêkî be ser û sîmay nîgeranî daykî da xişand, axêkî helkêşa w gutî:

– Dayegîyan! To jinêkî dana y, êsta pitirim birwa be zanayî w azmûne be nîrxekanî to ye. Riwangey to le lêkdanewekanî min gelê rasttir bûn û baştir le aw hatine der.

Dayegîyan! Be propagand û wetey çewr û şîrin, minîyan kêşa nêw derûnî xoyan. Hemû şitêkî ewanim pê rast bû. Min her endam nebûm. Dekîê bilêm wergêrkeyek bûm. Derwêş bûm. Sofî bûm û kirmîşim bo dekiridin. Kem û kûriyekanim bo dadepoşîn. Heleanim bo rast dekiridenewe. Daye gîyan! Demewê le lay to bîdirkênim ke min le nêw bîr û bawerî dewêşaney wişk da noqim bibûm. Tika ye qels mebe, rêgakem ewe bû debiwaye wa bim, debiwaye ra bikem û hawhengawîyan bim.

Dezanî bo hatimewe dayegîyan!? Hatimewe pêt bilêm: Be daxewe belênîyekan rast nebûn!? Nûsrawekanim estranewel!? Mor û îzakekan îtîbarîyan nema!? Le hemî şitêk paşgez bûnewe?

Daye gîyan min ew roje pêm gutî hewalekanim xoş in. Pêm gutî belênîyan dawe qet şerî birakujî nabêtewe. Tika ye dayegîyan min be dirozîn mezane. Bawerim pê bike daye, min dirozîn nîm û hergîz legel to namewê diro bikem, bilêm çî, serencam diro şî yan pê kirdin. Daway lêbûrdin dekem. Hîwadar im bimbexîst w gerdînim aza key, daye.

Simko ewey gut û berew binke w kêşk royî.

Şekrê nutiqî bestrabû. Dilekutey bû. Pişûy helmalabû. Werz bû, dilteng bû. Destejino çawî mindalekan birîbû. Şewêkî dûr û dirêj bû, kotayî nedihat. Neydewêra serêkî derê bidat û bizanê çî bas e. Baranêkî pîr tewîjim debarî, belam baranî gulle. Raçilekîn û delekute, cêgay xoy da be lêwelerze w

dilelerze. Dedanî didanî nedegirt. Le bin lêfey germ da heldelerzî. Destî bo hewa radedaşt û le ber Xwa deparrawe, leşsaxî bo Simko w gencanî şar le Xwa dexwast. Bereberî beyanî teqe kemtir bû, gwêy helxistibû. Dengî giryan û bira ro, bendî dilî depisand.

Rawesta ta ku wîrdeteqe birrayewe. Mindalekan îş hestan. Xelk le hat û ço da bûn. Ewan îş çûne der. Le ber dergay mizgewtî Xaneqa şîwen û giryan û lexodan bû. Wirde wirde çûne pêş û xoyan geyande hewşî mizgewt.

Dewran-dewr be rêz xelk rawestabûn. Le nêwerastî hewşeke da termî lawanî şar be kujraw û birîndar dirêj kirabûn. Kes û karîyan le ser termekan degiryan. Pêyan heldekutin, singiyan dekuta w qîjî xoyan deriniyewe. Tûk û du'ayan le sebebkar û pêşxer dekird.


Şekrê çûwe pêş, pitir çûwe pêş. Le pir raçilkey sipî helgera. Diway, be herdûk destî, be çokî xoy dada w qîjandî:

Bira ro, role ro, Somkoy cwanemergim ro!\*

\* M. Lewendî le herfî Erebiye we guhest ser herfên Latîni.



# DI BASKÊN BÊJEYAN DE ÊŞ, EVÎN, KESER Û HÊVÎ



Ne tenê mirovin ku li hember zilm, teda, şikence û xizantî terka welatê xwe dikin; bêje jî terkê welatê xwe dike.

Bêjeyên ku axaftina wan qedexe ye... Bêjeyên ku şikence û ceza dîtîne...

Antolojîyekî bi navê **Världen i Sverige** (Dinya li Swêdê) bi berhemên nivîskarên biyanî yên ku li Swêdê dijîn, di dawîya Sibatê de hat çapkirin. Ev xebatê hêja, ji aliyê redaktora kovara kulturî ya **90TAL Madeleine Grive** û nivîskarê kurd **Mehmed Uzun** hat amadekirin. Bi angajman û alîkarîya Kulturrådet (Konsêya Kulturê) û weşanxanayê -yek ji weşanxanayên herî mezin ên Swêdê **En bok för alla** jî di vî karî de roleke mezin leystîye.

Ev cara yekemîn e ku antolojîyê wisa berfireh û bi kalîte ya edebî li Swêdê çap dibe. Derketina antolojîyê li medyayê pir cî girt. Redaksiyonên hemûyan jî pozîtîf in.

Pirtûk ji berhemên 74 nivîskaran, yên ku neh ji wan kurd in, pêk tê. Tê de ji her şaxên edebî nimune hene: Helbest, kurteçîrok, beşên romanên, essay û drama...

Nivîskarên ku bi zimanên arnawûdî, çînî, erebî, estonî, farisî, îtalî, kurdî, letonî, macarî, pencabî, portekîzî, romanî, rûsî, sirboxirwatî, îspanî, tirkî, wietnamî, yûnanî dinivîsin tê de cî digrin.

**Nedim Dağdeviren**

## JÎ RAYA GIŞTÎ RE

Nivîsa Yaşar Kemal a ku berî demekê di *Der Spiegel* de derketibû, bû sedemê gelek reaksiyonan. Hin kes û dezgehên ku naxwazin rastiyên pirsra Kurdî eşkere bibin, dîsan metodên xwe yên naskirî bikar anîn; ew bi separatîstiyê, hetta bi îxanetê tawanbar kirin, hewl dan ku kesîtiya wî lekedar bikin. De'wa wî ya ku di Dadgeha Emnîyeta Dewletê de vebûye jî hîn dom dike. Di 'eslê xwe de ew rewş bi serê xwe, ji 'acizbûna rejîma kolonyalîst û ji nimûneyeke nû ya îflaskirina siyaseta wê ya Kurdî ya heftê salane pêve ne tişteki din e. Yê ku ji ber nivîsa binavkirî, êrişî Yaşar Kemal dikin û dixwazin ceza bidinê, her ew kes in ku li dijî azadiya fikr, aştî û biratiya gelan in. Rê û metodên ku ew bikar tînin, ne tenê

ji bo gelê Kurd, ji bo gelê Tirk jî dibin sedemê eş û xemgîniyê. Rastiya ku îro tu kes nikare li dij derkeve ew e ku, ji bo çareserkirineke demokratîk û aştiyane ya pirsra Kurdî, divê bê derengmayin hin gav bê avêtin. Êdî ne tehemmul ne jî hêza civatê ji derengmayinê re heye.

Em êriş û gefên li dijî Yaşar Kemal protesto dikin û didin zanîn ku em piştgirîya wî dikin\*.

25. 1. 1995

Komîta Kargêr a  
Komeleya Nivîskarên Kurd  
li Swêdê

\*'Eslê vê nivîsê bi Tirkî bû û di hin rojnameyan de derketibû.

### Ji "Komîta Bîranîna Mîrê Helbesta Kurdî Ehmedê Xanî" re

Hevalên hêja,

Em bi agahdarbûna çalakiya we ya ji bo şa'ir û welatperwerê hêja Ehmedê Xanî, dilşad bûn. Ev xebata we ji bo me mizgînîyek e ku hişyariya welatperweriyê nîşan dide. Bi xebatên wisa kurr û keçên Kurdan îro nîşan didin ku wan digel ta'de û barbariya nedîtî ya dijminan, Ehmedê Xanî û

baweriya wî ya millî ji bîr nekirine.

Ji ber vê xebatê em we pîroz dikin û di riya xizmeta welêt û millet de ji we re serkeftinê dixwazin.

26. 1. 1995

Li ser navê  
Komela Nivîskarên Kurd Li Swêdê  
M. Malmîsanij



## Ji berêz Cewher Namiq Salim, Serokê Parlamentoya Kurdistanê re

Piştî şerê Xelîcê, dema ku perçeyekî mezin ê Kurdistanana Başûr rizgar bû, parlamento û hukûmeta netewî hat damezrandin, şahîyeke mezin ket dilê gelê Kurd. Ne tenê gelê Kurd, hemû dostên gelê me û aştxwazên dinyayê bi we re bûn.

Çi heyf ku piştî demeke kurt hat xûyakirin ku kar û barê Dewleta Federe ya Kurdistanê û organîzebûna civakî baş naçe. Bêguman yek ji sebebên herî girîng ên vî tiştî jî nebaşbûna têkiliya navbera PDK'ê û YNK'ê bû. Axirabtir, ev nebaşî, di sala çûyî de ket merheleyeke din û şerê birakujî dest pê kir.

Cenabê te jî dizane ku ji bo birakujî sebebeke maqûl tune. Ev şer, berî her tiştî fersenda tarîxî ya ku ketiye destê gelê me, dike. Ev şer, baweriya gelê Kurd û dostên wî dişkîne, bêhêvîtiyê peyda dike. Hûn jî dizanin, yên ku ji vê rewşê kêfxweş in û hevdûkuştina Kurdan dixwazin, dijminên gelê me ne. Ma em çima fersendeke wisa bidin wan?

Ji ber vê yekê jî, em hêvî û daxwaz dikin ku ev şer bê qeyd û şert bêt sekinandin û her du rêxistin problemên xwe bi riya demokrasiyê û bi prensîbên biratiyê çereser bikin. Ger ji bo aştiyê gavên pêwîst neyên avêtin, birînên civakî neyên dermankirin, Kurdistan dê dîsa bikeve bin zilma dijmin û felaketeke nû dê bê serê gelê Kurd. Mafê tu kesî tune ku bibe sebebê vî tiştî.

Bi silavên biratiyê\*.

Stockholm, 25. 1. 1995

Li ser navê Komela Nivîskarên Kurd Li Swêdê

M. Malmîsanij

**Ji bo agahdarî:**

**Kosret Resûl 'Elî, Serokwezîrê Kurdistanê**

**Mesûd Barzanî, Serokê Partî Demokratî Kurdistanî Iraq**

**Celal Talebanî, Sekreterê Giştîyê Yekîti Nîştimanî Kurdistan**

\* Ev name ji Serokwezîrê Kurdistanê Kosret Resûl, Serokê Partî Demokratî Kurdistanî Iraq Mesûd Barzanî û ji Sekreterê Giştîyê Yekîti Nîştimanî Kurdistan Celal Talebanî re jî hatiye şandin.

## Ji wezîra karên derve ya Swêdê re

**Berêz Wezîra Karên Derve Lena Hjelm-Wallén,**

Berî ku hun û alîkarê serokwezîrê Tirkîyê, Karayalçîn hevûdin bibînin, destûr bidin da ku em hin bûyerên Tirkîyê yên nexweş ku me endîşedar dikin, bînin bîra we.

Azadiya fikr û gotinê hîn ji çend gotinên xweşik ên ku bi amanca polîtîk tîn gotin pê ve ne tiştek in û ev gotin û rastiya dadmendiya Tirkîyê hevdû nagrin.

Bes ji ber ku fikrên xwe bi nivîskî îfade kirine, hin meslegdaşên me wek **Îsmail Beşikçi, Fikret Başkaya, Haluk Gerger** ceza xwarin û li hepisxanê ne.

**Yaşar Kemal** ji ber nivîseke xwe tê mehkemekirin û dixwazin heşt sal ceza bidinê.

Ji ber helwêsta xwe ya di warê mafên meriv de, parlamenterên Kurd tîn cezakirin.

Wisa tê zanîn ku, li pişt teror û êrişên ku bi operasyonên kontrgerilla li dijî gelê Kurdistanê û roşnîbîrên Kurd dom dikin, dewlet heye.

Maf û azadiyên Kurdan, bi şerê heyî re hatine endekskirin.

Li gor me nivîskarên Kurdan, divê ku Tirkîye hem di warê gotin û fikir de, hem jî di warê maf û azadiyêyên bingehîn ên meriv de tedbîrên ciddî bigre.

Em li benda guherîna demokratîk ên qanûna bingehî ne, da ku fersend bide ku kesên li Tirkîyê dijîn bikaribin beşdarî prosedura qeraran bibin, muxalefet bikin û tesîrê li hukûmetê bikin.

Em hêvî dikin ku hun bi Karayalçîn re munaqeseya pirsên jorîn bikin û endîşeyên me bigihînin wî.

Tevî silavan\*.

14. 2. 1995

Mehemed Malmîsanij

Serokê Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê

*\*Eslê vê nivîsê bi Swêdî bû.*

## SEMÎNEREK

Ji bo sedsalîya nivîsîna Mem û Zînê di 26.2.1995'an de semînerê li ser Ehmedê Xanî û berhema wî ya hêja Mem û Zînê ji alî Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê ve hat amadekirin.

Semîner ji alî Mihemed Enwer û Mûrad Ciwan hat dayîn.

Mihemed Enwer derheqê softîzm û felsefa Ehmedê Xanî de, Mûrad Ciwan jî li ser kurdîtî û felsefa Ehmedê Xanî di Mem û Zînê de peyivî.

Nêzî 100 kesî beşdarî semînerê bûn.

